



## Naveroka hejmar 15

### Sernivîsar

Bi naverokeke rengîn

### Husein Muhammed

Hoker (adverb) di kurdî de, r. 3

### Salih Akin

Koma Kurmancî û Grûpa Vateyê, r. 16

### Kuflîk Elîkake

Peyvên dubarekirî, r. 30

### Selîm Biçûk

Rêzimana kurdî (beşa 1), r. 36

### Dengnasî

Peydabûn û guherîna N, r. 84

### Bahoz Baran

Nirxandina kitêba "Rastnivîs û Rêzimana Kurmancî", r. 89

### Zemîr

Gramerê zazakî de, r. 99

### Zana Farqînî

Nivîsîna lêkera alîkar ya dema bê, r. 123

### Abdullah Karabax

Baneşan (nîda, interjection), r. 126

### Zimannasiya berhevder

Cudahiyên dengnasî yên kurdî-farisî, r. 137

### Ce'fer Şêxulîslamî

Zimanî standard û mafî ziman, r. 143

### Deham Ebdulfetah

Lêker di zimanê kurdî de (beşa 5), r. 151

### Rêbîn Kerîm

Verbal inflection in Kurdish, r. 209

### Xesrew F. Elmasî

Phonological Adjustments in Kurdish, p. 224

### Xisro Pîrbal

Translating Kurdish literature from foreign languages, p. 237

### Zarname

Ferhengoka zimannasî, r. 246

## Sernivîsar

### Dîsa bi naverokeke rengîn

Kerem bikin vê carê jî hejmareke têt û tijî ya kovara zimanê kurdî Kanîzarê, xwandevanên gelek hêja. Di vê hejmarê de em 260 rûpelan çendîn vekolîn û nivîsarên giring yên li ser ziman û rêzimana kurdî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî pêşkêşî we yên ezîz dikin.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** li ser hokeran (hevalkar, zerf, *adverb*) di kurdî de dinivîse. Nivîsên wî yên din vê carê li ser berhevdana dengnasiya kurdî û farisî û herwiha derbarê dengê N ye.

**Salih Akin** xebatên Koma Kurmancî û Grûpa Xebatê ya Vateyî dide nasîn. **Kulîlk Elîkake** ji romana "Şivanê Kurmanca" peyvên dubarekirî vedikole.

Abdullah Karabax bi berfirehî baneşan (*nîda, interjection*) yên kurdî dide nasîn.

Di vê hejmarê de em dest bi belavkirina rêzimana nivîskara **Selîm Biçûk** dikin û em ê di hejmarên bê de jî wê bidomînin. Vekolîna berfireh ya **Deham Ebdulfetah** li ser lêkerên (fiil, verb) kurmancî di vê hejmarê de jî didome.

**Bahoz Baran** kitêba "Rastnivîs û Rêzimana Kurmancî" ya **Samî Tan** dinasîne û dinirxîne. **Zana Farqînî** li ser çawaniya nivîsîna lêkera alîkar ya dema bê (dê, wê, yê, ê) dinivîse.

Bi zazakî em vekolîneke li ser cînavan (*zemîr, pronoun*) belav dikin.

Bi soranî du nivîsaran ku yek ya **Ce'fer Şêxulîslamî** ye û ya din jî wergereke ji inglîzî bi destê **Hesenê Qazî** ye.

Bi inglîzî em vekolîna **Rêbîn Kerîm** li ser lêkerên kurdî didomînin û herwiha du nivîsarên **Xisro Elmasî** li ser dengnasiya kurdî û nivîseke **Xisro Pîrbal** jî derbarê wergerandina edebiyata kurdî ji zimanên biyanî li kurdî belav dikin.

Li dawiyê jî em ferhengoka xwe ya zimannasî *Zarnameyê* dîsa berfirehtir kirî diweşînin.

Herdem di nav xêr û xweşîyan de bin!

## HOKER DI ZIMANÊ KURDÎ DE

*Husein Muhammed*

### MIJAR Û PEYVNASIYA WÊ

**Hoker** anku *hevalkar* (bi inglîzî *adverb*)<sup>1</sup> ew peyv in ku wek ravekerên lêkeran (karan, fiilan, verban) tên bikaranîn. Hoker adeten çawaniyê, demê, cihî, sebebî yan awayê kirina yan qewimîna tişteki diyar dikan.

Navên ku di rêzimanê de li van peyvan hatine kirin çawaniya wan peyvan diyar dikan. Bo nimûne, "hoker" ji hi peyva "ho" (hosa, usa, wisa, wiha, bi vî/wî awayî) û ji "-ker" (kirin) hatiye çêkirin. Peyva "hevalkar" (ku bi piranî di rêzimanên Başûrê Kurdistanê de tê bikaranîn – bi soranî bi awayê "awelkar") ji peyva "heval" û "kar" (lêker, fiil, verb) hatiye çêkirin ji ber ku hoker/hevalkar bi piranî li gel lêkeran tên bikaranîn û wan şirove û rave dikan.<sup>2</sup>

Hoker dikarin bersiva pirsên wiha didin:

- çawa?
- kengî?

Bo nimûne (hoker di nimûneyan de hatine *xwehrkirin*):

- zû hat (çawa hat?)
- îro dît (kengî dît?)

Ew herwiha dikarin bikevin pêşiya frazên lêkerî. Bo nimûne:

- *xweş* stranan dibêje

<sup>1</sup> Bi tirkî zarf, erebî ظرف û farisî قيد

<sup>2</sup> Bidin ber "hevalnav" anku "rengdêr" ku navdêran (navan) rave dikan.

Tevî ku hoker bi piranî wek ravekerên lêkeran tên nasîn. Lê hoker dikarin ji bilî lêkeran herwiha bi taybetî bo xurtkirina an sistkirina rengdêran jî tên bikaranîn:

- *zêde xweş*
- *gelek hêja*

Hoker herwiha dikarin wek ravekerên hev jî bèn xebitandin:

- *pir bihêz* neajo! (hem "pir" û hem jî "bihêz") di vê hevokê de hoker in.)

## HOKER JI ALIYÊ WATENASÎ Û BIKARANÎNÊ VE

Ji aliyê watenasî û bikaranînê ve hoker dikarin li ser çend beşên cuda bèn parvekirin:

- hokerên demî
- hokerên cihî
- hokerên çawaniyê
- hokerên çendaniyê
- hokerên misogeriyê
- hokerên neyînîkirinê
- hokerên mixabiniyê
- hokerên dubarekirinê

### Hokerên demî

Bi alîkariya hokerên demî wextê kirina an qewimîna tiştekî tê diyarkirin. Mirov dikare hokerên demî li ser çend beşan parve bike û nimûneyan jê bide:

- nuqtayên demî yên diyar: bo nimûne "îro, sibê, îşev, duhî, pêr, petrapêrar, hingê..."
- dubarebûnên diyar: bo nimûne "hero / herroj, salane, her hefte..."
- dubarekirinên nediyar: bo nimûne "roj bi roj, heta û heta, carinan, daîmen, hergav, ticar / çucar, qet, qetiyen..."

Hokerên demî bi piranî peyvên dariştî ne, bo nimûne:

- "îşev" ji "î-şev"
- "rojane" ji "roj-ane"
- "herdem" ji "her" û "dem"

Lê hin peyv jî li gor zimanê niha wek peyvên xwerû tên hesibandin, bo nimûne "duh(î), pêr, hingê" lê di rastiyê de ew jî tarîxiyên peyvên pêkhatî ne.<sup>3</sup>

## Hokerên çawaniyê

Bi alîkariya hokerên çawaniyê (hokerên awayî), mirov awayê kirin an qewimîna tiştekî diyar dike.

Hokerên çawaniyê gelek caran rengdêr in ku wek hoker tên bikaranîn:

- zû herin
- xweş diaxivin

Awayê din yê berbelav yê çêkirina hokerên çawaniyê ew e ku rengdêr pêşî bi paşgirekê (adeten –î) tên navdêrkirin û paşî bi pêşgira "bi" dibin hoker. Bo nimûne:

- azad (rengdêr) → azadî (navdêr) → bi azadî (hoker)

Hokerên çawaniyê dikarin paşgiran jî ji rengdêran bînin çêkirin (bo nimûne bi paşgirên –ane, -ka – li jêrtir binêrin.)

## Hokerên cihî

Bi alîkariya hokerên cihî mirov der û devera qewimîna yan kirina tiştekî diyar dike. Hin nimûne ji hokerên cihî ev in:

<sup>3</sup> Bo etîmolojiya van peyvan, binêrin: Rehnas – ferhenga etîmolojî ya kurdî:  
<https://zimannas.wordpress.com/2016/11/02/3073/>

- vir
- wir
- hindir
- jêr
- jor
- pêş
- paş
- hindir

Hokerên cihî dikarin an serbixwe yan jî li gel daçekên wek "ji, li, bi ...ve" û hwd. din bên xebitandin.

## Hokerên çendaniyê

Hokerên çendaniyê miqdara anku qiyasa tiştan diyar dikin. Hinek ji nimûneyên hokerên çendaniyê ev in:

- gelek, pîrr, zehf, zêde, kêr, hindik...

Hokerên çendaniyê adeten rengdêr in ku bêyî ti pêşgir an paşgir an wek hokerên tîr bikaranîn. Hokerên çendaniyê dikarin hem bikevin pêş lêkeran û hem jî pêş rengdêran:

- pîrr xweş
- pîrr xwar

## Misogeryê

Hokerên misogeryê pileya anku dereceya misogeryê yan piştrastiyê (yan jî nemisogerî anku nepiştrastiyê diyar dikin. Hinek ji wan ev in:

- belê, erê
- belkî
- illeh, bivê-nevê
- helbet, bê guman

**Hokerên neyînîkirinê**

Hinek ji hokerên neyînîkirinê ev in:

- na, ne, nexêr, no...
- hîç, qet, qetiyen, qeten

**Hokerên mixabiniyê**

Hinek ji hokerên mixabiniyê ev in:

- mixabin
- heyf (wek "heyf ku ew nehat")
- malesef, me'el esef
- bi dax ve, be daxewe

**Hokerên dubarekirinê**

Hinek ji hokerên dubarekirinê jî ev in:

- dîsa, dîsan
- dubare, ducarî
- cardin

**HOKERÊN BIWÊJÎ**

Hinek ji hokeran ji çend peyvan çêbûne lê ew bi awayekî mecazî tên bikaranîn û maneya wan nikare bi awayekî konkret ji peyvên ku ew jê pêk tê were fehmkirin.

- serê sibê (hê zû li destpêka rojê)
- destê êvarê (berê êvarê, teqrîben êvarê)

## PEYDABÛNA HOKERAN

Di zimanê kurdî de hoker dikarin peyvên xwerû yan dariştî bin. Mebest ji "peyvên xwerû" li vê derê ew e ku ew peyv ne ji du yan çend peyvên din û ne jî ji peyvekê û yek yan çend gireyan (pêşgiran an paşgiran) peyda bûne.

### Hokerên xwerû

Bo nimûne, peyvên wek "hêdî, kêr, pirr, zêde, xweş, zû" hokerên xwerû ne ji ber ku mirov nikare wan êdî parve bike ser çend beşan.

Hokerên xwerû yê çawaniyê bi eslê xwe rengdêr in lê li gor bikaranîna wan di hevokê de ew carinan rengdêr in û carinan jî navdêr in. Bo nimûne:

- ew straneke xweş e ("xweş" li vê derê rengdêr anku sifet e)
- ew xweş diaxive ("xweş" li vir hoker e)

Cudahiya hokeran ji rengdêran di kurdî de ew e ku rengdêr dikevin dûv navdêrên ku rengdêr şirove dikin lê hoker dikevin pêş peyvên ku rave dikin:

- straneke xweş ("xweş" li vir rengdêr e)
- xweş diaxive ("xweş" li vê derê hoker e)

Hokerên xwerû di kurdî de dikarin bi eslê xwe peyvên xwemalî bin (ji nimûneyên li jor "kêr, pirr, xweş, zû) yan jî bi eslê xwe biyanî bin (ji nimûneyên li jor "hêdî, zêde" ku bi eslê xwe ji erebî hatine.)

### Hokerên dariştî

Hokerên dariştî dikarin bi alîkariya pêşgir an paşgiran bên sazê bin. Ew herwiha dikarin bi rêya dubarekirinê jî peyda bibin.



### Bi pêşgirên "bi" û "bê"

Awayê herî berbelav ê çêkirina hokeran di kurdî de bi alîkariya navdêran li gel peyvika "bi" ye:

- bi roj (*daily*), bi şev (*at night*), bi xweşî (*joyfully*), bi şadî (*happily*), bi rehetî (*calmly, in a calm manner*), bi xirabî (*badly*), bi mêranî (*bravely*)...

Ew hem dikarin hokerên demî bin (wek "bi roj, bi şev") û hem jî hokerên çawaniyê bin (bo nimûne "bi mêranî, bi xirabî").

Wek ku tê dîtîn, hin ji van peyvên bingehîn di eslê xwe de pêşî ji rengdêriyê bûne navdêr û paşî jî bi alîkariya "bi" bûne hoker:

rengdêr →	navdêr →	hoker
xweş	xweşî	bi xweşî
şad	şadî	bi şadî
rehet <sup>4</sup>	rehetî	bi rehetî
xirab <sup>5</sup>	xirabî	bi xirabî
mêr <sup>6</sup>	mêranî	bi mêranî

Hêjayî gotinê ye ku cudahiya hokerên bi pêşgirên "bi" û "bê" saz kirî ji navdêrên bi daçek ew e ku ev hoker nayên çemandin lê komikên daçekî tên çemandin. Bo nimûne:

- bi roj (= hoker)
- bi rojê (= komika/fraza daçekî)

Mirov dikare van herdu awayên ji hev cuda di hevokên wiha de bibîne:

- Bi roj em şiyar in. (bi roj = hoker)
- Bi rojê (bi alîkariya roja li esmanan) dinya germ dibe. (bi rojê = komika daçekî)

<sup>4</sup> "Rehet" û "xirab" a li dûv wê ji erebî ne û bi eslê xwe di erebî de navdêr in lê di kurdî de ew wek rengdêr tên bikaranîn. Formên wan ên navdêr "rehetî, xirabî" ne.

<sup>5</sup> Binêrin têbîniya pêştir.

<sup>6</sup> Bi eslê xwe peyva "mêr" navdêr e lê li vê derê bi guhastinê bi maneya "wêrek, bicesaret, bisteh" wek rengdêr hatiye bikaranîn û forma wê ya navdêr wek "mêranî" hatiye çêkirin.

Peyvika “bi” herwiha bi ketina nav peyveke dubarekirî jî hokeran çêdike:

- roj bi roj
- sal bi sal
- cih bi cih
- ser bi ser

### Bi pêşgira “î-“ û varyantên wê

Pêşgira “î-“ çend hokerên demî çêdike:

- îro (< îroj)
- îşev
- îsal
- îcar (> îca, îjar, îja...)

Li vê derê pêşgira “î-“ wateya “vê, ev” dide peyvên “ro(j), şev, sal, car” yê bi eslê xwe navdêr û wan dike hoker. Li gor devokan varyantên pêşgira “î-“ wiha ne:

- bi kurmancî: i-, hi-, hî- (bo nimûne “iro, hiro, hîro” anku “îro”)
- bi soranî: em-, îm- (emro, îmro = îro)

Di kurmanciya rojhilatî de bikaranîna pêşgira “î-“ yan nadir e (carinan varyanta wê di peyva “iro, iroke” de tê bikaranîn lê formên serdest “evro, evroke” ne) yan jî qet peyda nabe (formên wek “îşev, îsal, îcar” nayên bikaranîn û li cihê wan gotinên wek “ev şeve, ev sale, vê carê” li kar in).

### Bi pêşgira “her-“

Peyva her bo pêkanîna hin hokeran dibe pêşgir û wan wiha saz dike:

- herdem (daîmen)
- hergav (daîmen)
- hero / herro < heroj / herroj (her roj)

**Bi paşgirên "-ka, -ke"**

Paşgira "-ka" çend hokeran ji çend rengdêran saz dike:

- dûr > dûrka
- hêdî > hêdîka
- zû > zûka

Paşgira "-ka" û varyanta wê tarîxîyen herwiha peyvên wek "nika" ya kurmanciya rojavayî û zazakî", "noke, nuke" yê kurmanciya rojhilatî û "henûke" ya soraniya mukriyanî jî çêkirine ku hemû maneya "niha, vê gavê" didin. Heman paşgira "-ke" herwiha peyvên "evroke, iroke" yê kurmanciya rojhilatî de jî hene ku alternatîvên formên "evro, iro" yê bi wateya "îro, vê rojê" ne.

Lê paşgirên "-ka, -ke" êdî di peyvsaziyê de ne çalak in û hokerên nû saz nakin.

Cudahiya peyvika "bi" di çêkirina hokeran de ji "bi" ya daçek ew e ku peyva serekî li pey daçekê diçeme lê di hokersaziyê de naçeme:

- "bi" wek daçek: bi + hêz → bi hêz-ê (*by force, with power*)
- "bi" di hokersaziyê de: bi + hêz → bi hêz (*forcibly, powerfully*)

Carinan herdu form jî mimkin in:

- bi zor (hemû komik / fraz bi hev re = hoker)
- bi zorê (bi = daçek, zor = navdêr)

Cudahiya "bi" di hokersaziyê de ji "bi" di rengdêrsaziyê de ew e ku di hokersaziyê de ew ji peyva serekî cuda tê nivîsîn lê di rengdêrsaziyê de ew bi peyva pey xwe ve dizeliqe:

- rengdêr: bi + hêz → bihêz: *Ew kesekî bihêz e.* (ew xurt e, ew qewî ye)
- hoker: bi + hêz → bi hêz: *Ew bi hêz şer dike.* (bi xurtî)

**Bi paşpirtika "-ane"**

Vê dawiyê paşpirtika –ane bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî jî û xaseten di zimanê nivîskî de pir tê bikaranîn bo çêkirina hin peyvan ji navdêran. Gelek ji wan peyvan hem wek hoker, hem wek hoker û hem navdêr tîn bikaranîn:

- mehane:
  - rengdêr: *kovara mehane* (ya ku her mehê carekê derdikeve, *monthly*)
  - navdêr: mehaneya wî 3 000 dolar e (meaş, muçe, pareyê ku her mehê ji ber karkirina xwe werdigire, *monthly salary*)
  - hoker: em mehane hev dibînin (her mehê, her mehê carekê, di mehê de carekê, *every month*)

Tevî ku ev paşpirtik heta van dehsalên dawiyê di kurmancî de tine bû jî, ew niha di zimanê nivîskî de bi awayekî pir aktîv tê bikaranîn û bikaranîna wî roj bi roj zêdetir dibe.

### Paşpirtika “-kî”

Paşpirtika –kî hin hokeran bi taybetî ji navên gel an deveran çêdike:

- erebkî (wek ereban, mîna ereban)
- ermenkî (wek ermenan, mîna ermenan)

Paşpirtika –kî herwiha dikeve pey peyveke dubarekirî jî û wisa hokeran çêdike:

- paşpaşkî, pêşpêşkî

### Bi paşpirtikên “-î” û “-ê”

Hin rendgêr di kurmanciya navendî de dikarin bi paşpirtika –î bibin hoker. Di kurmanciya rojhilatî de li cihê wê paşpirtika –ê tê bikaranîn. Di herdu komdevokan de jî mimkin e ku ew heman rendgêr bêyî ti paşpirtikê bi guhastinê wek hoker bên bikaranîn:

rengdêr →	hoker bi –î	hoker bi –ê	hoker bi guhastinê
gelek	gel(e)kî	gelekê	gelek
hin(d)ek	hin(e)kî	hindekê	hin(d)ek
piçek	piç(e)kî	piçekê	piçek

Paşpirtikên –î û –ê di çêkirina hokeran ji rengdêran de êdî ne berhemdar û çalak in. Mirov nikare ji bilî van nimûneyên li jor (û belkî du-sê libên din) zêdetir hokeran pê ji rengdêran çêke.

### Paşpirtika “-en”

Ev paşpirtika bi eslê xwe erebî ye û bi piranî tenê li gel peyvên ji erebî wergirtî heye. Ew hokeran hem ji rengdêran û hem jî ji navdêran saz dike:

- heqîqet → heqîqeten
- ihtimal → ihtimalen
- qetî, qet’î → qetiyen
- waqî’ → waqî’en, waqiyen
- tarîxî → tarîxiyen

Carinan rengdêr bi xwe di kurdî de cih negirtiye yan pir kêr li kar e lê hokera jêçêkirî peyda dibe û berbelav e. Bo nimûne:

- teqrîb-en

Hin caran ev hem paşpirtik li peyvên ne-esil-erebî jî tê barkirin:

- dîrokî → dîrokiyen<sup>7</sup> (wek wergera “tarîxiyen”)

### Bi navgîna “û”?

Di gotina “hetaûheta” yan “heta û heta” de wisa dixuye heçku peyvika “û” hatibe bikaranîn. Ji aliyê etîmolojî ve eslê peyvê “heta bi heta” bûye wek “roj bi roj” lê di bilêvkirina sivik de B bûye W û taliyê wek “heta û heta” hatiye texmînkirin.

## GELO HOKER BIRREKE SERBIXWE YA PEYVAN E?

<sup>7</sup> Nimûneyek ji bikaranîn peyva “dîrokiyen”: “Lê ermenî jî hin peyv dane zimanên îranî, bi taybetî kurmancî û zazakî ku dîrokiyen bi ermeniyan re û di nav ermeniyan de hebûne.” <https://zimannas.wordpress.com/2015/11/19/peyven-me-ji-ku-ten-2/>

Piraniya mutleq û reha ya hemû hokerên kurdî û hokerên piraniya zimanên din jî peyvên wisan in ku yan yekser wek rengdêr an navdêr jî tên bikaranîn an jî ji rengdêr an navdêran hatine çêkirin.

Bo nimûne:

- baş, xweş, zû, gelek... (ku di heman demê de rengdêr in jî)
- îro, sibê, par, vir... (ku di heman demê de navdêr in jî)

Ji ber vê rastiye, divê mirov bipirse ka gelo hoker bi rastî jî birreke peyvan ya serbixwe ye yan jî komeke ser bi rengdêran yan navdêran yan jî van herduyan ve ye?

Tevî ku hinek hoker (bi taybetî yên çawaniyê) bi gelek awayan wek rengdêran in û hinek jî (xaseten yên demî û cihî) mîna navdêran in lê dîsa jî di zimannasiyê de bi awayekî giştî hoker wek bireke peyvan ya serbixwe jî tê nasîn.

Sebebê serbixweyiya hokeran ne peyv bi xwe yan jî peydebûna peyvên hoker e lê awayê bikaranîna peyvên hoker e ku bi çend awayên bingeîn ji rengdêr û/yan navdêran cuda ye.

Bo nimûne, hokerên çawaniyê bi şiklê gelek dişibin rengdêran an heta bi temamî jî dikarin bi şiklê xwe wek wan bin lê di bikaranîna de peyvrêziya rengdêr û hokeran ji hev cuda ye:

Di kurdî de rengdêr dikevin *paş* peyva ku rave dikin, bo nimûne:

- kitêba *xweş* (*xweş* = rengdêr)

Lê rengdêr dikevin *pêş* peyva ku rave dikin:

- *xweş* dibêjin (*xweş* = hoker)

Tevî ku hokerên demî û cihî bi piranî wek navdêran yan ji navdêran in jî, lê dîsa jî ew di çemandin anku tewandinê de hoker ji navdêran cuda ne. Bo navdêr li gel daçekan di yekhejmariya mê de di hemû devokên kurmancî de diçemin anku ditewin:

- av → bi avê

Lê hoker adeten li gel daçekan jî naçemin:

- roj → bi roj hatin
- vir → li vir bûn
- azadî → bi azadî bijîn

Carinan çemîn jî mimkin e:

- carinan, ti caran (= ti car) / çu caran (çu ca[r])

Hinek neçemandî navdêr lê çemandî hoker in, bo nimûne "sibe – sibê"

## PEYVRÊZIYA HOKERAN

Di komikên anku frazên lêkerî de hoker dikevin berî wan lêkeran yê ku rave dikin. Bo nimûne:

- xweş dibêje
- zû dibezin
- dereng hatin

Di komikên berfirehtir de cihê hokerê dikare biguhere. Bo nimûne:

- *her sal didin* → *her sal baca xwe didin / baca xwe her sal didin*

## XEBATÊN KOMA KURMANCÎ Û GRÛPA XEBATÊ YA VATEYÎ

*Salih Akin*

### KURTÎ

Li welatê Kurdistan ji ber pest û pêkûtiya li ser ziman, xebatên plansaziya ziman ji salên 1980ê heta 2000 pirtir li diyasporayê hatin meşandin. Plansaziya ziman a herî berbiçav û bikêr a ku rewşenbîr, lêkolîner û zimannasan bêyî piştgiriya hiqûmetê pêk anî, xebatên Komîsyona Kurmancî û Grûba Xebatê ya Vateyî ne. Ji ber xebatên van koman ên li Ewropayê, kurmancî û zazakî gihîştin standartên ziman ên îro û berhemên edebî dan.

Civakên koçber û yê di diasporayê, ji bo lêkolîneran di mijarên duzimanî, di nava nifşên koçber de windabûna ziman û asîmîlasyona çandî de derfeta lêkolînê raberî wan kir, van komên xebatê nîşan dan ku di diaspora di heman demê ji bo parastina zimanê hindikahiyan dikare alîkariyê bike.

Em dixwazin di warê teorîk de li ser “mebesta plansaziya ziman” a Moshe Nadir (2000) ku di dinyayê de pirr hindik mînakên wekî wê hene, nirxandinê bikin. Piştî ku me avakirin û birêveçûna her du saziyan pêşkêş kir, em ê li ser xebatên wan ên li ser ziman rawestînin (pêkanîna gencîneya ziman, arşîvkirina peyvên heyî, stratejiya dariştina peyvên nû, hwd.)

### 1. Bi awayekî zimannasî dabeşkirina kurmancî û zazakî

Li gorî zimannasan, kurmancî, zaravayekî kurdî yê ji koma zimanên Bakur-Rojavayê Îranê ye. Wekî tê zanîn, Kurdî zimaneke xwedan zaravayên kurmancî, Soranî û Goranî ye, li Rojhilat û Başûrrojhilatê Tirkîyeyê, Bakurê Iraq û Sûriyeyê û Rojavayê Îranê li dora 30 milyon kes pê diaxivin. Tê zanîn ku li



metropolên her çar welatan, Komarên Yekitiya Sovyetan ên berê, Ewropa û Amerîkayê li dora 7 milyonan Kurd hene. Ji aliyê dîtir ve zazakî jî ji zimanên Bakur-Rojavayê Îranê tê hesibandin (Blau, 1989, Gippert, 2007/2008, Ludwing, 1998a). Piştî weke ku em ê bibînin Grûba Xebatê ya Vateyî zazakî weke zaraveyek kurdî qebûl dike.

Zazakî, li Rojhilat û Başûr-Rojhilatê Tirkîyeyê tê axaftin. Li gorî lêkolîner Malmîsanij, zazakî li bajarên Çewlik, Amed, Dersim, Elezîz di serî de, di nav sînorên 12 bajaran de (1996, r.3-4) li dora 1 heta 2 milyon Kurd pê diaxivin. Nêzîkahiya di navbera zazakî û kurmancî de, li gorî rewşa kesana siyasî, çandî û nasnameyî diguhere.

Li gorî hinekan, zazakî ji bilî kurdî zimanekî serbixwe yê cuda ye û Zaza jî ji Kurdan gelekî cuda ne (Kaya, 2010 Keskin, 2010). Kesên van tezan diparêzin, dibêjin Zaza, ji herêma Xorasan a Îranê hatine herêma Rojhilat û Başûr-Rojhilatê Tirkîyeyê<sup>1</sup>, di navbera zazakî û kurmancî de, her çend di warê gencîneya peyvan de nêzîkî hebe jî, cudayiyên rêziman û fonolojîk derdixin pêş û dibêjin zazakî zimanekî dîtir ê cuda û serbixwe ye (Selcan 2001). Li gorî hinekan jî, zazakî û kurmancî du zaravayên Kurdî ne. Xwediyên vê boçûnê, dibêjin, peyva “Zaza” pirranî peyveke ji derve de hatiye sepandin û dibêjin zazakî îro li gorî herêman bi navên cuda cuda tê binavkirin (Kirmanckî, Kirdkî, Dimilkî/Dimilî) (Lezgîn, 2009). Ji aliyê din ve, tê destnîşankirin ku pirraniya Zazayan xwe weke Kurd dizanin û bibîr tînin ku weke encameke vê yekê ya surîştî jî ew di nav tevgera berxwedanê ya kurdî de cihê xwe digirin. Zaza, ji xwe re dibêjin Kird û ji Kurmancan re jî dibêjin Kirdasî, ev jî nîşana wê ye ku xwe wek Kurd dizanin<sup>2</sup>. Endamên eşîra Dewrêşgeran ku eşîreke girîng a devera Dersîmê ye, bi zazakî û kurmancî diaxivin (Deniz, 2010), ev jî nîşana wê ye ku Zaza û Kurmanc ji mêj ve ye di nav hev de dijîn û ev jî nîşan dide ku xwediyên heman taybetiyên etnokulturî ne. Her wiha, Munzur Çem, di pirtûka xwe ya bi navê Elewîtiya Kurdî ya Navenda Dersîmê (2009) de mînakên ku gelek eşîrên Dersîmê kurmancî û zazakî diaxifin daye (r. 561-562).

Em bala xwe bidine zimanên Romanî ku ji aliyê civaknasî û zimannasîyê ve dişibin kurdî û lêkolînên pisporên genetîkê, ku ew jî bûne mijara nîqaşên nasnameyî yê xwedî tezên dijberê hev. Em bi vê bidomînin.

Berî her tiştî, divê bê zanîn ku zimannasîyên wekî J. Blau (1989), L. Paul (1998b), T. L. Todd (1985) ku dibêjin zazakî zimanekî serbixwe yê cuda ye jî, didin zanîn ku Zaza xwe weke Kurd dihesibînin. A. Hassanpour di lêkolîna xwe ya bi sernavê “ The Identity of Hewrami Speakers: Reflections on the Theory and Ideology of Comparative Philology ” de, dibêje ku kesên bi Hawramaniya ku bi

binavkirineke dîtir Goranî ye diaxifin, xwe wek Kurd dizanin û ew ji J. C. Edmonds (1957) vê mînakê dide: “ Ewropayî pirranî dibêjin Goranî (Hawramanî) Kurdî nîne û yên pê diaxivin jî kurd nînin; lê gel bi her awayî xwe kurd hest dike “. Ji aliyê din ve Î. Nasidze, D. Quinque, M. Öztürk, N. Bendukidze û M. Stoneking sala 2005ê di kovara *Annals of Human Genetics* (n°69,s.401–412) de xebatek bi sernavê “ *MtDNA and Y-chromosome Variation in Kurdish Groups*” [Li nav komên Kurd de Varyasyona MtDNA û Y-Kromozom] weşandine û bi vê taybetmendiyan genetîk ên grûbên kurd vekolane. Lêkolîn li ser 139 kesan pêk anîne ku ji grûbên Zaza û Kurmancên Tirkîyeyê û Kurmancên li Gurcistanê dijîn pêk tên. Lêkolîneran encamên berê yên lêkolînên li ser grûbên Goran, Soran û Hawramanan jî hatin pêkanîn li ber çavan girtin, li gorî wê, eşkere bûye ku Zaza û Kurmanc bi awayekî genetîk ji grûbên Bakurê Îranê cudatir in û ew pirtir nêzikî grûbên Ewropayî ne. Grûba Zaza bi taybetmendiyan xwe pirtir dişibiyaye grûbên kurd ên dîtir.

Romên (Qereçî) ku binyada wan digihije Bakurê Hindistanê û îro pirranî li Tirkîye, Romanya, Bulgaristan û Macaristanê xwedî 1.5 milyon nifûsî ne, zêdetirî sî zaravayî diaxivin (Matras, 2002). Zaravayên wan jî, wekî yên Kurdan, li gorî nêzîkatiya erdê lê dijîn û zimanê serdest ê wê derê cudayî lê çêdibin. Li gorî vê, Romekî Estonyayî dibe ku pîrr hindik ji Romeke li Tirkîyeyê fêm bike an jî qet jê fêm neke. Ligel vê cudayiya zarava û ziman jî Rom xwe weke yek neteweyî dizanin<sup>3</sup>. Bi heman awayî, di navbera erebiya li Erebistana Siûdî û Yemenê an ya li Efrîkaya Bakur de gelek cudayî heye, gava erebên van deveran bi hev re diaxivin gelek caran ji hev fêm nakin. Lê her du jî erebî ne.

### 1.1. Rewşa kurmancî û zazakî ya li Tirkîyeyê

Wekî tê zanîn, li gelek bajarên Rojhilat û Başûr-Rojhilatê Anadolîyê pîrraniya welatiyan, bi kurmancî û zazakî diaxivin. Siyaseta asîmîlasyon û qedexeyê ya 80 salan, nehiştiye ku ev zarava pêşve biçin, bêne bikaranîn û ji nîşekî derbasî yê pêştir bibin. Kurmancî û zazakiya ku li xwendegehan nehat hîn kirin, li saziyên cemaweriyê jî hatin qedexekirin, ji piştgiriya dewletê bêpar hatin hiştin û di heman demê de prestîja xwe ya civakî jî winda kirin. Ev kiryarên neyînî gihîştin asteke wisa ku êdî, UNESCOyê jî, di rapora xwe ya 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê yê Cîhanî de, zazakî wek “zimanê di bin xetereyê de” îlan kir. Rewşa kurmancî ji zazakî baştir nîne. Girseya bi kurmancî diaxive her çend li beramberî ya bi zazakî qise dike zêdetir be jî, her roj zarokên ku kurmancî wekî zimanê dayikê hîn dibin kêmbin, hejmara kesên vî zaravayî di xebatên siyasî û civakî de jî bikar tînin kêmbin. Kurdiya ku ji mîsogeriya Destûra Bingehîn û piştgiriya bêpar e, di heman demê de ji fonksiyonên aborî û bazirganî

jî bêpişt e. Ligel ku TRT 6 û radyo û TVyên dîtir ên taybetî hinekî prestîja civakî ya van zaravayan geş kiribe jî, kurmançî û zazakiya ku ji sîstema perwerde-hîndekariyê û cemaweriyê tê vederkirin, naxin nav statûya resmî û nebe zimanê bazarê, rewşa wan a sosyo-polîtîk a li Tirkîyeyê ji standartên civaka pirçandî û pirzimanî dûr e û têra xwe metirsîdar e.

## 1.2. Çarçoveya teorîk

Em ê xebatên plansaziya ziman û siyaseta ziman ên Komîsyona Kurmançî û Grûba Xebatê ya Vateyî di wê çarçoveyê de binirxînin. Wekî em ê bibînin, her du kom, ji bo bigihêjin armancên xwe gelek xebat pêk tînin. Xebatên wan, li ser du bingehan tînin meşandin û xwedî armancên hevghandinê ne. Em dikarin van wek standardizasyona ziman û modernizasyona peyvan bi nav bikin. Ev her du armanc, di her teoriya ku plansaziya ziman û siyaseta ziman digire nav xwe de tînin. Bo nimûne, modela plansaziya ziman a Haugen a klasîk ku ji çar qonaxan pêk tê, wek hilbijartina ziman (pêşveçûna siyaseta ziman), kodkirin (pêşxistina normên wêjeyî û dariştina sîstema zimanekî fermî), pêşvebirin (pêşveçûna fonksiyonî ya ziman a berdewam) û pêkanîn (ji bo destekirina siyaseta zimanê a nû cîhbicîhkirinê pêwîst) digire nav xwe (Kendall 2000: 204). Ji aliyê din ve, Hornberger, kategoriyeke nû li çarçoveya siyaseta ziman a du qonaxî ya berhevveker zêde kir ku ev jî hînbûna ziman e: plansaziya statûyê (derbarê bikaranîna ziman), plansaziya berhevokê (derbarê pergala ziman) û hînbûna ziman (derbarê axivêrên wî zimanî). Heçî Baldauf e, wî trîptîya Hornberger ji nû ve formûle kir, ji bo ku plansaziya prestîj û îmajê ziman referans wergire kategoriyeke dîtir lê zêde kir (2005): plansaziya statûyê (di derbarê civaka ku wî zimanî diaxive), plansaziya berhevokê (di derbarê ziman), plansaziya hînbûna ziman (derbarê hînbûnê), plansaziya prestîj û îmajê (derbarê îmajê ziman). Herî dawî, Moshe Nahir (2000), derbarê plansaziya ziman de duwazdeh armanc destnîşan kirin: parzinandina ziman, zindîkirina ziman, reforma ziman, standardizasyona ziman, belavkirina ziman, modernîzasyona peyvan, lêkdana termsaziyê, zelalkirina stîlê, peywendiya nav zaravayan, parastina bikaranîna ziman, standardizasyona kodên-alîkar. Hayê plansaziya ziman û siyaseta ziman ji fonksiyon û armancên van tîpolojîyên ji bo nêzîkirinê hatine dariştin heye. Cudayî jî pirranî derbarê bikaranîna û armancên di kategoriyan de ne. Di çarçoveya vê lêkolînê de, em ê modela M. Nahir bi kar bînin, ji ber ku ev model xebatên her du grûban jî bi awayekî berfireh li ber çavan digire. Avantaja herî mezin a modelê ew e ku xebatên plansaziya ziman, li gorî armancên pêvajoya plansaziya ziman dinirxîne. Ji aliyê din ve, tîpolojîyên din beşdariya dezgehên neteweyî û resmî pêwîst dizanin. Wekî

ku em ê bibînin, her du grûbên xebatên ji piştgiriyeke wiha bêpar in. Wek dawîn, di tîpolojiyên din de, qonaxa plansaziya hînkirina ziman a heyî, ji ber ku xebatên grûbê bi resmî nayên nas kirin nabe ku çî pêkanîn lê bêne sepandin.

## 2. Komîsyona Kurmancî û Grûba Xebatê ya Vateyî

Komîsyona Kurmancî (ji vir pê de KK) komisyoneke Enstîtûya kurdî ya Parîsê ye ku sala 1983yê li Parîsê hatiye avakirin û ev komîsyon sala 1987ê li xwe zêde kiriye. Grûba Xebatê ya Vateyî (ji vir pê de GXV), sala 1996ê li paytextê Swêdê, li Stockholmê ji aliyê lêkolîner, zimannas û nivîskarên zazakîaxêv ve hate ava kirin. KK, di çarçoveya mîsyona pêşvebirin û parastina zimanê Kurdî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê de xwedî avabûneke rêxistinî ye, lê GXV, bi qewlê Roşan lezgîn ji aliyê komeke “îdealîstên dildar” ve hate danîn ku li Stockholmê bi xebata xwe ya dayîna dersa Kirmancî (zazakî) hate naskirin<sup>4</sup>. Her du komên xebatê jî, îlhama xwe ji Bedirxaniyên Bira girtine ku salên 1930-1940ê li Sûriyeya di bin destê Fransayê de hewl dane ku kurmancî modern bikin.

Wekî tê zanîn, reforma herî mezin a Bedirxaniyên Bira, elfabaya Latînî ye ku ji bo kurmancî di kovara Hawar de bi kar anîn û îro jî ji bo vî zaravayî wek referans tê qebûl kirin.

### 2.1. Endam û bandora diyasporayê

Endamên her du grûban endamên diyasporaya kurd a li Ewropayê ne. Cara pêşîn, salên 1960ê karkerên koçber ên kurd, pirranî li Elmanyayê, bi peymanên di navbera hiqûmetên welatên Benelüksê, Avusturya, Swîsre û Fransayê de li van welatan bi cih bûn. Lê bûyerên siyasî rengê vê koçberiyê guhart. Sala 1979ê li Îranê Şoreşa Îslamî pêk hat, bi salan şerekî xwînav di navbera Iraq û Îranê de qewimî, rejîma Iraqê li dijî Kurdan operasyona Enfalê pêk anî û li Tirkîyeyê jî derbeya leşkerî ya 12ê îlonê pêk hat, di encama van bûyeran de nifûsa Kurdên penaber ên Ewropaya Rojava û Amerîkaya Başûr zêde bû. Ligel ku serjimareke pêbawer a Kurdên diyasporayê tune ye jî, li gorî îstatîstîkên rojane tê gotin ku li Ewropaya Rojava li dora 1.2 milyon Kurd dijîn<sup>5</sup>.

Pirraniya endamên KK û GXV li Swêdê dimînin. Bi awayekî rêkûpêk 16 endam beşdarî xebatên KK dibin, yê GXV jî jiara wan 14 ye. Endamên KK ji Kurdên Ermenistan, Îran, Iraq, Sûriye û Tirkîyeyê ku

bi kurmancî diaxivin pêk tîn. Endamên GXV Kurdên zazakîaxêv ên Tirkiyeyê ne. Endam bi pirranî mamoste, rojnamevan, nivîskar, zimannas û aktîvîstên ziman in, ku kurmancî û zazakî baş dikarin biaxivin û binivîsin. Pirraniya endaman, ligel zimanên xwe yên dayikê û yê welatên lê dijîn, du-sê zimanên biyanî jî dipeyivin.

Pirsa otorîteya exlaqî ya endaman helbet cihê mînaqêşê ye. Endamên civateke li derveyî welat dijîn, dê çawan bikaribin bi kêrî pêşveçûna zimanê xwe bîn? Bo nimûne, Enstîtuya Kurdî, ligel ku gelek rewşenbîrên kurd ên li Ewropayê dijîn li xwe vedihewîne jî, endamên KK bi tu awayî nehatine hilbijartin. Ji aliyê din, divê em bi bîr bînin ku vê saziyê di çarçoveyê neteweyî de nav nedaye. Pirraniya endamên wê kesên ku berê wan dane nefiyê ne, ji bo nasîna ziman û çanda kurdî xebitîn. Xebatên ku wan di warê siyasî de li welatê xwe dimeşandin, li diyasporayê dageriyane xebata parastina zimanê xwe. Raboriya wan a milîtanî rê dide ku ew destekarî li ser çarenivîsa zimanê xwe jî bikin. Helbet ziman, bo avakirina neteweyekî xwedî roleke gelekî girîng e. Lê di rewşa diyasporayê de ziman dibe teselî û meremeke dilxweşkirinê: endamên ku nekaribûne mafên xwe yên siyasî bi dest bixin, qet nebe bi parastina zimanê xwe dikarin zimanê xwe ji mirinê rizgar bikin. Ev awayê self-serweriyê, ji aliyekî ve jî rewatiyê exlaqî jî dide wan. Asîmîlasyona ziman û kêmasiya saziyên neteweyî, di vî warî de rewatiyê dide her kesê bi karê ziman radibe. Pîvana herî baş a vê rewatiyê, têkiliya bikarhênerên vî zimanî ya bo xebata wan e û bikaranîn û belavkirina berhemê wê ye.

## 2.2. Organîzasyona civînan

KKê civîna xwe ya ewil li Katalonyayê, bi piştgiriya Hikûmeta Katalonyayê di sala 1987ê de pêk anî. GXVê jî civîna xwe ya destpêkê sala 1996ê li Stockholmê li dar xist. KKê civîna xwe ya 46ê par li Stockholmê kir. GXVê civîna xwe ya 18ê meha Tebaxê li Dersîmê girêda. Her du grub jî salê carekê du civînên bi maweyê hefteyekê li dar dixin. Di her civînê de, endam li ser mijar û babetên ku berê tîn diyarkirin û biryarê vedikolin. Piştî encamên xebatê, di kovarên Kurmancî û Vate de tîne weşandin. Endamên ku bi dilxwazî dixebitin tu piştgiriya madî nastînin û ji bo beşdarî civînan bibin, sale du hefteyan tatîlên xwe di vê oxirê de didin.

## 2.3. Armanc û hedef

Armancên KKê em dikarin di kurteyêke ku di Kurmancî de hatiye weşandin wiha destnîşan bikin: “Kurmanciya ku zimanê rojane yê pirraniya Kurdên ku li diasporayê dijîn e, ewa ku li Tirkiyeyê hatiye qedexekirin û li Sûriye, Îran û Iraqê ji pergala perwerdeyê hatiye veder kirin, dawiya vê sedsala 20ê pêdivî bi standardizasyoneke girîng heye: diviya gencîneya wê ya peyvan bê stabîlîze kirin, rastnivîs û rêzimana wê bê standard kirin, di jiyana rojane de di serî de di medya û perwerdeyê de, divê riya derbirîne li ber bê vekirin. Di nav neteweyên xwedî dewlet de, mîsyoneke wiha girîng ji aliyê Akademiya Ziman ve tê birêvebirin. Ji bo Kurdên ku demeke dirêj e bê dewlet in, peywireke wiha tenê diasporaya demokratîk a li Ewropayê dikare pêk bîne”. (Kurmancî, 1999)

Bi heman awayî GXV di pêşgotina Ferhenga Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî ku di sala 2009ê de weşandiye, mebesta vê grûbê wiha tê vegotin: “Zaravayê Kurdî Kirmanckî, li gorî deverê bi navên cuda cuda yên wekî Kirmanckî, Kirdkî, Zazakî û Dimilî tê binavkirin. Kirmanckî heta îro kêm pê hatiye nivîsîn û zimanê wê yê nivîsê pêş ve neçûye. Van salên dawîn nivîsandin bi vî zaravayî herçend hinekî zêde bûbe jî, ev bi Kurmanciya bi deverê heta ya gundê xwe tê kirin. Lê zimanê nivîsê ew e ku her ku diçe formên hevpar têne bikaranîn û dem bo demê divê bi vî awayî ber bi standartbûnekê ve biçe. Ev yek ancax bi xebatên cidî yên demdirêj mimkûn dibe. Civînên Kirmanckî ku sala 1996ê li Swêdê ji aliyê grûbeke Kirmanck ve hate destpêkirin, li Elmanya û Diyarbekirê hate domandin, li ser rastnivîs û termsaziya vî zaravayî xebat hat kirin û di vî warî de gavên girîng hatin avêtin.”

Wekî tê dîtin, gelek armanc û hedefên her du grûban hene: gencîneya ziman, standardkirina rênivîs û rêzimanê û ji bo xwendin-nivîskariya modern a kurdî bête pêkanîn, kodên nivîskî bêne çêkirin. Wekî tê zanîn, Kurdên ku mafê wan ê perwerde-hîndariya bi zimanê dayikê hate qedexe kirin, qebîliyeta wan a xwindin û nivîsandinê jî hate asteng kirin. Ji ber vê yekê, pirraniya Kurdan bi zimanê xwe yê dayikê xwendin û nivîsê nizanin. Van grûban xwest van armanc û hedefan bibin serî, wan ev ji xwe re kir siyaseta ziman. Lê belê gava ku xebatên van grûban bi awayekî hûr û kûr bêne vekolandin, dê bête dîtin ku ev armanc û hedef ji yên li jorî hatine destnîşankirin gelekî girîngtir in.

### 3. Analîz

Ev armanc û hedef dikarin li gorî modela analîza M. Nahir bêne nirxandin:

#### 3.1. Parzinandina ziman

Parzinandina ziman dabeşî du kategoriyan dibe, xwedî armancên derve û hundir e. Parzinandina derve, “zelaliya ziman” diparêze û ji bo ji kartêkeriyên derve biparêze, bikaranîneke taybet ferz dike. Parzinandina navxwe jî, ew e ku koda wek standart hatiye qebûlkin, ji bikaranîna ne normatîv a xelet biparêze. (Nahir 2000: 426-427). Bo nimûne, Nahir behsa hinek Akademiyên Dewletê (Israîl, Urdin, Kanada, Quebes û Îzlanda) dike ku wan xebat ji bo zelalkirina ziman, hêsankirina rêzimanê û xebatên duristkirina ferhengan pêk anîne.

Li welatên ku Kurdî lê tê axaftin, tê zanîn ku bandora Erebi, Farsi, Tirkî, li Ewropayê jî Fransî, Almanî, Îngilîzî li ser heye (Akin, 2007). Kurdî di warê zanistî, hiqûqî, tîbbî, siyasî û aborî de pêdivî bi peyvên nû heye û ji ber temasa ziman, kurdî peyvên nû ji van zimanan distîne. Her du grûban jî di van waran de peyv çêkirine, dixwazin peyvên bingehê wan kurdî li şûna yên biyanî bêne bikaranîn. Bo nimûne, kurmancî termsaziya komputerê encameke wisa nîşan dide: binmişk (fare altığı), bişkok (düğme), nimander (kursör), nîşanker (imleç). Bo zazakî em dikarin van mînakên bidin: keyepel (ana sayfa), binmerre (fare altlığı), torre (şebeke), tiknayene (tıklamak). Parzinandina navxweyî di xebatên KKê de xwe dan pêş, ji ber ku hemû têgehên ji devokên cihê têne bikaranîn paxav pê tê kirin. Bo nimûne, têgehên mal û malbatî ku li gorî devokan diguherin wiha ne: kal, kalik, bapîr (dede), pîr, pîrik, dapîr (nine), xweh, xwişk, xweng, xwehîng (kız kardeş).

KK, ji van têgehên yekî wek “a rast” an jî “a standard” empoze nake. Mebesta wê ew e ku têgehên heyî ber hev û arşîv bike û hemû têgehên ku behsa tiştekî dikin pêşniyar bike. GXV ligel ku heman metodê bi kar tîne, dîsa jî tercîha xwe jî dide pêş. Bo nimûne, di zazakî de gelek navên mêmîjê hene: eskici, eskiji, eskije, eskize, eşkice, eşkici, eşkiji, eşkuçi, işkij, işkiji, sikucî, sikûcî, skucî, skûcî. Ev têgehên ku jê re dibêjin Forma bînî, di civîna grûbê ya “meylê kombîyayîşî” de tercîh bo “eskije” tê kirin. Ji aliyê din ve ji bo “baranê” jî ligel “varan”ê peyva “yaxer/yaxir” ku nêzî ya Tirkî ye, tê redkirin. Wekî ji vê mînakê jî tê dîtin, gencîneya peyvên a zazakî, bêyî ku li koka peyvê bê nihêrtin ji bo destnîşankirinê tê berhevkirin.

### 3.2. Zindîkirina ziman

Zindîkirina ziman, zimanê mirî an jî pîrr kêr pê tê axaftin ew e ku mirov wî zimanê dîsa di nav civakê de bike zimanê təkiliyê (Nahir, 2000: 428). Zindîkirina ziman her çend mînakên wê gelekî kêr bin jî, bo nimûne îbranî dikare bête dayîn. Ji bo zindîkirina zimanekî pêdivî bi kartêkerên sosyokulturî yên neteweyî, siyasî, dînî û perwerdeyî heye. Axivêrên kurmancî û zazakî kêr bîn jî, tê zanîn ku di nav

civakê de hê jî her du têne bikar anîn. Ji ber vê jî xebatên her du grûban, nabe ku di vê kategoriya zindîkirina ziman de bêne dîtin. Ji xwe, endamên her du grûban li derveyê welat in û tu piştgiriya saziyê û resmî ji wan re nayê kirin, ji ber vê jî mimkûn nîne ku bi zindîkirina kurmancî û zazakî re eleqedar bibin.

### 3.3. Reforma Ziman

Li gorî Nahir, mebesta reforma ziman hêskirina bikaranîna ziman e (Nahir, 2000, 429). Hêskirina bikaranîna ziman her çend wek motîvasiyona herî girîng derketibe holê jî, reform pirtir bandorê ji helkeftên îdeolojîk, siyasî û dînî digire. Elfabaya latînî ji aliyê Mustafa Kemal ve adapteyî Tirkî hate kirin û rêgezên rastnivîsa fransî dikare wek nimûne bêne dayîn. Di vî warî de xebata Bedirxaniyan Bira ku elfabaya latînî adapteyî dengê kurdî kirin, dikare wek reform bête dîtin (Akın, 2006). Di xebata her du grûban de jî hewldaneke ku mirov bibêje ev reform e ber bi çav nabe.

### 3.4. Standardîzasyona ziman

Li gorî Wardhaugh (2006), standardîzasyona ziman, pêvajoya bi awayekî vekirî ya kodlêdanîna zimaneke ye. Ev pêvajo, pirranî wek pêşveçûna pirtûkên ferheng, rastnivîs, rêziman û pêkhatina edebiyateke nivîskî ye. Wekî li jorî jî hate diyar kirin, kurmancî û zazakî demeke dirêj di van waran de bi sînora ma û standardkirina rastnivîsê hê jî berdewam dike. Ji ber vê, tekûzkirina gencîneya peyvan, kodkirina nivîseke standard û xebatên bo pêkanîna nivîskarî û xwendevaniya kurdî ya modern, dikarin wek hewldana standardîzasyonê bîn pejirandin. Ji aliyê din ve, xebatên GXV yê li ser rênivîsa zazakî dikarin wekî xebata herî girîng a standardîzasyonê bîn dîtin. Di berhemên nivîskî yê hevde de jî, nivîsa zazakî, ji ber cudahiya devokên herêmî ferq û cudahî nîşan dide. Yek ji hewldana herî girîng a GXV ew e ku van nivîsandinên cuda bigihîne hev û kodên nivîsîneke standart peyda bike. Di vî warî de, di encama xebatên grûbê de sala 2005ê li Stenbolê bi navê Rastnuştîşê Kimanckî (Zazakî) rêbernameyek hate weşandin, di serî de elfabe, navê roj, meh, dîn, mezheb, kesayet, cînavk, bernav, daçek, gihanek û lêker li gorî daxwaza GXV hatine destnîşan kirin. Li dora 7000 peyvên di Vateyê de jî gihîştin formeke standard.

### 3.5. Belavkirina Ziman



Belavkirina ziman, wek hewldana zêdekirina kesên ku bi ziman diaxivin hatiye binav kirin. Ji bo belavkirina zimanekî, pêdivî bi navgînên sazûmanî yên wekî xwendegêh, medya, hwd heye. Wekî em ê li pêş bibînin, ev grub dixwazin bi awayên cur bi cur encamên xebatên xwe belav bikin lê ev yek ka dê çawan hejmara kurmancîxêv û zazakîxêvan zêde bike, ev cihê pirs û gumanê ye.

### 3.6. Modernîzasyona peyvan

Modernîzasyona peyvan, xebateke wiha ye ku ji bo axivêrên zimanî peyvên nû çêdike da ku ziman pê geş bibe û bi pêş ve biçê. Her du grûban, xebatên xwe li ser vê yekê şidandine, ji ber vê em dixwazin li ser vê rawestin. Mirov dikare modernîzasyona peyvan di çar kategoriyan de binirxîne.

- Ji bo çêkirina gencîneya ziman û ferhengeke tematîk a giştî, peyvên zimanî yên heyî bêne berhev kirin, nirxandin û arşîv kirin: Ev her du grub, ji jêderên destpêkê yên nivîskî û deqên kevin gotinan kom dikin û wan dîsa raberî axivêrên ziman dikin. Bo vê yekê, Nûbara Piçûkan a ku helbestkar û nivîskarê navdar ê Kurd Ehmedê Xanî di 1680ê de nivîsandiye; Mewlûda Bateyî ya şair û dîndar Mela Husênê Bateyî ku di sedsala 15ê de nivîsandiye, Dîwana Melayê Cizîrî ya ku di sedsala 16ê de nivîsiye; Mewlidî Kirdî ya Ehmedê Xasî ku sala 1899ê li Diyarbekirê nivîsiye girtine û peyv ji wan komkirine.

Bi jêderên nivîskî re jêderên devkî û folklorîk jî ji bo van grûban mijara vekolînê ne. Peyvên di ware anatomiyên mirov û ajalan, çandinî, botanîk, aborî, hiqûqî, eskerî de jî tên berhev kirin û arşîv kirin.

- Li ser kokên heyî dariştina peyvên nû: Ji ber ku kurmancî û zazakî di hin waran de pêdiviyê bi peyvên nû dibînin, ev kom gava pêwîst be peyvên nû çêdikin. Metoda wê jî, ew e ji peyvên zimanê heyî, pirranî peyvên hevedudanî yên nû têne çêkirin. Bo nimûne, peyvên bo trafikê: korerê, kor û rê. Ji peyva kor û rê hate dariştin. Peyarê, ji peya û rê çêbûye. Bi heman awayî derbasgeh; derbas û geh. Peyva qeşaşit (dondurma), qeşa (bûz) û şit (şîr).

- Ji zimanê biyanî peyv wergirtin û ew li gorî fonetîka kurdî adapte kirin: Heke îmkana ku peyveke nû pê bê dariştin tune be, ji jêderên biyanî sûd werdigirin. Bi vê rêbazê, peyva ku jixwe axivêrên wî zimanî di jiyana rojane de fêr bûne û bi kar tînin dê statûyeke “fermî” lê bê kirin û rêzikên wê yên nivîsê bêne diyarkirin. Bo nimûne peyva taxim (takım) ji tirkî tê, peyvên şampiyon, garaj, villa bi awayê champion, garage û villa ji Fransî tên. Bi heman awayî peyvên ekonomî, demokrasî, demokrat bi awayê économie, démocratie, démocrate ji Fransî derbas bûne.

- Werger an jî texlîda peyvan: Bi vê rêbazê, peyvên ji zimanê dîtir hatine heçko li Kurdî têne wergerandin an jî li gorî binemayê van peyvan peyveke nû tê çêkirin. Di vî warî de mînakên bê hejmar hene, ev jî nîşana wê ye ku bi vê rêbazê gelek peyv têne dariştin: bota binawe (denizaltı), asayîşo peroyî (genel asayış), wezaretê perwerdeyî (eğitim bakanlığı), ê-name (e-posta), ê-pirtûk (e-kitap), nîvmeydan (yarım saha), meydana lîstikê (oyun alanı), devera golê (gol alanı).

### 3.7. Lêkdana termsaziyê

Lêkdana termsaziyê, bi taybetî di ware teknolojîk û zanistî de ji bo nediyariya têtikiliyê kêmkirina, ji pêkanîna lîsteyên peyvên pêkhatî ye. Di xebatên KK de, pêkanîneke ku em dikarin bêjin lîsteya peyvên pêkhatî, nehate dîtin. Wekî tê zanîn, ji ber cudahiya devokên herêmî û nebûna sazîyên standardîzasyona neteweyî, ji bo heman tiştî bibêjin dibe ku gelek peyv bi dest bikevin. Bo nimûne, di kurmancî de bo “şevreşkê” nêzî 30 nav hene wek (şevşevok, şevşevik, şevrevîng, şibşibênek, çemçemok, çekçekûle, çeççeçole, çilîçilî, pelşimok, pirçimok, perçemek, pirçemek, bacemok, baçimêlk, balçimok, berçemik, hwd). Weke me li jorê jî got KK, ji van navan yekî dernaxe pêş.

Di xebatên GXV de mirov dikare lêkdana termsaziyê bibîne. Bo nimûne, di zazakî de ji bo “mislimaniyê” peyvên “misilmanê, mislumanê, musulmanê, musulmonê, musulmûnê, bisilmûnê” têne bikaranîn. Lê GXV di civîna meylê kombîyayîşî de biryar daye ku ew “muslumanî” bi kar bînin.

### 3.8. Zelalkirina stîlê

Armanca zelalkirina stîlê ew e ku, ji bo kêmkirina nediyariya têtikiliya di navbera profesyonel, burokrat û xelkê de, gencîneya peyvan, rêziman û pîvanên bikaranîna stîlê hêsan bike. Li gorî Kaplan û Baldauf, zelalkirina ziman, peymanên sazîyên dewletê aliyê wan in û zimanê kontratê yê demên din ji bo baş bê fêmkirinê tê kirin (1997: 73-74). Wekî tê dîtin, ji ber ku avabûna van grûban, armanc û hêza wan a kirinê kêmkirina, ne mimkûn e ku hewldaneke zelalkirina stîlê bidine ber xwe.

### 3.9. Têtikiliya nav zaravayan

Têtikiliya nav zaravayan ji xebatên hêskirina têtikilî û danûstandina di navbera kesên devok û zaravayên cuda yê heman zimanê bi kar tînin pêk tê (Nahir, 2000: 436). Wekî eşkere bû, ji bo heman

tişt û têgehê bînin ziman, dive peyvên devok û zaravayên cihê bêne berhev kirin û biserober kirin. Ev dibe ku weke hêsankirina têtîliya di navbera zaravayan de bê binav kirin.

### 3.10. Parastina bikaranîna ziman

Gava zimanek ji ber sedemên civakî, aborî, perwerdeyî û siyasî an jî ji ber gef û gurê bikaranîna wî zimanî wek sembola civakekê û nîşana nasnameya neteweyî kêr dibe (Nahir, 2000, 439), pêdivî bi xebatên ji bo parastina bikaranîna ziman çêdibe. Parastina bikaranîna ziman, li Amerîkaya Bakur û Başûr, Efrîka, Ewropa û Avustralyayê ji bo zimanên xwecihî hate bikaranîn ku pirr kêr bi wan dihate axaftin. Li gorî Kaplan û Baldauf, parastina bikaranîna ziman, makro-kategoriyek e ku van armancan digire nav xwe : Zelalkirina ziman, Zindîkiirna ziman, Reforma ziman, Standardîzasyona ziman, Belavkirina ziman û hwd (1997: 77-78). Bi awayekî din, hemû xebat û armancên ji bo parastina bikaranîna ziman digre nav xwe. Her çend derfetên her du grûban jî ji bo parastina ziman tune be jî, xebat û hewldanên wan dikarin wek hewldana parastina kurmancî û zazakî bêne nirxandin.

### 3.10. Standardîzasyona Kodên-alîkar

Nahir, vê armancê, wekî zimanê ker û lalan (zimanê îşaretan), navên deveran, rêgezên transkripsiyonê û standartbûn an jî guhartina elemanên dîtir destnîşandike (2000:441). Xebatên grûbê qismek dikare di vê kategoriyê de bêne nirxandin. Bo nimûne, standartkirina navên welat û bajaran. Ev grub, dikarin formên standart ên van navan belav bikin: Afxanistan, swed, Swîs, Brîtanya Mezin, Norwey (KK). GXV jî hewl dide navên bajaran jî standardize bike: Bidlîs, Çewlîg, Dêrsim, Mamekiye, Dîyarbekir, Riha, Semsûr, Xarpêt, hwd.

## 4. Weşandina encamên xebatê

Wekî tê dîtîn, modela teorîk a Nahir beşeke mezin a xebatên her du grûbên KK û GXV digire nav xwe. Tenê çar armanc (Zindîkirina ziman, Reforma ziman, Belavkirina Ziman û Zelalkirina Stîlê) di xebata wan de dîyar nebûn. Ev armanc jî ji aktîvîteyan pêk tê ku pêwîstiya wan bi lêkdana faktorên têkel heye. Helbet, mirov nikare binirxîne ka xebatên her du grûban, çi bandorî li axivêrên ziman dikin û berhema wan çawan tîn pêşwazî kirin. Ev grûbên ku xwedî çi şiyana kiryarê nînin lê xwedî

desthilatiyeke exlaqî ne, gelo dikarin bandorê li geşedana kurmancî û zazakî bikin? Ev encax bi lêkolîneke li ser vî karî û karîgeriya wê ya li ser axivêrên vî zimanî dikare mimkûn be. Niha em berê xwe bidinê bê ka encam çawan tên weşandin.

KK encam û berê her civîna xwe di kovara bi navê kurmancî de (salê 2 hejmar) diweşîne. Hemû hejmarên kovarê ji malpera Enstîtuya Kurdî ya Parîsê dikare bête daxistin<sup>6</sup>. Ji aliyê din ve ferhengeke online, wergera kurmancî, Tirkî, Fransî û Îngilîzî di nav xebatên wê de ne. Hejmarên destpêkê yê kovarê heta hejmara 20ê (1987-1996) sala 1999ê weke cildeke hate weşandin û 40 hejmarên destpêkê yê kovarê weke cildeke îsal meha Gulanê li Stenbolê ji Weşanên Avestayê derket. Ji aliyê din ve, Ferhengeke kurmancî-Fransî ku berhema KK ye û 65 000 peyv tê de hene, li Parîsê li ber çapê ye.

Bi heman awayî, GXV, encam û berê xwe di kovara VATE de diweşîne. Kovara VATE ku 33 hejmar hatine çapkirin, berê li Stockholmê, ji hejmara 20ê şûnde li Stenbolê tê weşandin. Hemû hejmarên VATE dikarin bête daxistin<sup>7</sup>. Ji aliyê din ve, GXV, Ferhengê Tirkî-Kirmanckî (Zazakî) a 34000 peyv, (238 rûpel) û 34000 peyv Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî (624 rûpel) bi çapa sêyem sala 2009 ji weşanên Vate ya li Stenbolê derxist. Heman weşanxaneyê heta niha 36 pirtûkên zazakî (roman, çîrok, helbest, rêziman, zargotin, rênivîs û rêziman) çap kirine. Bo van kitêban standardên ziman yê Koma Vateyê ne.

Girseya ku her du grûban ji xwe re kiriye armanc, di serî de pîspor û aktîvistên ziman, rojnamevan, werger in. Piştî, axivêrên ziman in ku profesyonelên ziman xwe bi berhemên xwe û bi danasîna xebatên her du grûban gihandine wan.

## 5. Encam

Xebatên her du grûban jî, piştî Bedirxaniyên Bira dikare wek plansaziya herî girîng a ziman bê dîtin. Di her du aliyên de jî, xebatên militan û lêkolînerên ziman, rewşenbîrên ku li sirgûnê, li diasporayê dijîn gelekî diyarker in. Xebatên Bedirxaniyên Bira li ser rêziman û rênivîsê zal dibûn, plansaziya berhevokî bû bingehê xebata her du grûban.

**PERAWÊZ**

1 <http://www.alikaya.org/>

2 Paşgira “-asî” maneya “wekî”, “dişibê” dide. Kirdasî yanî wekî Kird. Dişibe Kirdê, Dibê qey Kird e. Kemal Badıllı, di pirtûka xwe ya bi navê Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Zaravayê Kurmancî) (1965) de, wiha dinivîse: « Zazayên li Tirkiyeyê, ji ber ku xwe wek Kurdên eslî dibînin, ji xwe re dibêjin Kird, ji Kurdên derveyî xwe re jî dibêjin Kirdasî, a rast vê pirtir ji Kurmancan re dibêjin, Kirdasî –piçekî jî bi wateya kêmdîtinê bi kar tînin, yanî (yên wekî Kurdan, kurdok) « (r.6)

3 <http://cingeneyiz.org/>

4 <http://www.zazaki.net/haber/toplumsalkurt-gruplarindan-zazalara-genel-bir-bakis-291.htm>

5 Le Monde (<http://www.lemonde.fr/web/infog/0,47-0@2-3210,54-973221@51-960605,0.html>)

## Peyvên dubarekirî di romana Şivanê Kurmanca de

### *Kuîlk Elîkake*

Dema min çend rûpelê pêşî ên Şivanê Kurmanca (Lîs, 2009) xwend, pîrbûna peyvêd dubarekirî bala min kişand. Her pê de çûm min binê wan xêz kir û hejmareke ecêp derket holê.

Min çend romanên di roja me de jî hatine nivîsandin jî xwend, hejmara dubarekirinan hinde zêde nebûn. Hinek li ser vê fikirîm. Gelo ji bo çî nehe hinde zêde dubarekirin di berheman de çinîne?

Ez vê hinek bi qada jiyana kurdan ve girê didim, bi şêweya jiyana wan ve. Sed sal berê jî û heta salên heştê jî, pîraniya kurdan li gund û bajarokên piçûk dijîyan. Çandekê bajarîbûnê ya serkeftî nerûniştibû. Kurdên li gundan dijîyan di nav xwezayê de bûn. Hin dubarekirin jî ji bûyerên xwezayî tî û ev jî bi rehetî dikete nav zimanê wan. Sedemeke dî jî, belavbûna perwerdeya kurdî ye. Bi perwerdeyê re zimanekê wekhev derket holê û tenê çend dubarekirin derketin pêş. Ku mirov pirtûkên perwerdeyê bigre pêşiya xwe ji 10 heb peyvên dubarekirî yê zêde tî bikaranîn tiştek dî nabîne. Ew jî dibe sedem peyvêd dubarekirî di nava jiyana û nivîsê de kêmbûn.

Mixabin min xebateke berfireh ya li ser vê mijarê peyda nekir, bêyî xebata Husein Muhammed ya bi navê "*Peyvsazî bi Dubarekirinê*" (Kovara Kanîzar, Hejmar: 3) de hatî weşandin. Di vê nivîsê de kategorî û pênaseyên Husein Muhammed hatine bikaranîn.

(<https://zimannas.wordpress.com/2016/01/16/peyvsazi-bi-dubarekirine1/>)

Romana Şivanê Kurmanca ji aliyê Erebe Şemo ve di sala 1935an de hatiye nivisîn. Ev berhem romana yekem a kurdî ye.

Di romanê de Erebe Şemo jiyana xwe ya bi şivantî, leşkerî derbas kirî vedibêje. Vê vegotinê bi zimanekî bingeha xwe ji çanda devkî digre vedibêje. Jiyana gund li zimanê wî tesîr dike û vegotin dibe uslubeke pastoralî. Ev pastoralî bi xwe re jî, ji bo vegotinê xweştir bike peyvên dubarekirî tîne. Ev peyvene zêdetir ji bûyerên xwezayî çêbûne.

Di vê lêkolînê de peyvên dubarekirî yên di pirtûka Şivanê Kurmanca de hatiye peyda kirin û ji aliyê wateyê ve hatine tasnîf kirin. Ji bo her kategoriyê jî mînak bi hejmara rûpelê ve hatine dayîn. Dest li rastnivîsa hevokan nehatî dayîn.

Hemû peyvên dubarekirî di dawiya nivîsê de dê wekê lîste bê rêzêkirin ji bilî wê mînakên ser pênasayên Husein Muhammed jî ji romana Şivanê Kurmanca hatiye vegirtin.

### **PEYVÊN DUBAREKIRÎ**

Ku mirov vegotina xwe xweştir, bihêztir û xurttir bike; hemwate, nêzîwate û dijîwateyên peyvên yan jî peyvên telafuzên wan dişibe hev tê bikaranîn. Ev cûre peyv, peyvên dubarekirî ne.

\*Dudokirin, dubare, duçarî seyîfandin, dugisnî. ( Ferhenga Kurdî-Tirkî, Enstîtuya Kurd ya Stenbolê, 2010)

\*Tekrarî (farsî), reduplication (ingilizî), ikileme (tirkî)

#### **1) Dubarekirina temam**

Di dubarekirina temam anku kamil (full reduplication) de peyva serekî bi temamî tê dubarekirin. Di kurdî de dubarekirina temam dikare xwerû be (pure), binavber be (medial) yan jî bidûvik be (final).

**Dubarekirina temam a xwerû (pure full reduplication):** Peyva bingehîn tê dubarekirin lê ti tiştekî din lê zêde nabe. Loma peyv xwerû ye û xwerû dimîne.

**bere-bere: gav bi gav, berre.** (Bere-bere ez jî îdî hînî wî sifetî bûm. r. 87)

**2) Dubarekirina temam a binavbir (medial full reduplication):**

Peyva bingehîn tê dubarekirin lê herwiha tişteke dikeve navbera peyva dubarekirî jî. Ev "navbirk" dikare pirtikeke girêdayî yan jî peyvikeke serbixwe be.

**\*pirtikeke girêdayî:** nalenal (*Nalenala birîndara bû*. r.122)

**\*pirtikeke serbixwe:** roj bi roj (*Çimku roj bi roj av ji berfê dixwe*. r. 90)

- **o:** Di navbera çend peyvên dubarekirî de navbirka "o" yan "û" heye. Gelek caran di nivîsên kurdî de bêbiryarî heye ka peyvên wisa bi kîjan ji wan herdu navbirkan bînin nivîsîn.

**nanoziko:** bi bedeleke gelek erzan xebitîn. (*Ez razî bûm, wekî min nanoziko bigrin, çimku ew heqê bavê min distand têra me nedikir*. r.74)

**soromor:** ji ber eşkerebûna razekê yan jî ji ber tawanekê fedî kirin, bi şermê ketin. (*Ez soromoro dibûm, şermbûnê lap ez hevekî kûvî kirim*. r.80)

**Dubarekirina temam a bidûvik (final full reduplication):** Peyva bingehîn tê dubarekirin û paşpirtikek dikeve dawiya peyvê. Berevajî navbirkê, dûvik her dem bi paşgir e anku bi peyvê ve girêdayî ye.

- **an** Li goreyê Husein Muhammed ev paşgir tenê di peyva "carcaran" de heye, ev di romanê de jî wese ya.

**Carcaran:** carinan, hinde caran, kêman caran. (*Paşê rojêd hewa xweş bûn, carcaran îzna min didan ez wan ra diçûme ber pêz*. r.56)

**Dubarekirina pişkî (partial reduplication)**

Dubarekirina pişkî anku beşî ji vê diyardeyê re tê gotin ku tê de ne hemû peyv lê tenê pişkek anku beşek jê dubera dibe

**Hûr-mûr:** Tiştên piçûk (xanimê temî dabûne mêrê xwe, wekî jê ra hûr-mûr bikire. r. 80)



\* Hin caran herdu peyv bi nîrxê xwe wek hev in, mirov nikare bibêje ka kîjan peyva bîngêhîn e û kîjan jî tenê dubarekirina wê ye:

**şilî-şilope:** Ji baranê re şilî tê gotin, ji tevlihevbûna berf û baranê re jî şilope tê gotin. (*Ew jî ne ber şilî-şilopê, baranê teyrokê; ne jî bêjî gura xwar, dîza bir.* r. 86)

**mêşûmor:** Mêş û ajalên din ên wek wan. (*Vira ne germ e, mîna deşta mêşûmor heywên qe naêşîne.* r. 96)

\*Dubarekirina pişkî dikare xwerû yan jî binavbirk be. Di dubarekirina pişkî ya xwerû de ti peyvik an pirtik nakevin navbera peyva serekî û peyva bi pişkî dubarekirî:

**hêdî-hêdî:** Bi hêdîka, giran giran, bere bere. (*Em hêdî-hêdî pey pêz ra bin baran kaş dibûn, diçûn.* r. 101)

**Xwe-xwe:** Xwe bi xwe. (*Ew lîstikê zara wana xwe xwe anî, da min, niha jî dibên: te dizîye.* r. 83)

### **Pişka duyem ji peyveke serbixwe**

Beşa duyem dikare ji peyveke serbixwe ya ji xwe heyî pêk bê. Dubarekirin di vî haletî de tenê bi hindê ye ku beşek ji peyva duyem bi dengê xwe wek beşa yekem e. Wekhevî dikare li destpêkê yan jî li dawiyê be:

Wekhevî li destpêkê:

**Morî-mircan:** xişir, ristik. (*Morî-mircanê stûyê wanda meriv heyran hijmekar bû lê binêhiriya.* r.100)

Wekhevî li dawiyê:

**Silav-kilav:** (*Cînarê me bihîstin, hatin, dora min tijî bûn silav-kilav dane min.* r. 176)

### **Pişka duyem ji veguhastina bi M**

Beşa duyem dikare dubarekirina pişka yekem be lê di beşa duyem de konsonanta pêşîn a peyvê bi M hatiye veguhastin:

**hûr-mûr** (*Wexta em gihîştine mala wan, min hûr-mûr danî ez vegeîm.* r. 162)

### **Dubarekirina bi hevwateryan**

Di kurdî û gelek zimanên din de jî hin tişt bi du peyvên hevwater (hevmane) anku sînonîm tîn dubarekirin. Hin caran yek ji van peyvên (bi texmîna bikarînerên wan) xwemalî ye û ya din jî erebî yan jî tirkî hatiye wergirtin:

**Kal-extiyar:** (*Min dê û bavê xwe belengaz, kal-extiyar hiştim.* r. 165)

**Çek-silhav:** (*Qazax bi çek-silhava berî nava pala da, paledane kutanê du sê heb jê girtin.* r. 145)

**rût-tazî:** (*Li wêderê ez rût-tazî kirim, kincên min nihêrîn.* r. 149)



\* Carinan herdu peyv ne bi temamî hevwater ne û ji aliyê dengnasî ve jî ne dubarekirin in lê bi maneya xwe ya nêzîk heman tiştî dubare dikin û giraniyê didinê:

**kêf-henek:** (*A wa hevra metelok digotin, kêf-henek dikirin, diçûn.* r. 182)

**Toz-duman:** (*Toz-duman ji erdê quloz dibû.* r. 19)

### Dubarekirina bi dijawateyan

Ji bilî dubarekirina bi hevwateran, di kurdî de peyvsazî herwiha dubarekirina bi dijawateyan anku antonîman jî mimkin e. Dubarekirina dijawateyan dikare ji du peyvên serbixwe yê dijî hev pêk hatibe (bo nimûne ji du rengdêran) yan jî ji forma erênî û forma neyînî ya heman lêkerê bin:

**kir-nekir:** (*Wana du sê cara hicûm kir, wekî bêne hewara merîyêd xwe, kir-nekir qerewîlêd merê nedana wana.* r. 170)

**Çend mînak ji helbestvanan:**


Ji du zilfan hey hey / ji du xalan wey wey / derdmend e Batey / **tar û mar** im ho (Derd û dax im, Mela Huseynê Batayî)

Re'y û tekbîr mî xilas bûn / zûlf û cogan **çep û rast** bûn / **gilf û gazin** hêqiyas bûn / ay dilê min ay dilo... (Ay Dilê Min Ay Dilo, Feqiyê Teyran)

Bejna yarê bê nav çavê / Me dît ji tawê dûrê tawê / dirêt ji hêstra têya avê / Ax dikir wê gavê / bona **bêjn û bala** lavlavê / çavreşê, egrîcexawê. (Xwezila Min Bi Par, Ewdila Goran)

**Sef sef** dimeşîne koh û deştan / **ref ref** dixûşîne seyr û geştan (Bi derketina şehriyane bi deştê ji bo sersal û geştê, Ahmedê Xanî)

Huş be! ji wan **sîng û berên** metropolên biyanan meke behs. (Qesîdeyek Ji Bo Bîra te, Yehya Omerî)



## RÊZIMANA KURDÎ (beşa 1)

**Selîm Biçûk**

### **Naverok**

Pêşgotin

1. Ziman, rêziman û hêmanên zimanê kurdî

1.1 Ziman çi ye

1.2 Hêmanên zimanê kurdî

1.3 Rêziman çi ye?

1.2.1 Tîp û deng

1.2.1.1 Abc ya kurdî

1.2.1.2 Tîpên dengdar

1.2.1.2.1 Kurtedeng

1.2.1.2.2 Dirêjedeng

1.2.1.3 Tîpên dengdêr

1.2.1.4 Pevdengtîp

1.2.1.5 Siwartîp

1.2.1.6 Cêwîtîp

1.2.1.7 Rastnivîsandina tîpan

1.2.1.7.1 Tîpên gir û hûr

1.2.1.7.2 Tîpên dengdar li pey hev

1.2.1.7.3 Yekgirtina tîpan

1.2.1.7.4 Cîguhertina tîpan

1.2.1.7.5 Bihevguhertina dengdaran

1.2.2 Kît

1.2.2.1 Bêjeyên yekdeng

1.2.2.2 Bêjeyên dudeng

1.2.2.3 Bêjeyên sêdeng

1.2.2.4 Bêjeyên çardeng

1.2.3 Peyv

1.2.3.1 Nav

1.2.3.1.1 Beşên navan

1.2.3.1.2 Zayend

1.2.3.1.3 Zêder

[1.2.31.4 Piçûk](#)kirina navan

1.2.31.5 Hejmar

1.2.3.6 Tewandina navan

1.2.3.1.7 Darêja berkarî

1.2.3.1.8 Navên kirdeyî û berkarî

1.2.3.2 Cînav

1.2.3.2.1 Cînavên kesok

1.2.3.2.2 Cînavên bêhêl

1.2.3.2.3 Cînavên nîşandek

1.2.3.2.4 Cînavên pêgehîn

1.2.3.2.5 Cînavên pirsyariyê

1.2.3.2.6 Cînavên nependî

1.2.3.2.7 Cînavên xwemalîn

1.2.3.2.8 Tewandina cînavan

1.2.3.3 Rengdêr

- 1.2.3.3.1 Rengdêrên pesinde
- 1.2.3.3.2 Rengdêrên dumil
- 1.2.3.3.3 Rengdêrên nîşandek
- 1.2.3.3.4 Rengdêrên hejmarî
- 1.2.3.3.5 Rengdêrên pirsiyarî
- 1.2.3.3.6 Rengdêrên nependî
- 1.2.3.3.7 Rengdêrên xwedanî
- 1.2.3.4 Hejmar
- 1.2.3.4.1 Beşên hejmarê
- 1.2.3.4.2 Tewandina hejmaran
- 1.2.3.5 Lêker
- 1.2.3.5.1 Veguhastina lêker
- 1.2.3.5.2 Di lêkeran de rader
- 1.2.3.5.3 Raweya fermanî û KDN
- 1.2.3.5.4 Komên lêkeran
- 1.2.3.5.5 Di lêkeran de dem
- 1.2.3.5.6 Di lêkeran de rawe
- 1.2.3.5.7 Di lêkeran de nakirin
- 1.2.3.5.8 Lêkera bûn
- 1.2.3.5.9 Lêkera hebûn
- 1.2.3.5.10 Lêkekerên derhingêv
- 1.2.3.5.11 Çend lêkerên hîmî
- 1.2.3.6 Hoker
- 1.2.3.6.1 Hokerên demîn
- 1.2.3.6.2 Hokerên cihîn
- 1.2.3.6.3 Hokerên çawanî
- 1.2.3.6.4 Hokerên hejmarî
- 1.2.3.6.5 Hokerên pirsiyarî
- [1.2.3.7](#) Daçek

- 1.2.3.7.1 Daçekên lêkerî
- 1.2.3.7.2 Daçekên raweyî
- 1.2.3.7.3 Daçekên navdêrî
- 1.2.3.7.4 Daçekên erênî
- 1.2.3.7.5 Daçekên nayînî
- 1.2.3.7.6 Daçekên pirsiyarî
- 1.2.3.7.7 Daçekên egerî
- 1.2.3.7.8 Daçekên vekitî
- 1.2.3.8 Gihanek
- 1.2.3.8.1 Gihanekên xwerû
- 1.2.3.8.2 Gihanekên dubare
- 1.2.3.8.3 Gihanekên daçekî
- 1.2.3.9 Bang
- 1.2.3.9.1 Bangên gazîkirinê
- 1.2.3.9.2 Bangên dilxweşî û şahiyê
- 1.2.3.9.3 Bangên êş nifrîn û kovanan
- 1.2.4 Hevok
- 1.2.4.1 Avahiya hevokê
- 1.2.4.1.1 Hevokên lêkerî
- 1.2.4.1.2 Hevokên navdêrî
- 1.2.4.1.3 Hevokên bangê
- 1.2.4.2 Di hevokê de niqteşanî
- Çavkanî

### Pêşgotin

Gelê Kurdistanê ji berbanga dîrokê ve di bin nîrê bindestiyê de êş û zorê dikişîne. Her tiştên Kurdan ketine ber bayê talan û wêrankirinê. Badev û firtoneya koledariyê serax û binaxa me bi bêbextî dimale. Dijmin, kelepor û kevnetoreyê me jibo xwe bi kar tîne. Hebûn û kesbûna me di bin seqem û berfa mêtîngeryê de dilerize û bêçare hêdî hêdî diçilmise û tê pişavtinê. Zimanê me jî, mîna endamekî bingeîn ji hebûna me ya netewî dibe armanca êrişên hovane. Jiber ku ziman hêlîna gel e. Hêlîna dîrok, çand, tore û hemû nirx û bihayên netewî ye. Lew re bûye armanca yekemîn ji lêdanên mêtîngeran re. Jibo ku dijmin gelê me ji meydana rake, lêdana mirinê avêtiye zimanê kurdî. Lew re baş zanibû ku kuştina zimanê kurdî, kuştina netewa kurd bi xwe ye. Kuştina kurdayetî û kesbûna kurdî bi xwe ye. Ev rastiyek e ku mirov nikare jiber çavan bixe. Di dirêjahiya dîroka Kurdistanê de, dijmin ev ramyarî bi rê ve birîye. Di dema serdariya Ereban de, Omerê Kurê XETAB, zimanê kesê ku bi kurdî dipeyîvî jê dikir. Herwiha piştî binkevtina serhildana Dêrsimê, pêşniyaza I. INONU ew bû ku qirkirinên sipî bên pêkaninê. Jibo kuştina giyana serhildêr û berxwedêr li cem Kurdan qîşleyên leşkerî hatin avakirinê û sêwiyên ku dê û bavên wan hatibûn kuştinê bi mejî û ramana kemalî tê de hatin xwedîkirinê. Armanca yekemîn ji van dibistanên di nav qereqolên leşkerî de ew bû ku tore, ziman, dîrok û kesbûna Kurdayetî bi nifşên kurdî bidin jibîrkirinê. Lê tevî van êriş û qedexekirinan jî, zimanê kurdî liber xwe da. Di çiya, şikeft û asêgehên Kurdistanê de, ji hêla gelê Kurdistanê ve hat parastin. Ev jî, encama resenî û xwezaiya zimanê kurdî û taybetiyên gelê kurd in.

Zimanê me zengîn, pak, ciwan û xweş xwe gihand îro, lê mixabin ku heta niha abc û rêzimanê yekbûyî û hevgerî jibo wî peyde nebûye. Ev jî, ji rewşa bindestiya welat tê. Bi tenê ev daxwaz di nav welatekî serbixwe û azad, ji hêla dezgeheke netewî ve pêk tê. Îro hoyên xweyî û babetî derfet û karînan didin jibo birêvebirîna vî karî. Di vê derbarê de pêwîst e, ku herkes çî dizane bide gelê xwe. Lew re ku pêdiviya zimên jibo Kurdan mîna xwarin û vexwarinê ye.

Gelek rewşenbîr û zimanzan ji vê xebatê ditirsin. Çêkirina rêzimanekî bê kêmayî dikin bihane û li dijî vî karî derdikevin. Gelek jî, dityarên nexweş yên mîna : " Pêwîstî bi gelek zimanzanan nîn e " tînin ziman. Zimanzanê jî, mîna her zanistîşax merc û hoyên wê hene. Lêkolînên ku dibin, giring e bi awayekî zanistî bin.

Ez jî, mîna kurdekî welatperwer xwe berpirsiyarê pêşvebirina vê xebatê dibînim. Li gor karî û derfetên xwe, çiqas kêr bin jî, ezê xwe berdim nav gulistana zimanê Kurdî. Xwe bi gul û çîçekan



bixemilînim. Herdem jî, mezintirîn mamosteyê min di vê derbarê de zimanzan û têkoşerê serxwebûn û azadiya Kurdistanê Osman Sebrî ye.

Min rêzimanê CELADET BEDIRXAN bingeh girtiye û bi dîtînen zimanzanên din temam kiriye. Di gelek cihan de min kêmayî li gor ramana xwe dagirtine. Helbet, ev lêkolîn ne bê kêmayî ye, lê hêviya min ew e ku bigihîje armanca xwe û xwendevanên zimanê kurdî jê sûd bigirin.

Selîm Biçûk

## 1. Ziman, rêziman û hêmanên zimanê kurdî

### 1.1. Ziman çi ye?

Ziman, desteka têgihîştina mirovan e. Bê vê destekê jiyana û pêşveçûna bajarvanî nabe. Ziman bi dengên ku ji dev, lêv, dinan, qirik, ziman û bêvil dertên pêk tê. Herwiha bi van dengên zimanê devîkî ( axaftin, peyîvîn ) çêdibe. Lê jibo zimanê nivîskî her dengê ku tê bihîstinê liser kaxezê, bi nîşanekê tê naskirinê. Ev nîşan jî, bi tîp ( herf ) tê bi navkirinê. Dema ku em dibêjin: Aş, em du dengên dibihîzin, dengê tîpa ( a ) û dengê tîpa ( ş ). Her yek bi nîşanekê tê nivîsandinê: A, ş Jibo zimanê kurdî ( 31 ) sî û yek tîpên latînî hatine danînê. Zimanzanê birûmet CELADET BEDIRXAN sî û yek deng di zimanê kurdî de pejirandine. Bi rastî, ev in dengên bingehîn di kurdî de. Lê hîn ( 6 ) şeş dengên din hene, ew jî ev in: Xw Ç K P R T. Tîpa pevdeng û pênc tîpên cewî, yên ku cihê du dengên nêzî hev digrin kê in. Ji bilî van tîpan sê dengên din ku ji zimanê erebî ne, cihên xwe di nav dengên zimanê kurdî de digrin: A(ع), X(غ), H(ح).

Her tîpek dengdar yan jî, yekgirtina bédengan bi dengdarekê re dengêkê çêdike, mîna:

A Av - ketin ( ke - tin ). Jibo vî dengê kî ( birge ) tê gotinê. Her çend kîte bêjeyekê ( peyvekê ) çêdikin, mîna: Serxwebûn Ser - xwe - bûn.

Rêzkirina çend peyvan jî, hevokê xwedî wate çêdikin mîna: Em serxwebûn û azadiyê dixwazin.

Axaftin jî, bi rêzkirina hevokan pêk tê:

Jibo pelixandina bêrûmetiya sedsalan, jibo jiyaneke bişeref û rêzdar, jibo gihîştina karwanê mirovahiyê, me bi destekê pênûs û bi yê din qilêş hilgirtiye. Berê me li çiyayên Kurdistanê, hêlînen baz û şêran. Me ev rê girtiye. Em bi xwîna sor vedikin û dişopînin, jiber ku: Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştêk nîn e.

## 1.2. Hêmanên zimanê Kurdî

Mîna ku li jor diyar dibe, di zimanê kurdî de ( 4 ) çar hêmanên bingehîn hene ku liser ava dibe û pêk tê:

### 1.2.1. Tîp

### 1.2.2. Kît

### 1.2.3. Peyv

### 1.2.4. Hevok

## 1.3. Rêziman çi ye?

Tevahiya bend û rêzanên rastaxaftin û rastnivîsandina zimanekî bi Rêziman tê bi navkirinê. Rêzimanê kurdî rastaxaftin û rastnivîsandina zimanê kurdî bi bend û rêzanan şirove dike.

### 1.2.1. Tîp û dengên zimanê kurdî

Tîp nîşanên ku liser kaxezê bi nivîsandin dengên zimên didin nasîn. Tevahiya van tîpan abc ya kurdî pêk tînin. Abc ya kurdî ya latînî ji ( 31 ) sî û yek tîpan tê sazîkirinê:

**A a** Tîpa yekemîn e , ji abc ya kurdî. Bi serê xwe dengê dirêj, ji kûraniya qirikê, bi vekirina dev derdixe. Bi lêvîkirina vê tîpê re ba ji nav devê mirov dertê û vekirina dêv hinekî dom dike : Av, al, agir, Alan, Azad, ax, aram, aş ...

**B b** Tîpa duyemîn e, di abc ya kurdî de. Bi anîna her du lêvan ser hev peyde dibe û bi serê xwe tu dangan nade : Bav, baz, berber, baran, Botan, barbar,...

**C c** Bi serê zimên ji hêla jorîn ve peyde dibe, yan ku bi danîna serê zimên ser perçeyê jêrîn ji nav devî. Ev tîp dengê bi çingênî derdixe: Can, cer, ciwan, cercer, co, cobar,...

**Ç ç** Mîna ( c ) bi alîkariya serê zimên peyde dibe û dengê bi çingênî derdixe. Bi du awa tê bikaranînê:

### Awayê nerm:

Çêlek - çîrok - çîn - çivîk - çilmisîn...

**Awayê sert :**

Ço - çol - çîmen - çayê - çal - çayir ...

**D d** Bi alîkariya serê zimên ku li dinan dikeve peyde dibe:

Dad, derd, dem, dê, dûman, dadvan,...

**E e** Dengdareke xweser e. Bi vekirina dev û rakirina lêv û dinan ji ser hev, dengekî kurt yekcar ji banyê qirikê derdixê: Ez, em, ezber, erzan, encam, efsane,...

**Ê ê** Tîpeke dengdar e. Ji banyê qirikê, bi vekirina dev û rakirina lêv û dinanan ji ser hev dengekî dirêj derdixê: Êl, êm, êvar, êzing, êş, êrîş, êrdim, ...

**F f** Ev deng bi alîkariya lêv û dinanan çêdibe. Lêva jêr dikeve navbera dinanên jêr û jor û hinekî tê qerisandinê. Lêva jor jî, hildayî dimîne: Fener, ferman, fêrbûn, Ferfûr, Fanos, ...

**G g** Ev deng liser nîvê zimên ji jor ve çêdibe. Nîvê zimên bi ser şikefta devî ya jor de tê qerisandinê û lêv û dinan vekirî dimînin: Ga, gur, gul, guh, gel, gamêş, ger, gez, ...

**H h** Ev deng ji qirika mirov bi hûkirinê dertê. Herwiha dev, lêv û dinan vekirî dimînin: Hawar, huner, hozan, hêz, herêm, hêvî, hêja, ...

**I î** Ev dengdar bi vekirina dev dengekî kurt û yekcar ji nîvê qirikê derdixê. Di destpêka peyvên kurdî de nayê bikaranînê. Herwiha di dawiya peyvên de jî, ji bilî çend daçekan nayê bikaranînê, mîna: Bi, ji, çî, di, ...  
Kirin, birin, mirin, bilbil, dirinde, Dimdim...

**Î î** Ev dengdara xweser bi vekirina dev, lêv û dinandengekî dirêj ji nîvê qirikê derdixê: În, îşev, îsal, înan, îcar, îsot...

**J j** Ev deng ji pişt dinanan peyde dibe. Mirov binê zimanê xwe bi ser pişt dinanan ve hinekî diqerêse û vî dengê bi xuje xuj derdixê: Jar, jîn, jîyan, jîjo, jêr, jor, jîr, jajî

**K k** Ev deng ji nivê pišta zimên bi alîkariya şikefta dev ya banî peyde dibe.

Ev tîp cihê du dangan digre.

**Awayê nerm:** Ker (nabihîse), kil, kor, kin, ka (pûşê hûr), kadîn, kavi, kar (çêlika bizinê)...

**Awayê sert :** Ker (bar radike), kum, kun, kar (îş), kole, kol, kaxez, ka (bide min),

**L l** Ev deng bi alîkariya serê zimên ji nivê zimên dertê: Lal, lale, lûle, Leyla, Lezgîn, leylan, Lor...

**M m** Ev deng bi girtina dev û dinan û danîna lêvan ser hev ji bêvilê dertê:

Mar, mêt, mal, mê, Memo, Med, meymûn, mom...

**N n** Bi alîkariya serî û nivê pêşzimên bi hildana lêvan ji ser hev ji bêvilê dertê:

Nan, narîn, nalîn, Nermîn, nûner, nişan, Nişmîn...

**O o** Ev xweser dengê dirêj ji nav dev bi vekirina lêv û dinan dertê:

Ol, ode, Oso, ocax, olk, oldar...

**P p** Ev deng bi danîna her du lêvan ser hev dertê û bi du awa tê bikaranînê:

**Awayê nerm:** Pîr (bi emir), pepûk, pîvaz, pêlav, pembû, pîrejîn...

**Awayê sert:** Pere, por, pirç, perçe, pûş, poşman, pîr (rêberê dîn)

**Q q** Ji nivê qirikê dertê: Qaz, quling, qîz, Qamişlo, qirik, qijik, qîrên, qoq,...

**R r** Ji serî û nivê pêşzimên peyde dibe û bi du awa tê bikaranînê:

**Awayê nerm:** Rol, reben, rêwî, rê, rik, rim, rimbaz

**Awayê sert:** Reş, rewş, rabûn, rewşenbîr, req...

**S s** Ev deng ji nav dinan bi fitîkdanê peyde dibe: Sal, sor, sar, sol, sîr, sersal, sosin...

**Ş ş** Ji pişt dinanan û bi alîkariya binê zimên peyde dibe: şor, şûr, şîr, şar, şir, şêr, şoreş, şeş,...

**T t** Bi alîkariya dinanan û serê zimên peyde dibe û bi du awa tê bikaranînê:

**Awayê nerm:** Tîr, tirî, tûr, tîtî, tilûr, tîj...

**Awayê sert:** Tirş, teşî, teşt, tor, ter...

**U u** Ev dengdara xweser bi vekirina lêv û dinan ji nav dev yekcar û kurt derdikeve.

Di pêşiya peyvan de nayê bikaranînê. Di dawiya peyvan de jî, bi awakî sinorkirî tê mîna:

Tu, ku, du,...

Kur, gur, kum, xurde, gumgum, qure

**Û û** Ev dengdara xweser bi vekirina dev, dinan û lêvan ji nav dev dirêj derdikeve û vekirina dev hinek dom dîke: Ûrg, kûr, rû, mû, dû, çûn, bûn...

**V v** Ev deng bi alîkariya lêv û dinan peyde dibe. Lêva jêr em dikin navbera dinanên jêr û jor û hinek diqerêsin: Vedan, volkan, viyan, vîn, veşartin, valabûn...

**W w** Ev deng di nav lêvan de peyde dibe. Bi alîkariya dengdaran tîpên siwar çêdike û ew bi xwe jî, niv dengdar e: Wa, we, wê, wi, wî, ew, -êw.

Bi alîkariya tîpên bêdeng jî, pevdengan çêdike, wek: Xw, kw, gw.

Wan, welat, wêran, windabûn, wî, ew,

Xwarin, xweser, xwê, xwîn, xwinav

Gwêz, gwîtin, kwîr, kwînêr...

**X x** Ev deng ji nivê qirikê dertê: Xanî, xort, xebat, xizim, xunav, xirab, xezal,....

**Y y** Ev deng ji nivê pişta zimên peyde dibe. Nivdengdar e û bi alîkariya dengdaran tîpên siwar çêdike: Ya, ye, yê, yi, yî, ey.

Yar, yek, gulîyên sor, neteweyî, eywan...

**Z z** Tîpa dawî ye ji abc ya kurdî. Dengê wê ji nav dinanan peyde dibe.

Zozan, zevî, zor, zindan, zerzûr, Zerê,

### 1.2.1.1. Abc ya Kurdî

Abc ya kurdî ( 31 ) sî û yek tîp in û li du beşan par ve dibin:

#### Tîpên gir ( girek ):

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

#### Tîpên hûr ( hûrek ):

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

### 1.2.1.2. Tîpên dengdar

Di zimanê kurdî de ( 8 ) heşt tîpên dengdar hene:

A E Ê I Î O U Û

Bi lêvkirina van tîpan mirov devê xwe ji hev vedike. Her tîpek jî, bi serê xwe dengê derdixe.

A a kar şar

E e ker şer

Ê ê kêr şêr

I i kir şir

Î î kîn şîn

O o kor şor

U u kur gur

Û û kûr şûr

Li gor Kurtî û dirêjahiya dengê van tîpan di nav xwe de, li du beşan par dibin:

#### 1.2.1.2.1. Kurtedeng: E I U

**E e** ez, em, ber, şer, berber, ezber, pale

**I i** Dimdim, bilbil, dil, mirin, kirin, min

**U u** tu, gul, guh, kum, kur, Kurd, durust

#### 1.2.1.2.2. Dirêjedeng: A Ê Î O Û

**A** a av, al, ap, Alan, bav, Dara, baran  
**Ê** ê êl, êm, êrîş, dêm, rê, mêt, Bêrîvan  
**Î** î î n, îro, îşev, dîn, jîn, şîn, zîn, sîr, şîr  
**O** o ol, ordek, olk, Oso, Soro, Bozo, sor  
**Û** û ûrg, tûr, şûr, rû, mû, kûr, dûr, hûr

### 1.2.1.3. Tîpên Dengdêr:

Di zimanê kurdî de (23) bîst û sê tîpên dengdêr hene. Ev tîp bi serê xwe tu dengî nadin.

Tîpên dengdêr ev in: B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X Y Z

### 1.2.1.4. Pevdengtîp

Ev tîp ji yekgirtina du tîpên bêdeng û dengdarekê çêdibin:

**xw** xwa, xwe, xwê, xwi, xwî.

**gw** gwê

**kw** kwî

**Xwa:** Xwarin, xwazgîn, xwas, ...

**Xwe:** Xwere, xweser, xwelî, ...

**Xwê:** Xwêdank, xwêşî, ...

**Xw :** Xwinav, xwirde, xwirdekar, ...

**Xwî:** Xwîn, xwînxwar, xwînî, ...

**gwê** gwêz

**gwî** gwîtin

**kwî** kwîr kwînêr

### 1.2.1.5. Siwartîp

Ev tîp bi yekgirtina tîpên ( y, w ) û dengdaran çêdibin:

**Y :** Ya, ye, yê, yi, yî, ey.

**W:** Wa, we, wê, wi, wî, ew, êw, aw.

**Y** yar, yek, Darayê Kurd, mayin, çiyayî, meydan, ...

**W** Wan, welat, wêne, windabûn, wî, xew, dêw, daw

**1.2.1.6. Cêwîtîp**

Ev tîp bi du awa tèn bilêvkirinê û di ziman de cihê du dengan digirin. Cêwîtîp ev in:

Ç K P R T

Her tîpek ji van du dengan derdixe, dengekî nerm û yekî sert

Tîp	Awayê nerm	Awayê sert
Ç	çem çêlek Çîrok	ço çap çep
K	ker kil kezeb	ker kum kol
P	pîr pêlav pîvaz	pîr per pirç
R	rût rûn rêzan	reş rewş razan
T	tûr tîr tirî	têr tor teşî

**1.2.1.7. Rastnivîsandina Tîpan****1.2.1.7.1. Tîpên gir û hûr:**

Di nivîsandina kurdî de, ji van rewşên ku em li jêr rêz bikin û pê ve her gav tîpên hûr tèn nivîsandinê:

**1. Nasnav ( Navên bernas ):**

Ev nav bi tîpa gir dest pê dikin û tevayî jî, tîpên gir bèn nivîsandinê, rast e. Wek:

Azad > AZAD

Xebat > XEBAT

Şêrîn > ŞÊRÎN

Amed > AMED

Qamişlo > QAMIŞLO

WAN > WAN

Botan > BOTAN

Bagok > BAGOK



**2. Hevok (Pevek):**

Herdem bi tîpa gir dest pê dike.

Wek: Şoreşa Kurdistanê xwe gihandiyê koçbera şerê gelî. Di şerê gelî de jî, hemû hêzên civatê dibin eniyên cengê. Îro li Kurdistanê her gund, her bajar li hember dijmin, eniyeke cengê vedike.

**3. Dema mirov bixwaze bêjeyekê yan jî, navekî di hevokê de berçav bike jibo balkêşiyê bi tîpên gir di navbera du kevanên biçûk de dinivîse. Wek: Li welat " ÇAPKIRIN "a pirtûkan qedexe ye. Ji " SERXWEBÛN " û " AZADI " yê bi rûmetir tiştêk nîne.**

**4. Sernivîsên gotar û nivîsaran bi tîpên gir dest pê dikin yan jî, tevahî bi tîpên gir tên nivîsandinê. Wek: Enîşka Rêzimanî > ENÎŞKA RÊZIMANÎ.**

**5. Navên pirtûk, rojname û kovaran bi tîpa gir dest pê dike yan jî, tevayî bi tîpên gir tên nivîsandinê. Rêzimanê Kurdî > RÊZIMANÊ KURDÎ**

Rewşen > REWŞEN      Lêkolîn > LÊKOLÎN

Welat > WELAT      Avaşîn > AVAŞÎN

**6. Textik û tepikên rêklam û bangeşiyê û balkêşan (lafte ) bi tîpên gir dest pê dikin yan jî, tevayî bi tîpên gir in :**

BIJÎ SERXWEBÛN Û AZADIYA KURDISTAN

**1.2.1.7.2. Hatina tîpên dengdar li pey hev**

Di zimanê kurdî de du dengdar di bêjeyekê de yan jî, di bêje û paşgînekê de li pey hev nayên, di vê rewşê de tîpên :

( Y, W, H ) dengdaran ji hev dûr dikin. Mîna:

Gî - an                  Giyan.

Du - emîn              Duwemîn.

Dirêja - î              Dirêjahî

Tîpa ( w ) dema bi vê delametê radibe bi tenê li pey van dengdaran ( o, u, û ) tê, jibo ku lêvkirina bêjeyê neyê guhertinê. Mîna:

Ez di rêza duwemîn de bûm.

Duwerkî tarî ji agirê petrolê dertê.

Min serşoweke fireh ava kir.

Tîpa (H) di şûna tîpa (Y) de tê bikaranînê , di bêjeyên mîna:

Dirêj      dirêjayî      dirêjahî

Teng      tengayî      tengahî

Reş      reşayî      reşahî

Ji hêla din ve gelek bêjeyên kurdî yên ku bi tîpa ( h ) dest pê dikin, bi demê re ev tîp ketiye û bi dengdarekê dest pê dikin, mîna :

Êrîş      hêrîş

Awa      hawa

Ûrde      hûrde

Êl      hêl

Evîn      hevîn

Elb      helb

Avêtin      havêtin

Dema ev bêje dibin barbarê vê rêzanê vedigerin ser reseniya ( eslê ) xwe. Mîna:

Bi êrişên tund gerîla dijmin dipelixîne.

Bi hêrişên tund gerîla dijmin dipelixîne.

Bi awakî sert ez rabûm.

Bi hawakî sert ez rabûm.

Pêavêtin      Pêhavêtin

Tîpa ( Y ), di hemû rewşên din de, bi delameta jihevdukirina dengdaran radibe. Mîna:

Gundiyeke got : " Çiya em in , me bombe bikin ".

Bêjeyên ku bi dengdaran dest pê dikin, dema li dû daçekan tên, ev daçek dikarin

dengdarên xwe bavêjin. Mîna :

Ajotin      bi ajo      bajo

Anîn      bi îne      bîne

Axaftin      bi axife      baxife

Di nivîsandina kurdî de zêder ( a, ê, ên ) mîna paşgînan tên pejirandinê, dema dawiya

bêjeyê dengdar be, tîpa " y " dikeve pêşîya zêderê . Mîna: Çiyayê Cûdî pîroz e .

### 1.2.1.7.3. Yekgirtina Tîpan

Di kurdî de du tîpên mîna hev di bêjeyekê de, li dû hev nayên. Di vê rewşê de yek jê dikeve. Mîna:

Xurt - tir	xurttir	xurtir
Paş - şîv	paşşîv	paşîv
Deng - gir	denggir	dengir
Derd - dar	derddar	derdar

Di zimanê kurdî de çend tîpên ne ji hev digihîjin hev û dengê nû çêdikin yan jî, cih didin tîpeke nû. Ji yekgirtina tîpên ( xw ) û ( gw ) bi dengdaran re pevdeng çêdibin : Xwa, xwe, xwê, xwi, xwî.

Gwê, gwî, Kwî, kwê.

#### 1.2.1.7.4. Cîguhertina tîpan

Di zimanê kurdî de gelek dengên nêzî hev hene. Di peyvajowê de gelek caran li gor devok û zaravên kurdî cihê xwe bi hev guhertine. Mîna :

( v ) û ( f )	Hevt	heft
	Sekevtin	serkeftin
	Hevsar	hefsar
	Hêrivandin	hêrifandin
( v ) û ( b )	Av	ab
	Bav	bab
	Lêv	lêb
	Gulav	gulab
( z ) û ( s )	Leyiztin	leyistin
	Paraztin	parastin
	Bihîztin	bihîstin
( j ) û ( z )	Jîrek	zîrek
	Jeng	zeng
	Jehir	zehir
( v ) û ( w )	Serkevtin	serkewtin
	Av	aw
( b ) û ( w )	Xirab	xiraw

**1.2.1.7.5. Bihevguhertina dengdaran**

Tîpên (eh) dema di yek bêjeyê de, li dû hev bîn, ev herdû tîp dikevin û cihê xwe didin tîpa (a).

Çehv	Çav
Xwehr	Xwar
şehr	şar
Kehr	Kar
Behr	Bar
Mehr	Mar
Çehr	Çar

Tîpên (ih) dibin (î)

Cih	Cî
Sih	Sî
Mih	Mî
Bih	Bî
Rih	Rî
Tirih	Tirî

Tîpên (uh) dibin (o) yan jî (û)

Cuh	Co
Duh	Do
Buhtan	Botan
Duhtmam	Dotmam
Cuhtkirin	Cotkirin
Cuhtin	Cûtin
Nuh	Nû

Di van rewşan de kurtedeng cihê xwe dide dirêjedengê.

Dema di bêjeyekê de dirêjedengên (î, û) dikevin pêşiya dengdareke din û bi tîpên (y, w) ji hev tîn vekitandinê, ev dirêjedeng cihê xwe didin kurtedengên ji babeta xwe, anku (î) dibe (i) û (û) dibe (u). Wek:

Çiyayîyê mêrxas      Çiyayiyê mêrxas

Gundîyek                      Gundiyek

Dûwek                         Duwek

Mûwek                        Muwek

Bûwer                         Buwer

Bêjeyên mîna (dê, rê ...) dibin:

Diya                            Riya

Diya min                      Riya min

Di navên nêr de , dema tîpa (a) hebe, bi tewandinê dibe (ê).

şervan                         şervên

Ga                              Gê

Nan                             Nên

Gavan                         Gavên

Derman                        Dermên

Alan                            Alên

Dîwar                         Dîvêr

Lêkerên pirkîte, dema dengê dawî ne ( i ) be ,di fermaniyê de tê zîvirandin û dibe ( i ).

Axaftin    axaf            axif            diaxife    baxife

Cemedîn    cemed            cemid            dicemide    bicemide

Li gor hin devokan ev tîp dibe ( ê ) .

Baxêfe            Balêse ( Alastim )

Lêkerên derhingêv yên ku bi ( andin ) dawî dibin di fermaniyê de ( a ) dibe ( î ) .

kelandin            dikelînim            bikelîne

Gerandin            digerînim            bigerîne

Kenandin            dikenînim            bikenîne

Revandin            direvînim            birevîne

### 1.2.2 Kît

Kît di bêjeyê de parçeyê biçûktirîn e ku nema tê parçekirinê, ev jî, bi tîpên dengdar pêk tê.

Xebat: Bêjeyeke dudeng e ( xe - bat ). ( Xe ), dengê yekemîn e. ( Bat ) jî,  
dengê dûwemîn e. Her dengek ji van nema tê parçekirinê. Em nikarin (xe), wiha parçe bikin: x  
- e.

Herwiha ( bat ) jî, nayê parçekirinê.

Ba: Bêjeyeke yekdeng e, nayê parçekirinê. Di bêjeyê de çend tîpên dengdar hebin, hewqas  
deng hene, liser vî bingehî bêjeyên kurdî li gor hejmara tîpên dengdar bi vî awayî tên parkirinê:

### 1.2.2.1. Bêjeyên Yekdeng

Di van bêjeyan de tîpeke dengdar heye. Mînak:

Dê , bav, bar, av, xak, ap, şar, dar, ji, bi, li, yek, kir, bir, mir, çû, bû, deng, bang,...

### 1.2.2.2. Bêjeyên Dudeng

Hacer Ha - cer

Baran Ba - ran

Karwan Kar - wan

Hêvî Hê - vî

Di van bêjeyan de du tîpên dengdar hene û bi du dengan tên parçekirinê.

### 1.2.2.3. Bêjeyên Sêdeng

Serkevtin ser - kev - tin

Hilpişkîn hil - piş - kîn

şoreşger şo - reş - ger

Berxwedan ber - xwe - dan

### 1.2.2.4. Bêjeyên Çardeng

Serîhildan se - rî - hil - dan

Bajarvanî ba - jar - va - nî

Welatparêz we - lat - pa - rêz

Koçbarkirin koç - bar - ki - rin

Di van bêjeyan de çar tîpên dengdar hene û bi çar dengan parçe dibin.

Herwiha bi vî awayî bêjeyên pênc deng jî, tên parçekirinê.

### 1.2.3. Peyv

#### a. Di zimanê kurdî de peyv çî ye?

Di Nîsana 1990 î de , li derdorên Bêytûlşebabê, lehengê nemir Sebrî ( Cemîl ) gihîşt karwanê şehîdên nemir. Rêhevalê Sebrî mîna hemû şehîdên me, navê xwe bi tîpên ji agir di singa dîroka Kurdistanê de neqîşand..."

Ji rêzên jor diyar e ku hevok ji çend bêjeyên xwedî wate saz dibe. Bi hevketina van bêjeyan hevok wateya xwe distîne, lê dema em bêjeyekê ji hevokê berçav bikin, mîna Sebrî. Bêjeya Sebrî ji çend tîpan saz bûye: S E B R Î di nav van tîpan de du tîp dengdar in ( e, î ) jibo vê jî, lêvkirina vê bêjeyê parçe dikin : Seb - rî. Em dibêjin ev bêje du deng e. Ji hêla din ve bêje xwedî wate ye. Gava em navê Sebrî dibihîsin em dizanin ku kesekî şoreşger pê tê binavkirinê û ev kes şehîd ketiye. Herwiha hemû bêjeyên ku di rêzên jorîn de hatibûn mîna : Bêytûlşebab, Nîsan, 1990 î ,li, bi, ji, leheng, şehîd, hemû, gihîşt , ....

Her bêjeyek ji van ji çend tîpan saz dibe, çend dengan dide û wateyekê nîşan dike. Li gor vê em dikarin peyvê (bêjeyê) bi vî awayî bidin nasandin:

Peyv ji çend tîpan saz dibe, çend dengan derdixe û wateyekê berçav dike.

#### b. Peyvên hevdeng

Lêvkin û nivîsandina van bêjeyan yek e, lê wateya wan ji hev cuda ne.

şîn	şîn	şîn		
Ber	Ber	Ber	Bîr	Bîr
Pir	Pir			
şor	şor			
Cot	Cot			

#### c. Peyvên hevwater

Wateya van bêjeyan yek e, lê lêvkin û nivîsandina wan ji hev cuda ne.

Bêje	Peyv	şor	Xeber	Qise	Axif
Pir	Gelek	Zehf			
Gerdûn	Dinya	Cihan			
Rûmet	şeref				

şerm Fihêt

Zû Bilez

#### ç. Peyvên dijhev

Ev bêje bi wateya xwe dijî hev in .

Reş Sipî

şer Aşitî

Sar Germ

Sivik Giran

Birûmet Bêrûmet

Mezin Biçûk

Nezan Zana

#### parçeyên axaftinê di kurdî de (koma peyvan) :

Koma hemû peyvên ku di axaftin û nivîsandina kurdî de peyda dibin parçeyên axaftina kurdî ne. Ev jî, neh beşên bingehîn in, di zimanê kurdî de. Emê van parçeyan li jêr rêz bikin û bi firehî liser rawestin.

##### 1.2.3.1 Nav

##### 1.2.3.2 Cînav

##### 1.2.3.3 Rengdêr

##### 1.2.3.4 Hejmar

##### 1.2.3.5 Lêker

##### 1.2.3.6 Hoker

##### 1.2.3.7 Daçek

##### 1.2.3.8 Gehandek

##### 1.2.3.9 Bang

##### 1.2.3.1 N a v

Kêliyek ji Bihara Gundê min



Serê sibê ye. Rojê şaxên xwe yên zêrîn diavêtin mêrg û palên çiyê. Ox ... Xweş ! Ev çi awaza bêmirin e, tê guhên min; Marêna bizin û karikan, borîna çêlek û dewaran, barbara berx û mihan, çîwçîwa çivîk û şalûlan.

Dengê bilûrek bi awazeke girînî û xemgîn mîna pêlên bayê guhên min hênik dike. Haho! Strana " lo lo lawiko " bi dengê stûr û giran pêl dide. Di nav re qebqeba kewekî ji kontara çiyê bilind dibe. Şêrîn bang dike Narînê. Gulê bang dike Perwînê. Ewt ewta segên gund , qid qidq mirîşkan. wey bavo! Dengê zeriyeke delal ji riya kehniyê tê, bi strana

" Her hebin pêşmergên me " xwe mijûl dike. Wey hesteyên min, ez çi bihîdzim, ez çi berdim?! Bi hev re ox yeh! Sinfonîyeke xweristî bêmirin e. Dengê Zeriye, wey xweziya min bi we Pêşmergeno! Bilûra şivên ?! Na, dengê kewan?! Na, na ... wey lo dilo! Ev çi ye?! Ev çi bûye?! ...

Dema em ji nivîsa jorîn van bêjeyan berçav dikin: Bihar, gund, roj, mêrg, çiya , awaz, guh, kehrik, berx, şivan, şêrîn, Gûlê, kew, hest ...

Em dibînin ku her bêjeyek ji van kesekî , cihekî yan jî, tiştêkî dide nasînê. Ev kes, cih û tişt bi vê bêjeyê tê binavkirinê. Di zimanê kurdî de nav ji van bêjeyan re tê gotinê. Herwiha nav bi vî awahî tê nasdan:

Nav parçeyek e ji axaftina kurdî ( yek ji bêjeyên zimanê kurdî ye). Tiştêk , kesek, lawirek yan jî, cihek bi vê bêjeyê tê naskirinê.

### 1.2.3.1.1 Beşên Navan

Di zimanê kurdî de du beşên navan hene:

Navên ku mirov bi her pênc hesteyên ( hisên ) xwe dikare nas bike, an ku hebûneke wan berçav hebe, ji van navan re şênber (madî) tê gotinê. Mîna: Av , nan, çiya, ba, çêlek, berx, çivîk, bilûr ...

Navên ku mirov nikare bi her pênc hesteyên xwe nas bike, yan ku hebûneke wan ya berçav tune, lê mirov di raman û mêjiyê xwe de wan nas dike. Razber (manewî) ji van navan re tê gotinê. Mîna: Giyan ( rih ), jîrî, hiş, sewda, bext, raman....

#### A. Navên şênber

Navên şênber yên xwedî giyan:

Jin	Narîn, şêrîn, Gulê, Perwîn, Zînê,
Mêr	Azad, Hogir, Xebat, Hawar, Reşo,
Mirovên nêr	Mêr, xort, bav, bira, xal, ap,

Mirovên mê	Jin, keç, bûk, xwîşk, dotmam, ...
Lawirên nêr	Beran, nêrî, ga, beraz, dîk, hesp...
Lawirên mê	Bizin, çêlek, mih, mehû, mirîşk,

Navên şênber yên bêgiyan

Mêza	Av, baran, berf, beroş, ode, cam ...
Nêrza	Kon, nan, kevir, agir, êzing,

### B. Navên Razber

Ev nav tişteki bêrih û can, bêleş û giyan bi nav dikin. Tişteki ne berçav e, lê mirov di ramana xwe de nas dike. Mînak: Hêvî, tirs, mêranî, raman, saw, merdî, cangorî.....

Navên razber sê beş in:

#### 1. Navên Ramanî

#### 2. Navên ku bi paşgînên " atî, tî û î " tên sazkinê.

#### 3. Navên raderî

##### 1. Navên ramanî

Nêrza Sewda, rih, derd, hiş,...

Mêza Hêz, hêvî, tirs, saw,...

##### 2. Navên jêbirînî

atî Reşatî, serokatî, koratî, mirovatî,....

tî Hevaltî, biratî, zavatî, feqîrtî,..

î Erzanî, xweşî, hogirî, giranî, rebenî,...

##### 3. Navên raderî

Ev nav raderên lêkeran bi xwe ne.

n çûn, man, bûn, dan,..

in birin, kirin, hatin, firotin,..

în anîn, kirîn, nalîn, revîn, firîn,...

andin kelandin, tirsandin, kenandin,

Bi du awayên din nav di zimanê kurdî de par dibin. Nasnav û gelempernav:

### a. Nasnav

Ev nav mirovekî yan tiştêkî bi tenê binav dikin û ew tişt yan ew kes bi wî navî xuya ye. Nasnav, navên tiştan, jinan, mêran û welatan in. Mînak:

Kurdistan, Afrîn, Koban, Hêzil, Ferad, Bagok, Botan, Qamişlo, şêrîn, Zêrîn, Azad, Reşo, Dîcle,..

Nasnav herdem bi tîpa gir dest pê dikin û dibe ku bi tevayî jî, gir bên nivîsandinê.

Di kurdî de nasnav ev in:

#### 1. Navên kesan( Rastnav )

Ev navên mirovan in. Mînak:

Hacer, Bêrîvan, Egîd, Simko, Rewşen, Sêvê, Temo, Cesûr, Azad, Raperîn, Rêwîn,...

Ev nav ji sê navan pêk tên:

1. **Navê pêşî** Azad ( navê kesekî ye )

2. **Navê bav** şivan ( şivan bavê Azad e )

3. **Navê malbatî** Temo ( şivan ji mala Temo ye )

Azadê şivanê Temo yan jî, Azadê kurê şivanê Temo.

#### 2. Navên malbatî

Bedirxanî, Osmanî, Pehlewî, şikakî,...

#### 3. Navên nijadî

Kurd, Faris, Ereb, Tirk, Ermen,...

#### 4. Navên erdnîgarî

Navê welatan Kurdistan, Misir, Filestîn, Çîn,

Navê bajaran Amed, şirnex, Qamoşlo,

Navê çiyaran Bagok, Gebar, Cûdî, Agirî,

Navê çeman Hêzil, Ferad, Dîcla, Xabûr,

Navên cih û deran Botan, Xerzan, Hesinan,

Herwiha navên gundan jî, ji nasnavan tên hejmartinê.

**b. Navên Celeb**

Ev nav her tiştên ji beşekî, babetekê yan jî, celebekî binav dikin. Mîna:

Çiya, Bajar, welat, mih, bizin, beran, ga, mirov,

Navên celeb bi du beşan tên parkirinê:

**1. Navên Beş**

Ev nav bi kêrî navkirina tiştên ji celebekî yan beşekî tên. Mînak:

Mih, balinde, çiya, mirov, lawir, candar,...

**2. Navên kombêj**

Ev nav bi kêrî navkirina parçeyekî yan jî, komekê ji navekî beş tên. Mîna:

Lek, kerî, ref, selef,...

Kerîyek pez.

Refek balefir.

Selefek siwar.

Navên Celeb bi awayekî din bi sê beşan tên parkirinê:

**A. Navên Cih ( lûs )****B. Navên Alav ( amraz )****C. Navên dumil****A. Navên Cih**

Ev nav derekê, ciyekî yan jî, warekî bi nav dikin. Mînak:

Xanî , meydan, dibistan, forotgeh, nexweşgeh, mûristan, çayxane,...

Navên cih du beş in:

**1. Xweber**

Navên cihîn xweber bi xwe cihekî yan jî, derekê bi nav dikin. Mînak:

Keleh, bazar, bender, xanî, şikeft,...

**2. Sazber**

Navên cihîn sazber ji nav û bêjeyên din bi yekgirtina paşgînan tên çêkirinê. Paşgînan ku navên cihîn saz dikin ev in: Istan, geh, zar, xane, lîn, dîn,...

**Istan** Kurdistan, Hindistan, Erebestan, gulistan, goristan, mûristan, karistan, daristan,...

**Geh** Dengêh, lîzgeh, çêregeh, bargeh, Zanîngeh, kargeh, tomargeh, nexweşgeh,...

**Zar** Çîmenzar, gulzar,...

**Xane** Mêvanxane, nexweşxane, dermanxane,

**Lîn** Kulîn, hêlîn, xwêlîn, biriqlîn,...

**Dîn** Kadîn,...

## B. Navên Alav

Ev nav bi kêrî navkirina alavekî (amraz, destek) tên. Mînak:

şûr, kêr, birek, badek, xame,...

Ev jî, du beş in:

### 1. Alavên Xweber

Navên ku ji xweber alav in, wek:

Qelem, kevçî, bîvir, tevşo,...

### 2. Alavên Sazber

Ji bêjeyên din bi alîkariya paşgînan çêdibin. Paşgînên ku navên alav saz dikin ev in:

Ek, dan, cîv, ing, ar,..

**Ek** Birek, badek, pêçek,

**Dan** Çaydan, xwêdan, xwelîdan, kildan, kevçîdan

**Çîv** Kilçîv

**Ing** Bêjing, hevring,

**Ar** Xîzar

Gelek nav bi (ing) dawî dibin, lê ne alav in. Wek: Ziving, rojing,...

## C. Navên Dumil

Navên dumil bi du awan çêdibin:

### 1. Hevbend

Ev nav bi çar awan çêdibin:

- **Nav û rengdêr**    Girsor, rûreş, dilpak,
- **Du nav**            Marmasî, sîrdim, biramak,
- **Nav û hoker**        Berçavk, bermalî, navmalî,
- **Nav û lêker**        Gerav, bager, dermansaz..

## 2. Navên xurdeza:

Ev nav bi alîkariya paşgînan çêdibin. Mîna:

- Gûn**            Argûn, pargûn
- N**              Xewn, tevn

### 1.2.3.1.2. Zayend

Di zimanê kurdî de du zayend hene: Nêr û mê. Ev zayend bi du beşan par dibin:

#### Rasteza

Navên ku bi rastî nêr in yan jî, mê ne. Mînak:

- Navên bi rastî nêr    : Xort, mêr, ga, beran,
- Navên bi rastî mê    : Keç, jin, çêlek, mih, bizin,..

#### Gumanza

Navên ne nêr û ne mê ne. Lê di ziman de mîna rastezayan hin nêr û hin mê tên bikaranînê. Dema em bixwazin navekî ji van nas bikin ku nêr yan mê ye, emê hevokekê bi vî navî saz bikin. Gava paşgîna " ê " bistîne, ev nav nêr e, lê gava " a " bistîne mê ye. Mînak:

Dil    : Dilê germ.

Çiya    : Çiyayê Cûdî.

Çem    : Çemê Dicle pêlan dide xwe.

Navên: Dil, çiya, û çem ne nêr û ne mê ne, lê di ziman de mîna navên nêr tên bikaranînê, jiber ku di hevbendiyê de " ê " distînin.

Av    : Ava kaniya me zelal e.

Şoreş    : Şoreşa Kurdistanê pêş de diçe.

Gul : Gula sor.

Navên Av, şoreş û gul ne nêr û ne jî, mê ne , lê di ziman de mîna navên mê tên bikaranînê û paşgîna " a " di hevbendiyê de distînin.

### **Navên Nêrza**

Navên nêrza du beş in:

#### **Rastezayên nêr**

Ev nav bi rastî zayend nêr in. Nêrza jî, di Kurmancî de ev in:

Navên mirovên nêr : Mêr, law, kur, zilam, zava,

Navên mêran : Azad, Zerdeşt, Hogir,

Navên lawirên nêr : Beran, nêrî, ga, dîk, beraz,

#### **Gumanzayên nêr**

Ev nav bê zayend in, ne nêr û ne mê ne. Lê di ziman de mîna navên nêr tên bikaranînê. Mînak:

Xanî, guh, çiya, çem, nan, dil, serî, kevir, dest, kon, gopal,..

Navên nêr paşgîna " ê " di forma hevbendî de distînin. Mînak:

Xortê şoreşger.

Lawê Medya.

Reşoyê şehîd

Hogirê leheng.

Beranê tov.

Gayê cot.

Nanê sêlê.

Çemê Ferat.

### **Navên mêza**

Navên mêza du beş in:

#### **Rastzayên mê û gumanzayên mê.**

Rastezayên mê bi rastî zayend mê ne. Rastezayên mê jî, ev in:

Navên kesên mê : Jin, keç, bûk, dê, xûşk, met,

Navên jinan : şêrîn, Narîn, Dîcla, Gulê,

Navên lawirên mê : Mih, bizin, çêlek, mirîşk, dêl,...

### **Gumanzayên mê**

Ev nav bi rastî ne nêr û ne mê ne, lê di ziman de mîna navên mê tên bikaranînê û paşgîna " a " distînin. Mînak:

Teşt, çal, dar, rê, pênivîs, berf, av, şoreş, tirs, hêvî, birin, kel,...

Ji gumanzayên mê re rêzanek heye. Ew jî ev e:

Ev beşên navên razberî herdem mê ne:

### **Navên jêbirînî**

Navên ku bi " atî, tî û î " dawî dibin. Ev nav herdem mê ne û paşgîna " a " distînin. Mînak:

Serokatî, koratî, mirovatî, reşatî, hevaltî, biratî, bijartî, zavâtî, erzanî, xweşî, hogirî, giranî,...

### **Navên raderî**

Navên raderî raderên lêkeran in û herdem mê ne. Mînak:

Kirin, çûn, hatin, man, hebûn, firîn, firotin, ketin, lerizandin, damezirandin, firandin, kelandin,...

Navên zayend mê di hevbendiyê de herdem paşgîna " a " distînin. Mînak:

Çala avê. Berfa sipî.

Keça şervan. Jina azad.

Bizina kej. Miha qer.

şêrîna jîr. Hacera şehîd.

Hevaltiya gelan. Serokatiya hemdemî.

Xweşiya çîyan. Hebûna ziman.

Çûna şoreşê. Hilkişandina çîyan.

### **Navên duzayend ( Nêremê )**

Navên du zayend li gor kesê ku mirov liser daxive carna nêr û carna mê ne, yan ku jibo nêr û jibo mê jî, tên bikaranînê. Mîna navên : Heval, yar, dijmin, dost, karker, mamoste, şervan, hogir, şoreşger, ...

Ev nav û yên mîna wan dema bi navekî nêr re hevbend dibin " ê " distînin û dema bi yekî mê re be paşgîna " a " distînin. Mînak:

Hevalê dilsoz ( dema heval nêr be - xort, mêt )

Hevala dilsoz ( dema heval jin be )



Herwiha em dibêjin:

Yarê delal	Yara delal
Dostê çeleng	Dosta dilsoz
Mamosteyê dibistanê	Mamosteya dibistanê
Şervanê azadiyê	Şervana azadiyê
Karkerê jîr	Karkera jîr
Şoreşgerê kurd	Şoreşgera kurd
Dijminê hov	Dijmina hov
Evîndarê welat	Evîndara welat
Xebatkarê hêja	Xebatkara hêja
Têkoşerê gernas	Têkoşera gernas
Hogirê min	Hogira min

### Navên nêr

- 1- Navên mirovên nêr Bav, ap, xal, zava,
- 2- Navên candarên nêr Ga, beran, dîk, ...
- 3- Navdêrên hejmarî Du, sê, çar, pênc, deh, sed, hezar,... lê yek mê ye.
- 4- Navên rengan Sor, zer, kesk (heşîn ), qehweyî, agirî...
- 5- Navên gewher û madenan Hesin, zêr, zîv, derî vê rêzê hilberînên petrol û komirê mê ne: Mazot, benzîn, komir, ..
- 6- Berhemên candaran Goşt, penîr, mast, nîvişk, şîr, lê derî vê rêzê: hêk, hirî û liva mê ne.
- 7- Mêweyên ( fêkî ) hişk Hejîr, mewîj, ...
- 8- Darên hişk Dar, tîrek, ço, ..
- 9- Hemû avên herik Çem, cobar, ...  
derî vê rêzê co û sûlav mê ne.
- 10- Qût û dexil û hemû celeb navên wan : Qut, dexil, genim, ceh,
- 11- Endamên laşê mirov yên der ve hemû nêr in Serî, çav, guh, dest, çerm, zik, ...

### Navên mê

- 1- Mirovên mê û navên wan Dê, xwîşk, met, bûk, şêrîn, Lîlav, şermîn, Nermîn, Çîmen, Sûlav, Laliş,...
- 2- Hemû candarên mê Mî, bizin, çêlek, mirîşk, mehîn, dêlik,...
- 3- Avên aram ( sekinî ) derya, gol, bîr, çal, Derî vê rêzê delav nêr e .

- 4-Navên erdnîgarî yên bajar, gund, çiya, deşt û welatan: Amed, Xanik, Bagok, Heran, Kurdistan,...derî vê rêzê navên çeman nêr in.
- 5- Êwirgeh şikeft,... derî vê rêzê kon, xanî, axwir û stewl nêr in.
- 6- Navgînên siwariyê Otomobîl, taksî, tirên, firok, keştî....
- 7- Tiştên ji asîmanan tên jêr û heyînên asîmanî: Baran, berf, stêr, roj, heyv, derî vê rêzê ba û ewir û asîman nêr in.
- 8- Nexweşî, êş û navên nexweşiyên
- 9- Xwarinên pijandî û tiştên xwaringehê, lê nan, goşt, kefçî û çetel nêr in.
- 10- Navên mûzîk û nivîsandinê.
- 11- Navên sîleh û çekan, lê çekên sipî: şûr, gurz, doqik, bîvir, şeşperî ,... nêr in.
- 12- Navên ku bi " î " , " ahî " , " tî " û "atî" dawî dibin:Erzanî, meznahî, hevaltî, biratî...
- 13- Navên tîpên abc
- 14- Darên heşîn ( ter )
- 15- Navên gulan
- 16-Navên pirtûk û pergalek nivîsandinê: pel, kaxiz, pênuş,...
- 17- Pût û celebên giyayên ku dibin pût jibo candaran, lê ceh nêr e
- 18- Hemû navên raderî ( raderên lêkeran ) : çûn, hatin, birin ,...
- 19- Endamên laşê mirov yên hundir tev mê ne : ceger, rovî, kezeb, ...lê dil nêr e.
- 20- Navên sal, hefte, rojên hefteyê, meh û demsalan hêmu mê ne.

### 1.2.3.1.3. Zêder

#### Çiya

Çiya yek ji pîrozayiyên gelê Kurdistanê ne. Îro, mîna hemû koçberên dîrokî, çiyayên Kurdistanê bûne bargehên gerîlayên me yên leheng ku şerê Serxwebûn û Azadiyê bi rê ve dibin. Herwiha bav û bapîrên me jî, di demên zor û astengiyan de, xwe dikişandin çiyayên û serî didan berxwedanê, jibo parastina ziman, çand, dîrok, tore, hebûn û hemû biha û taybetiyên xwe yên netewî.

Îro, şoreşa Kurdistanê dîsa dide xuyakirinê ku çiyayên me ne tenê parastgehên pîroz in, lê belê kelehên berxwedanê ne jî, jibo pêkanîna êrîşên serkeftinê, berbi avakirina Kurdistaneke serbixwe û azad ve ...

Koçberên dîrokî.

Gerîlayên me.

şerê serxwebûn û azadî yê pîroz.

şoreşa Kurdistanê ya nûjen.

Dema em van hevokan berçav dikin, em dibînin ku:

Hevoka yekemîn ji du navan saz dibe:

Koçber û dîrok, lê bêjeya "ên" girêdanek di navbera wan de çêkiriye û dide famkirinê ku gelek koçber bi vî rengî derbas bûne. Herwiha hevoka duwemîn jî, bi bêjeya "ên" girêdanek di navbera nav û cînavêkî de çêdike (Gerîla û me). Bêjeya "ên" dîsa wan bi hev girê dide û dide nasîn ku gelek gerîla ne, lê vê carê jiber ku gerîla bi tîpeke dengdar dawî dibe pêşiya "ên" tîpa "y" girtiye. Em dizanin ku koçber mêza ye, jiber ku em dibêjin: koçbera hovîtiyê.

Bêjeya gerîla dibe nêr û mê, em dibêjin: "Gerîlaya me" yan jî: "Gerîlayê me".

Di encamê de tê nasînê ku bêjeya "ên" jibo koma (pirhejmar) herdu zayendan tê bikaranînê, jibo koma nêr û mê çêdibe. Mîna: Keçên kurd û xortên kurd.

Hevoka sêyemîn jî, ji du parçeyan pêk hatiye: şer û serxwebûn, şerê serxwebûn û azadî û pîroz di herdu parçeyan de "ê" girêdanekê çêdike, anku dibe amraza hevbendiyê (xistine pal) û dide zanîn ku bêjeya şer yekhejmar e û zayend nêr e. Tê nasîn ku "ê" jibo nêrzayê yekhejmar tê bikaranînê.

Hevoka çaremîn, dîsa ji du parçeyan e: şoreş û Kurdîstan. Şoreşa Kurdistanê û nûjen, di her du caran de bêjeya "a" hevbendiyê di navbera van bêjeyan de dike û dide nasîn ku şoreş bêjeke mê û yekhejmar e. Tê nasînê ku bêjeya "a" jibo mêzaya yekhejmar tê bikaranînê.

Ev bêjeyên li jor hatine hejmartinê: a, ê, û ên. Zêder ji wan re tê gotinê. Di encamê de em dibêjin: Zêder bêjeke biçûk e, du navan, navekî û rengdêrekî yan jî, navekî û cînavêkî bi hev dide girêdanê, an ku hevbendiyê di nav wan de çêdike û hejmar û zayenda van nav û rengdêran diyar dike. Hevok herdem bi zêderê tê tewandinê.

### A. Zêdera pendî

Zêdera pendî navekî yan rengdêrekî bi tenê, ku em baş nas dikin berçav dike û zayend û hejmara wan dide nasîn. Dema em dibêjin: "Dîroka Kurdistanê" em liser dîrokeke nas daxivin ku ew dîroka gelê Kurdistanê ye. Zêdera "a" hevbendiyê di navbera (dîrok û Kurdistanê) de çêdike. Ev dîrok pal dide ser Kurdistanê, an ku Kurdistan palgeh û dîrok palvedêr e, "a" jî, amraza jibo vê (bendek) jê re tê gotinê, ji hêla din ve "a" dide nasîn ku dîrok yekhejmar û mêza ye.

Zêdera pendî ev e:

1. Jibo yekhejmara mêza " a " ye. Mînak:

Gula sor: Em dizanin liser kîjan gulê daxivin, an ku ev gul ji hêla me ve tê naskirinê. Peyva "a" jî, hevbendiyê dike navbera navekî (gul) û rengdêrekî (sor) û dide zanîn ku guleke bi tenê û mêza ye. Herwiha em dibêjin:

Keça kurd.

Pênivîsa min.

Xweşiya çiyar.

Biratiya kurdan.

Serhildana gel.

şervana ARGK.

2. Jibo yekhejmara nêrza " ê " ye. Mînak:

Çiyayê Cûdî.

Dilê min.

Agirê Newrozê.

şervanê ARGK.

Çemê Dîclê.

3. Jibo koma herdu zayendan ( nêr û mê ) "ên" tê bikaranînê. Mînak:

Gulên sor.

Dilên pak.

Çiyayên Kurdistanê.

Golên xwînê.

Gorên şehîdan.

Gayên cot.

Çowên bêbext.

Dema dawiya bêjeya pêşî tîpeke dengdar be ( y,w ) pêşiya zêderê digre. Mînak:

Sorowê cotkar. ( Soroyê cotkar )

Birayên delal.

Ronahiya zanistiyê.

Xameya min.

Mirovahiya hemdem.

Bêjeyên mîna : dê, rê û mî dibin : di, ri, mi.

Diya min.

Riya min.

Miya qer ( miha qer ).

Zêder nav û cinavekî bi hev girê dide û xwedîtiyê ber çav dike:

Gula min, çiyayê me, bavê min, diya min,...

Yan nav û rengdêrekî bi hev girê dide:

Gula sor , çiyayê bilind , zozanên xweş ,

bihara geş,...

Yan jî, du navan bi hev re girê dide:

Simkoyê şikakî , çiyayên Kurdistanê ,

### **B. Zêdra nependî (nediyar)**

Di zêdera pendî de me got: Gula sor, jiber ku me guleke bi tenê berçav dikir û me nas dikir kîjan gul e, lê dema em gulê bi sinor nekin û neyê naskirinê, em liser kîjan gulê daxivin , em dibêjin: Gulek sor. Ev bêjeya biçûk ku hevbendiyêke bi vî awayî çêdike: Zêdera nependî jê re tê gotinê.

Zêdera nependî ev e: ek, eke, ekê, ekî, ine, na, in.

Yekhejmar

Ek û ekî jibo nêr. Ek, ekê û eke jibo mê.

Xortekî gul çinî.

Marekî bi şêrîn veda.

Azadekî serî hilda.

Xortek tivingê hildigre.

şoreşgerek dijmin ditirsîne.

Gayek kayê dixwe.

Keçekê mar kuşt.

Bizinekê şîr rijand.

Malekê xwarin da.

Keçek nan dixwe.

Gulek avê vedixwe.

şêrînek teşiyê dirêse.

Min keçeke bedew dît.

şoreşgereke hêja hat gund.

Kom

Di komê de nav " ina, in " distîne.

Xortin sêvan dixwin.

Keçin pembû diçînin.

Lawina dar birîn.

Keçina kizwan çinîn.

Xortin hatin.

Keçin çûn.

Gulin çilmisîn.

Zarokin dibezin.

Salo darin birîn.

Memo gurin kuştin.

Osman leşkerina dikuje.

Zînê mihina didoşe.

Memo ji kurina pirsî.

Şêro bi xortina dikene.

Ciger dê ji bajarina derbas bibe.

Di navên nêr û mê yên nependî de, em (ekî) û (ekê) di rewşa tewandinê de bi kar tînin.

#### 1.2.3.1.4. Piçkolekirina navan

Navê piçkole bi danîna paşgînekê çêdibe. Piçkolekirina navan bi armanca hez kirin, xweş kirin, ciwan kirin û pîs kirin û kêr kirinê çêdibe. Mînak:

Baxçe        ji navê bax

Darik        ji navê dar

Çetiko        ji navê çeto (çeter)

Hogirko        ji navê Hogir

Perwînkê        ji navê Perwîn

Paşgînen biçûkirina navan ev in:

ek, ok, kok, ole, kole, ik, çe, çik, ko, kele, leke, ûle, oke, k, iko, kê, ikê.

ek	destek, bendek, perdek, pêçek,
ok	zarok, canok, danok, gulok, şemamok,
kok	xweşkok, reşkok, delalkok,
ole	Reşole, gêjole, hişkole, mêşole,
kole	reşkole, piçkole,...
ik	darik, dasik, xweşik, reşik, dilik, keçik,
çe	baxçe, navçe,
çik	rêçik, derçik
ko	Hesenko, rebenko,
kele	sûrkele,
leke	çoleke,
ûle	mêşûle, zerûle,
oke	baroke,
k	gulîk, dargulîk, bijîk, cok,
iko	xortiko, xweşiko, reşiko,
kê	dilvînkê, Nermînkê,
ikê	xweşikê, sêvikê, gulikê,

### 1.2.3.1.5. Hejmar ( kom û yekhejmar )

Di zimanê kurdî de du hejmar hene: Yekhejmar û pirhejmar. Yek yekhejmar e û ji yekê û jor de kom e.

Yekhejmar

Navê yekhejmar mirovekî, tiştêkî yan jî, lawirekî tenê bi nav dike. Navê yekhejmar nayê guhertin mîna xwe dimîne. Lê di tewandinê de, navê nêr (î) û yê mê (ê) distîne. Navên nependî (ek) û (eke) distînin û di tewandinê de, ( ekî) û ( ekê ) distînin: Keç, xort, gund, keçek, xortek, keçeke, keçê, xortî, gundî, keçekê, xortekî, gundekî,...

Kom

Bêtir ji yekî ji mirovan, tiştan yan jî, lawiran bi nav dike. Dema nav diyar be, paşgîna " an " distîne. Lê dema nediyar be "nan" distîne. Navê kom di hevbendiyê de ( xistinepal ) paşgîna " ên " distîne: Keçan, xortan, keçinan, xortinan, keçên dilsoz, xortên çeleng,...

#### 1.2.3.1.6. Tewandina navan

Navê kom dibin hin mercan de tê tewandinê:

1. Nav, dema ku kirdeyekî bi berkar be di buhêrkê de tê tewandinê.

şoreşgeran sîxurek kuşt.

Gundiyan serhildan çêkir.

Palan nîsk çinîn.

Xort(î) çek rakir.

Keçê nan pijand.

Keçekê dijmin lerizandin.

Xortekî şêrgo dît.

şoreşgerinan sîxurek kuşt.

Gundînan serhildan çêkir.

2. Eger nav kirdeyekî bê berkar be, di herdeman de şût dimîne û nayê tewandinê.

Cotkar hatin.

Xwendevan rabûn.

Rêwî diponijin.

Dijmin dê bimirin.

Di vê rewşê de em kombûna nav ji kombûna lêker nas dikin, jiber ku lêker " n "a kombûnê distîne: hatin, rabûn, ponijin, mirin,...

3. Eger nav di hevokê de kirdeyekî xwedî berkarekî durust be, di nihok û mandê de, nayê tewandinê.

Mêr çekan amede dikin.

Jin şoreşgeran bi nan dikin.

Keç xortan dibînin.

Koçer dê biçin zozanan.



Xort dê biçin çîyan.

Gerîla dê dijminan bikujin.

4. Eger nav berkarekî durust be, di buhêrkê de şût dimîne û di nihok û mandê de tê tewandinê..

Buhêrk

Gundiyan noker kuştin.

Kurdan caş dîtin.

Min şervan dîtin.

Min keç dît.

Min xort dît.

Nihok:

Ez şoreşgeran dibînim.

Em gulan diçînin.

Xort keçan pîroz dikin.

Mand:

Ez dê şoreşgeran bibînim.

Em dê gulan biçînin.

Ez keçê dibînim.

Ez xort(î) silav dikim.

5. Eger nav di hevokê de berkarekî ne durust be, di her çaxan de tê tewandinê.

Buhêrk :

Min ji xwendekaran pirsî.

Min li şehîdan silav kir.

Min bi şervanan re nan xwar.

Min ji keçê re got.

Te ji xort(î) pirsî?

Nihok:

Ez ji xwendekaran dipirsim.

Ez li şehîdan silav dikim.

Ez bi şervanan re nan dixwim.

Mand:

Ez dê ji xwendekaran bipirsim.

Ez dê li şehîdan silav bikim.

Veguhastina navan (Tewang)

Nav mîna xwe namîne, di bin hin rewş û hoyan de tê guhastinê. Jibo têgihîştina veguhastina navan, emê bi hev re hevokên jêr berçav bikin.

1. şêrînê! Tu şoreşgeran dibînî ?

şêrin > şêrînê

Azado were vê derê !

Azad > Azado

Keçno, werin dîlanê!

Keç > Keçno

Xortno, ev govenda mêran e.!

Xort > Xortno

2. Hêvînê tiving hilgirt.

Hêvîn > Hêvînê

Ez nameyê dinivîsim.

Name > Nameyê

Min xebat li Botanê dît.

Botan > Botanê

Zoro ji Hewlêrê ye.

Hewlêr > Hewlêrê

Li vî xortî temaşe bikin.

Xort > Xortî

Vî bajarî ez gêj kirim.

Bajar > Bajarî

3. Ez çûbûm çiyê .

Çiya > Çiyê

Min ji hevêl re got

Heval > Hevêl

Min ji ava çêm vexwar.

Çem > Çêm

4. Min ji Hogir re got.

Hogir > Hogir re

Ez di Qamişlo re çûm Dêrikê.

Qamişlo > Qamişlo re

Stirî di piyê Gulê re çû.

Gulê > Gulê re

5. Em bi Zêrê ve çûn.

Zêrê > Zêrê ve

şûr di pişta Ristem ve çû.

Ristem > Ristem ve

6. Kesbûna şoreşgerî di Nezîr de pêk hatibû

Nezîr > Nêzîr de

Me çayê di beroşê de çêkir.

Beroş > Beroşê de

7. Keçan çek hilgirtin

Keç > Keçan

Gerîlan dijmin hejand.

Gerîla > Gerîlan

Goşt di saringê de bû.

Saring > Saringê de

Koma yekemîn ji hevokên ku me rêz kirine, di darêja bangê de ne; şêrînê , Azado, keçno û xortno, van navan di vê darêjê de paşgînên: ê, o, û no standine. Em ji van hevokan digihîjin vê derencamê:

Nav di darêja bangê de, tê guhastinê. Navê mê yê yekhejmar paşgîna (ê) distîne, mîna:

şoreşê!

Yadê !

Xwîşkê !

Hevalê !

Yarê !

Navê nêr yê yekhejmar paşgîna (o) distîne, mîna:

Kurdo !

Rizgaro !

Welato !

Mileto !

Hevalo !

Koma herdu zayendan ( nêr û mê ) paşgîna (no) distînin, mîna:

Hevalno!

Dayîkno!

Kurdno!

Miletno!

Koma duyemîn ji hevokan, navên ku di darêja berkariyê de hatine tewandinê dicivîne: Hêvînê, nameyê, Botanê û Hewlêrê , navên mê ne. Ev nav bi paşgîna " ê " hatine tewandinê. Lê xortî, nanî û bajarî navên nêr in û bi paşgîna " î " hatine tewandinê.

Derencam:

Nav di darêja berkariyê de tîn tewandinê. Navê mê paşgîna " ê " distîne û navê nêr paşgîna " î " distîne.

Koma sêyemîn ji hevokan tewandina navên nêr ku tîpa " e " yan " a " tê de hebe berçav dike. Çiya bûye çiyê. Çem bûye çêm. Her wiha heval bûye hevêl.

Derencam:

Navê nêr ku tîpa " e " yan " a " di wan de hebe di tewandinê de " e " û " a " dibin " ê "

Gavan > Gavên

şivan > şivên

şervan > şervên

Xebat > Xebêt

Çem > Çêm

Koma çaremîn ji hevokan rewşeke cemhevî ku bûyer tê de pêk hatiye berçav dike. Jibo vê darêjê awayê bi hev re tê gotinê. Di awayê bi hev re de nav paşgîna " re " distîne û bersiva van pirsan dide:

Bi kê re ? Tu bi kê re çûyî çiyê? Ez bi Egîd re çûm çiyê .

Bi çî re ? Tu bi çî re difirî ? Ez bi ewran re difirîm.

Ji kê re ? Te ji kê re got ? Min ji Zînê re got.

Di ku re ? Tu di ku re çûyî? Ez di Qamişlo re çûm.

Di çî re ? Te derzî di çî re kir? Min derzî di ber kumê xwe re kir.

Koma pêncemîn ji hevokan yekîtiyekê di navbera bûyerê û kesê ku bûyer hatiye serê wî de berçav dike. Awayê tevayî ji vê darêjê re tê gotinê. Di awayê tevayî de nav paşgîna " ve " distîne û bersiva van pirsan dide:

Di ku ve ? Şûr di ku ve çû ? Şûr di pişta Ristem ve çû ?

Bi çî ve ? Te ker bi çî ve girêda ? Bi sing ve.

Di çî ve ? Şûr di çî ve çû ? Şûr di balgih ve çû.

Di kê ve ? Gule di kê ve çû ? Gule di şîno ve çû.

Koma şeşemîn ji hevokan cihê ku bûyer tê de pêk hatiye berçav dikin. Jibo vê darêjê awayê cîwarî tê gotinê.

Nav di vî awayî de paşgîna (de) distîne û bersiva van pirsan dide:

Di çî de ? Goşt di çî de ye ? Goşt di beroşê de ye.

Di kê de ? Kesbûna şoreşgerî di kê de ye ? Di Nezîr de ye.

Di ku de ? Şoreşger di ku de ne? Şoreşger di mala Dilgeş de ne.

Koma heftemîn ji hevokan, dîsa mîna ya duyemîn, navên ku di darêja berkariyê de hatine tewandinê, dicivîne. Lê vê carê nav pirhejmar e. Di vê rewşê de navê kom bi paşgîna ( an ) hatiye tawandinê.

Gerîla Gerîlan

Keç Keçan

Nav di awayê raderî de:

Di darêja raderî de, nav mîna xwe dimîne, nayê guhastinê û bersiva van pirsan dide:

Kî çî dike ? Kî dibîne ? Keç dibîne.

Çî çî pê hat ? Çî ket ? Xanî ket.

Çî di çî rewşê de ye ? Çî şikestiyê ? Derî şikestiyê.

Kî di çî rewşê de ye ? Kî hişyar e ? Gel hişyar e.

**Nasîn:**

Di awayê bi hev re , tevayî û cîwarî de , nav bi daçekan tê tewandinê. Em dikarin jibo van darêjan awayê daçekî bibêjin.

**Guhestina navên mê " keç "**

Rêz	Awa	Pendî- Yek	Nependî- Yek	Pendî- Kom	Nependî- Kom
1	Rast	keç	keçek	keç	keçin
2	Bang	keçê	.....	keçno	.....
3	Tewandî	keçê	keçekê	keçan	keçinan
4	Bihevre	keçê re	keçekê re	keçan re	keçinan re
5	Tevayî	keçê ve	keçekê ve	keçan ve	keçinan ve
6	Cîwarî	keçê de	keçekê de	keçan de	keçnan de

**Guhestina navên nêr " xort "**

Rêz	Awa	Pendî- Yek	Nependî- Yek	Pendî- Kom	Nependî- Kom
1	Rast	xort	xortek	xort	xortin
2	Bang	xorto	-----	xortno	-----
3	Tewandî	xort(î)	xortekî	xortan	xortinan
4	Bihevre	xort(î) re	xortekî re	xortan re	xortinan re
5	Tevayî	xort(î) ve	xortekî ve	xortan ve	xortinan ve
6	Cîwarî	xort(î) de	xortekî de	xortan de	xortinan de

**Guhestina navên nêr ( nan )**

Rêz	Awa	Pendî- Yek	Nependî- Yek	Pendî- Kom	Nependî- Kom
1	Rast	nan	nanek	nan	nanin
2	Bang	nano	-----	nanino	-----

3	Tewandî	nên(nanî)	nanekî	nanan	naninan
4	Bihevre	nên re	nanekî re	nanan re	naninan re
5	Tevayî	nên ve	nanekî ve	nanan ve	naninan ve
6	Cîwarî	nên de	nanekî de	nanan de	naninan de

### 1.2.3.1.7. Tewandina navan - darêja berkarî

Di darêja berkarî de nav tê tewandinê. Navê mê paşgîna (ê) distîne û yê nêr paşgîna (î) distîne.

Eger navê nêr tîpên ( e ) yan ( a ) tê de hebin, ev tîp dibin ( ê ). Di rewşên jêrîn de nav dikeve darêja berkariyê:

1. Di buhêrk de, eger nav bi lêkerê derhingêv re kiryar be dikeve darêja berkariyê û tê tewandinê.

Navê mê:

Keçê çeka şoreşê hilgirt. Keçê

Çêlekê ka xwar. Çêlekê

Şêrînê gul av dan. Şêrînê

Ev hevok bi vî awayî dikarin bên ziman:

Çeka şoreşê ji hêla keçê ve hat hilgirtinê.

Ka ji hêla çêlekê ve hat xwarinê.

Gul ji hêla şêrînê ve hatin avdanê.

Navê nêr:

Vî xortî çeka şoreşê hilgirt. Xortî

Vî hogirî gul av dan. Hogirî

Ev hevok bi vî awayî dikarin bên ziman:

Çeka şoreşê ji hêla vî xortî ve hat hilgirtinê.

Gul ji hêla vî hogirî ve hatin avdanê.

Navê nêr ku ( a ) di wan de heye:

Gê ka xwar. Ga > Gê

Êş genim kir ard. Aş > Êş

Nasîn: Peyvên bav, xal û ap derî vê rêzanê ne. Ev peyv mîna navên mê ( ê ) distînin, yan ( o ) distînin.

Apê / Apo çek hilgirt.

Bavo / Bavê gul çandin.

Xalê / Xalo av vexwar

2. Eger nav di demên nihok û pêşedemê de berkarekî durust be dikeve darêja berkariyê û tê tewandinê.

Navê mê

Nazê tivingê heldigire.	Tivingê
şînoyê çêlekê bibe mêrgê.	Çêlekê
Gulê bizinê didoşe.	Bizinê

Navê nêr

Nazê goşt(î) dixwe.	Goşt ( î )
Nermînê wî giyayî dikelîne.	Giyayî
Soro nêr dixwe	Nên ( nan )
Gulê dên dikelîne.	Dên ( dan )

3. Eger nav berkarekî ne durust be, di herdemê de tê tewandinê.

Navê mê

Memo li şêrînê dike hawar.	şêrînê
Huner ji Hêvînê pirsî.	Hêvînê
Emê li Botanê bibin mêvan.	Botanê

Navê nêr

Huner ji Azad(î) dipirse.	Azad(î)
Ezê li gundî bibim mêvan.	Gundî
Qenco ji êş hat.	Êş ( aş )
Ez ji zimên hez dikim	Zimên
Guro li Osmên xist.	Osmên



## 4. Di darêja zêderî de, navê dawî tê tewandinê.

Navê mê

Mala jinê.	jinê
Kirasê şêrînê.	şêrînê
Nanê sêlê.	Sêlê

Navên nêr

Êşa dil ( î ).	Dil ( î )
Dîtina çav(î).	Çav ( î )
Çûna êş.	Êş ( aş )
Sima gê.	Gê ( ga )
Hilgirtina bêr.	Bêr ( bar )

Gurana nêrî.

Êşa serî.

Navê nêr ku ( e ) yan ( a ) di wan de heye, dema bi rengdêreke nîşandinê yan rengdêreke hejmarî re bên bikaranînê, herdem bi ( î ) tên tewandinê.

Ez ê hêsp bikirim.	Ez ê vî hespî bikirim.
Berên ceh xwar.	Sî beranî ceh xwarin.
Ez ji berên ditirsim.	Ez ji vî beranî ditirsim.

## 1.2.3.1.8. Navên kirdeyî û berkarî

**Navên kirde**

Ev nav bi karekî radibe. Pîşekî yan jî, delametekê pêk tîne. Navên kirdeyî bi hatina paşgînên ku ji koka lêkeran e li dû navan saz dibin. Bi yekgirtina nav û paşgînan, navekî nû saz dibe ku hem wateya nav û hem jî, ya lêker dide. Ev navên lebatî û livbaz bi bizavekê radibin û jibo wan "navên kirde" tê gotinê. Paşgînên ku navên kirde çêdikin, ev in:

**Van** Aşvan, dergehvan, hozanvan, bilûrvan, gavan, şervan, xwendevan, dilovan, şoreşvan, dadvan, rojnemevan, bêrîvan,....

<b>Wan</b>	karwan, pêhlewan,...
<b>Kar</b>	Cotkar, xwendekar, serkar, nivîskar, tewankar, xebatkar, hesinkar
<b>Ker</b>	Karker, tevinker, şoreşker, spîker, dagirker, zêrker, şermker,...
<b>Ger</b>	Rojnameger, dadger, şanoger, hesinger, şoreşger, meyger, werger,...
<b>Gêr</b>	Wergêr, çapgêr, xwegêr, ...
<b>Gir</b>	Masîgir, rexnegir, wênegir, dengir,...
<b>Bêj</b>	Dengbêj, çîrokbêj,...
<b>Baz</b>	Hîlebaz, livbaz, rimbaz, serbaz, canbaz,...
<b>Pêj</b>	Xwarinpêj, nanopêj,
<b>Pij</b>	Nanpij,
<b>Kêş</b>	Wênekêş, barkêş, zehmetkêş,...
<b>Dar</b>	Dildar, koledar, serdar, zordar, dengdar, dikandar, kujdar,...
<b>Dêr</b>	Rengdêr, çavdêr, fermanêr,...
<b>Nas</b>	Kurdnas, rojhilatnas, civatnas, mafnas,...
<b>Zan</b>	Kurdzan, zimanzan, dengzan, zemînzan, dîrokzan,...
<b>Guhêz</b>	denguhêz, nûçeguhêz, wêneguhêz, ...
<b>Bir</b>	Darbir, destbir, qolbir, rêbir, porbir, namebir,...
<b>Bîr</b>	Rewşenbîr, ronakbîr, ...
<b>Firoş</b>	Gulfiroş, meyfiroş, zembîlfiroş, nanfiroş, şîrfiroş,...
<b>Der</b>	Jander, hewleder,...
<b>Saz</b>	Pîşesaz, dermansaz, plansaz,...
<b>De</b>	Dirinde, bexşinde, girîde
<b>Bar</b>	Xembar, tewanbar, ...
<b>Ber</b>	Rêber, fermanber,...
<b>E</b>	Xwende, xwere, beze, firoke,
<b>Yar</b>	Hişyar, biryar, mafyar,...
<b>War</b>	Bendewar,...
<b>Wer</b>	Serwer, bîrawer, pêşwer, ...
<b>A</b>	Zana, şareza, hosta,...
<b>Ar</b>	Xewar, kevnar,...
<b>Ok</b>	Kenok, gerok, revok, serok,...
<b>Mend</b>	Hişmend, hunermend, aqilmend, siyamend,...

Er Daner,...

### Navê berkar

Ev nav buyerek tê serê wî û dikeve bin barê lêkerê ji babeta xwe. Navê berkar bi danîna paşgîna " î " li dû lêkeran saz dibe. Herwiha navekî nû tê çêkirinê, mîna:

Ketî > Yê ku ketiye.

Lêkera ket + î > Navê berkar

Di navê berkar de, lêker bi xwe dibe nav. Mînak:

Hilgirtin > hilgirt > hilgirtî

Hilbijartin > hilbijart > hilbijartî

Vexwarî

Xwarî

Dîtî

Mirî

Kenî

Dema em dibêjin : Hilbijartî, tê wateya yê ku ketiye bin hîkariya hilbijartinê.

## Dengê N – peydabûn û guherîna wî

Herfa N / n di kurdî û zimanên din yê latînînivîs de nîşana dengê "bêvilî-pidûyî" ye. Mebest ji "bêvilî" ew e ku ev deng bi alîkariya bêvilê (pozê, difinê, kepiyê) derdikeve: di dema gotina vî dengî de hewa di bêvilê re derdikeve. Mexsed ji "pidûyî" ew e ku di dema gotina vî dengî de ziman bi pidûyan dikeve.

Ev deng di alfabeya kurdî-erebî de – wek di erebî û farisî de jî – bi herfa ڻ tê nivîsîn. Di alfabeya kurdî-krîlî de, wek di zimanên din jî yê krîlînivîs de, ev deng bi herfa Н (gir) н (hûr) dihat nivîsîn. Di alfabeya dengnasî ya navneteweyî (IPA) de ev deng bi herfa [n] tê nîşankirin.

Mirov dikare li vê derê guh bide vî dengî:

[https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar\\_nasal.ogg](https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar_nasal.ogg)

## Peydabûna N di peyvan de

Dengê N/n dikare li destpêk, nav û dawiya peyvê peyda bibe:

- destpêk: na, nerm, nû...
- nav: banî, bilind, deng...
- dawî: baran, man, ken...

Li gor lêkolînên me yên berî niha<sup>8</sup>, N/n mişetirîn anku zehftirîn konsonanta nivîsên kurmançî ye. Li gor heman lêkolînê, rêjeya herfa N di nivîsan de 9,4 % e. Tenê vokalên "i" û "e" di kurdî de ji herfa N zêdetir peyda dibin.

## Taybetiya dengê NG / NK

Di piraniya devokên kurmançî de herfên NG wek du dengê ji hev cuda tîn gotin. Sinorê kêteyê (heceyê) jî dikare bikeve navbera wan:

- ren-gê sor

Lê di hin zimanên û di hin devokên kurdî de (bi taybetî di hin devokên soranî de û di piraniya devokên kurdiya başûrî de<sup>9</sup>) ev herdu herf bi hev ve dihelin û dengê tek yê bêvilî-bandevî pêk tînin. Anku di derxistina vî dengê de ziman wek di gotina N tenê de bi pidûyan nakeve lê bi ban-devî anku bi banê devî dikeve.

Di sîstema IPAYê de ev deng bi herfa [ŋ] anku n-yeke bi çengal tê nivîsîn. Di hin zimanên de ew bi herfa ñ diyarkirin.

Mirov dikare li vê derê guh bide vî dengê:

[https://en.wikipedia.org/wiki/File:Velar\\_nasal.ogg](https://en.wikipedia.org/wiki/File:Velar_nasal.ogg)

Di kurmançî de jî, tevî ku "ng" du deng in, dîsa jî hebûna N ya berî G yan berî K tesîreke wisa li N dikeve ku ew dibe ban-devî anku di dema derketina N de ziman bi banê devî dikeve. Cudahiya NG ya kurmançî li gel heman dengê piraniya devokên kurdiya başûrî ew e ku di kurmançî de G jî tê gotin lê di kurdiya başûrî de ew li gel N dihele û tenê [ŋ] dimîne. Di kurmançî de NG dibe [ŋg].

<sup>8</sup> Husein Muhammed: Rêjeya herfan di nivîsên kurmançî de:  
[http://nefel.com/kolumnists/kolumnist\\_index.asp?MemberNr=33](http://nefel.com/kolumnists/kolumnist_index.asp?MemberNr=33)

<sup>9</sup> Mebest ji "kurdiya başûrî" devokên feylî, kelhurî û kirmaşanî ne ku ji kurmançî (kurdiya bakur) û soranî (kurdiya navendî) cuda ne.

## Guherîna N bi herfên din

Tarîxîyen N di makên zimanê kurdî de anku di îraniya kevn û proto-hindûewropî de jî hebûye. Dengê N herwisa di zimanên cîran de jî û di piraniya zimanên dinyayê de heye. N di kurdî de bi piranî ne ji ti dengêkî din e. Lê dîsa jî hin caran N û hin dengên din bi hev guherîne.

N ji aliyê dengnasî ve û di warê veguherîna dangan nêzîkî dengê M û L ye. N û M herdu dengên bêvilî ne anku di dema gotina wan de hewa di bêvilê re derdikeve.

### N û lêzimên wê M û L

CIH →	du- lêvî	lêvî- didanî	pidûyî	paş- pidûyî	ban- devî	paşdevî	ser- gewrî	zima- nokî	qirrikî
<b>AWA:</b>									
<b>BÊVILÎ</b>	m		n						
<b>SEKNÎ</b> - bêlerz - bilerz	p b		t d			k g		q	? (eyn)
<b>XIŞOKÊN</b> <b>VIZOK</b> - bêlerz - bilerz			s z	ş j		x			
<b>XIŞOKÊN</b> <b>NEVIZOK</b> - bêlerz - bilerz		f v		ç c					h
<b>JENOK</b>			r						
<b>TENGAV</b>	w		l		y				

Tabloya konsonantên kurdî © Husein Muhammed 2014 - 2015

Loma N û M carinan bi hev diguherin:

- neke / meke

- kurdî: "em dixwin", farisî "ma mîxorîm"

Bi taybetî jî gava ku N û B yan P digihin hev, N dibe M:

- Istanbul → Stembol
- bi nivîskî "jinbab / jinbav" (ji "jin+bab/bav") lê bi gotina sivik "jimbab / jimbav"

N di hin peyvan de jî dibe L:

- "nimêj, nivêj" (bide ber soranî "nwêj", zazakî "nimac", farisî "nemaz") → bi hin devokan "limêj"
- "nivîn" (bide ber "nivistin", bi soranî "nûstin") → bi hin devokan "livîn"
- daçeka kurmancî "li" û soranî "le" ku eslê wan "\*ni" û "\*ne" bû (bide ber hewramî "ne", farisiya kevn "ena", inglîzî û latînî "in", yûnaniya kevn "ên", albanî "ën" ...)

## Zêdebûna N li peyvê

Dengê N li nava hin peyvan zêde dibe lê di eslê xwe de di wan peyvan de tine bû. Bo nimûne, peyva "tac" hin caran wek "tanc" tê gotin. Peyva "çok" di hin devokan de wek "çong" e.

Mirov dikare vê zêdebûna N li peyvê bi taybetî di peyvên esil-biyanî de bibîne. Bo nimûne, peyva "firset" (ji erebî *furşat* فرصة) carinan wek "firsend" tê gotin. Peyva "bêder" (ji erebî *beyder* بيدر) di hin devokan de bûye "bênder".

Peyva di peyva "amanc, armanc" de di kurdî de N heye. Lê di hevwateriya wê ya farisî (*amac* آماج) û tirkî "amaç" de N peyda nabe. Ji ber ku zêdebûna N li nava peyvê di peyvên din de jî diyardeyeke berbelav e, ihtimalen N li peyva kurdî zêde bûye, ne ku N ji peyva farisî yan tirkî ketiye.

Di peyva "reng" de bi zimanên din jî yê îranî N heye. Lê di sanskrîtî de ew wek "raga-" hatiye qeydkirin û texmînen ew ji proto-hindûewropî \*reg- e ku N tê de nine. Anku N li peyvê zêde bûye.

Bi heman awayî di peyvên "bang, deng" û peyva zazakî "veng" (deng) de N heye. Lê ew bi eslê xwe ji hevrehên peyva zazakî "-vac-" (rehê dema niha ji lêkera "vaten" anku "gotin") û peyva "-bêj-" (rehê dema niha ji lêkera "gotin") in peyva "a-waz" in ku tê de N nîne. Anku dîsa N li van peyvan (bang, deng, veng) zêde bûye.

Wek ku tê dîtin, N xaseten li berî G, C, D zêde dibe.

N hin caran li dawîya peyvê jî zêde dibe. Bo nimûne, peyvên wek “dîsa, çawa, wisa” û hin peyvên din dibin “dîsan, çawan, wisan” û hwd.

## Ketina N ji dawîya peyvê

Carinan jî N ji peyvê dikeve. Ev diyarde xaseten di formên pirhejmar yê çemandî de peyda dibe. Di hemû kurmanciya devkî de N ji paşpirtika pirhejmariyê ya “-an” dikeve:

- du kitêban (nivîskî) → du kitêba\_ (devkî)
- wan kesan → wa\_ kesa\_ (yan “wan kesa\_)

Di hin devokan de, lê ne di hemûyan de, N ji paşpirtika “-ên” jî dikeve:

- du hevalên wî → du hevalê\_ wî
- wan kurdên Stembolê → wa(n) kurdê\_ Stembolê



## Nirxandinek li ser pirtûka ”Rastnivîs û Rêzimana Kurmancî”

**Bahoz Baran**

Dema ku em bala xwe didin pirtûkên rêzimanê yê Kurmancî, em rastî gelek kêmasî û çewtiyên berbiçav tên. Divê amadekarê wan pirtûkan, wan çewtiyan bibînin û di pirtûkên xwe yê din de, wan serast bikin. Lewre çewtî belav dibin û êdî weke tiştê rast tên pejirandin. Par, di heqê pirtûka Samî Tan ya rêzimanê de, du nivîsên min di azadiya welat de hatin weşandin. Birêz Samî Tan bersiva herdu nivîsan jî da. Hinek tişt qebûl kirin, hinek qebûl nekirin û ji hinekan re jî got, mirov dikare li ser wan bifikire. Li ser pirtûka wî şeş nivîs li ber destê min hebûn. Min nivîsa sêyemîn jî şand, lê ji ber çî egerê bû ez nizanim, azadiya welat got, “em nikarin nivîsa te biweşînin, polemîk derdikevin.” Gelo em ê nikaribin nîqaşa mijarên xwe yê rêzimanî bikin?

Îsal pirtûka bi navê “Hînkêr” jî derket. Dema ku min bala xwe da wê pirtûkê, min dît ku, tiştên ku hatibûn rexnekirin, hê jî weke xwe mane. Nivîskarên me carinan kêmasiyan qebûl jî dikin; lê rast nakin. Dîsa min berê xwe da pirtûka Samî Tan û kêmasî û çewtiyên berbiçav tespît kirin. Armanca min ew e ku, bi çavekî rexneyî û zanistî li rêzimana kurmancî bê nihêrtin û avahiya ku hatiye lêkerin, bê xurtkirin û bilindkirin. Lewre li bakur, di warê rêzimanê de gelek tiştên kêma û çewt hene. Rexneyên me dikevin qada zanistê û xwedî îspat in. Ev pirtûkên ku ez qala wan jî dikim, li her çiyê hene û mirov wan dixwînin, ji ber vê yekê divê li ser kêmasî û çewtiyan bê sekinandin. Divê nivîskarên me jî guh bidin van tiştan, xwe neqehirînin, careke din li ser van mijaran bifikirin.

**VEQETANDEK Û QERTAFÊN NEDIYARIYÊ-NEBINAVKIRINÊ**

Di pirtûka Samî Tan de mijar wiha hatiye vegotin:

**Qertafên raveberê ev in(veqetandek):** -a(mê), ê(nêr), ên(pirj.)

**Mînak:**

Hevala min hevalê min hevalên min

**Qertafên nediyariyê(nebinavkirinê) ev in:** -ek(yekj.), -in(pirj.)

-ek ji 'yek'ê tê; -in jî ji 'hin'ê tê

**Veqetandekên nebinavkirî ev in:** -eke(mê), -ekî(nêr) -ine(pirj.)

Hevaleke min hevalekî min hevaline min

Qertafên -eke, -ekî, -ine, weke qertafên veqetandekê yên nebinavkirî hatine dayîn.

Ev tiştêkî ne di cî de ye. Ji ber ku -ek û -in tiştêkî din in; -î, û -e tiştêkî din in. Mirov nikare, wan weke yek tiştî nîşan bide. Rêbaza rêzimanî ya veçirandina qertafan jî destûrê nade vê yekê. Her qertaf xwedî peywirekê ye. Mirov nikare du qertafan bi hev ve bikelijîne. Dema ku mirov peyvê ji hev veçirîne her tişt derdikeve holê:

**Mînak:** Hev-al-ek-î min hev-al-ek-e min hev-al-in-e min

**Hev=** koka peyvê     **al=** qertafa çêker

**ek=** qertafa nediyariyê ya yekjimar     **î=** veqetandeka nêr ya ku piştî nediyariyê tê.

Mirov dikare bibêje, dema ku qertafên –ek û –in di ravekê de cî bigirin (bên raveberê) wateya nediyariyê didin wê û qertafên veqetandekê jî diguherin dibin: -î, -e, -e. Ango her du qertaf ji hev cuda ne.

### RAVEKÊN NAVDÊR Û RENGDEËRAN Û YÊN RÊZIKÎ-ZINCÎRÎ

Divê mijarê de jî, hin tişt hatine tevlihevkirin. Ravekên navdêran, di nava mînakên ravekên rengdêran de hatine dayîn. Mînakên raveka zincîrîn jî çewt hatine dayîn, bi ravekên rengdêran re jî hatine tevlihevkirin.

#### Ji bo raveka rengdêran ev mînak hatine dayîn:

<b>Mînak:</b> Mala vî hevalî,	Xwedina wî bilbilî,	Hatina çar hevalan
Axaftina çend karkeran,	Xebata du destbirayan,	Roniya kîjan malê

Ev mînak ravekên navdêran in, ne ravekên rengdêran in, tenê rengdêrek ketiye nava wan. Mirov nikare vana weke ravekên rengdêran nîşan bide. Ji bo em karibin wan bikin ravekên rengdêran divê wiha bên nivîsîn:

#### Çareserî:

Vî hevalî, wî bilbilî, çar hevalan, çend karkeran, kîjan mal  
Ev heval ew bilbil çar heval çend karker

#### Ji bo raveka zincîrîn jî ev mînak hatine dayîn:

**Mînak:** Hevala çavşîn û porzer  
Dayika dilşewitî û keserkûr

Raveka zincîrîn di rengdêran de tune ye. Çima ev mînak hatine dayîn, min fam nekir. Ev her du mînak jî çewt in. Raveka zincîrîn wisa nayê çêkirin. Divê du heb ravek têkevin nav hev. Lê di mînakê de raveber û ravekerê heye. Di ser de, li şûna navdêrê, rengdêr hatine bikaranîn. Ev jî çewtiyeke din e.

Hevala      çavşîn û porzer

Raveber      Raveker

Raveker ji du hêmanan pêk hatiye û ev jî weke raveka zincîrîn hatiye dayîn. Raveka zincîrîn ne wiha ye û ji rengdêran jî çênabe.

#### Çareserî:

Di raveka zincîrîn de, du ravek bi hev ve tên girêdan;

**Mînak:** Kulîlka çiya+çiyayê zagrosê= Kulîlka çiyayê Zagrosê  
Mifteya derî+ mala zînê= Mifteya deriyê mala zînê

#### HOKERÊN ŞANÎDANÊ

Di mijara hokerên şanîdanê de jî, çewtiyeke berbiçav heye.

Samî Tan gotiye hokerên şanîdanê ev in: Wisa, wilo werê(dûr)

Wiha, halo, hanî(nêz)

Ev tiştên ku hatine rêzkirin, ne hokerên şanîdanê ne, hokerên çawaniyê ne; pirsar “çawa”yê dibersivînin û teşeyê kirina tişteki nîşan didin.

**Mînak:** Min ji te re wisa got.(çawa got-teşeyê gotinê )

Wiha kir û wisa xwar.(çawa kir û çawa xwar-teşeyê kirinê û xwarinê)

#### Çareserî:

Hokerên şanîdanê ev in: wa(dûr), va(nêz)

**Mînak:**

Wa nan dixwe.(xwarinê nîşan dide, aresteyî lêkerê dibin hoker)

Va diçe malê.(çûyîna malê nîşan dide, aresteyî lêkerê dibin hoker)

Carinan weke pêveber jî tîn nivîsîn û qertafa(-e,-ye) kesê sêyem ya ku di şûna lêkera “bûn”ê de jî tê bikaranîn distînin.

**Mînak:** Va ye, nan dixwe.

Wa ye diçe malê.

### CUREYÊN BÊJEYAN

Samî TAN di pirtûka xwe de “veqetandek û jimarnavan” jî xistiye nav cureyên bêjeyan. Ev ne di cî de ye. Mijar jî tevlihev dibin. Veqetandek jixwe ravekan çêdikin û dikevin beşa navdêr û rengdêran. Jimarnav jî hem di nava rengdêran de cî digirin; hem jî ji bo diyarkirina wan, em di nava mijara navdêran de dikarin cî bidin wan, ji ber ku ew jî navdêr in.

Li gorî dabeşkirina pirtûka Samî TAN:

Cureyên Bêjeyan Ev in:

Veqetandek, navdêr, cînavk, hevalnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan, jimarnav, lêker

Dema ku em rexneyan li hinek mijarên wiha dikin bersiv ev e: Celadet Elî Bedirxan jî wisa gotiye.

Belê, we gelek tiştên Celadet Elî Bedirxan guhertiye, wê çaxê ev bersiv çî ye?. Divê mirov bi awayekî neguherbar li Celadet Elî Bedirxan nenihêre. Avahiya ku wî lêkiriye xurt û bilind bike.

### Çareserî:

Peyv ji aliyê binyadê ve, yan nav in yan jî lêker in, ji ber ku li xwezayê jî tevger(lêker) û hebûn(nav) hene, ev wiha ye; lê li gorî peywira xwe dibin hoker, rengdêr, daçek, gihanek, cînavk.

Li gorî dabeşkirina me:

**Li gorî binyada xwe peyv dibin:** Navdêr û lêker, peyvek dema ku bi tena serê xwe be, yan navdêr e, yan jî lêker e.

Li gorî peywira xwe peyv dibin: Cînavk, rengdêr, hoker, daçek, gihanek, baneşan.

Di nivîseke din de, ez ê li ser hin kêmasî û çewtiyên din, ramanên xwe bînim zimên. Lewre gelek tiştên ku em ê qala wan bikin hene. Mijara hêmanên hevokê, mijara tewangê, mijara raderê, mijara qertafên navgir, mijara rengdêran, mijara lêkernavê, mijara hevoksaziyê, mijara xalbendiyê.

Di nivîsa yekemîn de, ez li ser hin kêmasî û çewtiyên berbiçav ên pirtûka birêz Samî Tan sekinîbûm. Ew nivîs berdewamiya rexne û nirxandinên par bû. Di vê nivîsê de, ez ê li ser hin kêmasî û çewtiyên dî bisekinim: Mijara cînavkên xwedîtiyê, cînavka girêkî, hevalnavê û hokerê.

## 1. CÎNAVKÊN XWEDÎTIYÊ

Ez pêşî raveya pirtûka brz. Samî Tan ragihînim:

“Di kurdî de bi serê xwe cînavkên xwedîtiyê nîn in. Lê belê veqetandek û hin cînavkên bireser digihîjin hev, ji wan, cînavkên xwedîtiyê pêk tîn:

**Mînak:** a min, a te, a wî,/wê, a we, a wan

a vî, a vê, a van

ê min, ê te , ê wî/wê, ê me, ê we, ê wan....”

Brz. Samî Tan, cînavkên pêwendiyê(a, ê, ên), bi koma cînavkên diyarkirî-xwedîtiyê re bi kar aniyê û ji wan re gotiyê ‘cînavkên xwedîtiyê’. Halbûkî xwedîti, tenê bi koma cînavkên diyarkirî bi dest dikeve.

Jixwe cînavkên diyarkirî (min, te, wî/wê, me, we, wan), cînavkên xweditiyê ne. Celadet Elî Bedirxan jî vêya, wisa vegotiyê. Ne hewce ye ku bi cînavkên pêwendiyê re bî bikaranîn:

**Mînak:** Mala min  
Çiyayê me

Di van her du mînan de, xwedîtî heye û xwedîtî ji ber cînavkan pêk hatiye. Cînavkên pêwendiyê jî nehatine bikaranîn.

### Cînavkên Pêwendiyê

Ev di eslê xwe de veqetandek in, lê ji ber ku raveber ji holê radibe, ev qertaf dewsa wê digirin û hevbendiyê didomînin, pêwendiyê çêdikin, dikevin şûna peyvê.

**Mînak:** a dibistanê  
ê pirtûkê  
ên Leylayê

Di van her sê mînan de jî diyar e ku, qertafên “a, ê, ên”ê peywendî çêkire. Loma jî divê cînavkên xweditiyê û yên pêwendiyê neyên tevlihevkirin. Şaşiya pirtûkê ew e ku, mijara ‘cînavkên xweditiyê’ bi ‘cînavkên pêwendiyê’ ve girê da ye. Cînavkên pêwendiyê dema ku bi cînavkên xwedîtiyê re bî bikaranîn, ciyê ew tiştê ku mirov xwediyê wî ye digirin. Pê re pêwendiyê çêdikin.

**Mînak:** Hevala min a min  
Hevalê min ê min  
  
Hevalên min ên min

Ji van mînan jî diyar e ku, ev qertaf pêwendiyê çêdikin, dewsa raveberê digirin, hevbendiyê didomînin.

## 2. CÎNAVKA GIRÊKÎ-(KU)?

Ravekirina brz. Samî Tan ya pirtûkê ev e: “Cînavka girêkî, du hevokan bi hev ve girê dide. Bo nimûne: “Min mirovek dît, ew mirov birayê hevalê min bû.” Mirov dikare van her du hevokan bi alikariya cînavka girêkî /ku/ bi hev ve girê bide.

Wate: “Mirovê ku min dît, birayê hevalê min bû.” Hevokeke dî: “Tiştê ku ji min re got rast derket.”

Tiştê balkêş, raveya ku brz. Samî Tan kiriye ne ya cînavkê ye, ya gihanekê ye! Mijar jî cînavk in. Gotiye wan ‘digihîne’ hev. Ê ku wan bigihîne hev dibe gihanek, nabe cînavk. Cînavk jixwe ji navê xwe diyar e, ciyê navan digire. Dema ku em bala xwe didin mînakên ku hatine dayîn jî, em dibînin ku mînak li hev nakin. Di mînaka jor de du hevokên serbixwe hene, di mînaka jêr de, hevokê ji wan dibe gotineke qalibî. Ka hevokan digihand hev?

“Min mirovek dît, birayê hevlaê min bû.”

“Mirovê ku min dît, birayê hevlaê min bû.”

### Gihaneka “Ku”yê

Ku “Ku” wekî cînavk bê dayîn, ev dê bibe şaşiyê mezin. “Ku” ne cînavk e, gihanek e. Hevokan û qalibên peyvên digihîne hev. Tenê dema ku bibe navê ciyekê, dibe cînavk. Wekî dî, her tim gihanek e. Di raweyan de jî şertê çêdike.

**Mînak:** Hevalê ku hat. (Gihanek-lêkernava rengdêrî-qalib e)

Dema ku diçû. (Gihanek-lêkernava hokerî-qalib e)

Ez hatim ku te bibînim. (Gihanek- du hevokan gihandine hev)

Ku tu werî, ez ê jî bêm. (Raweya şertî)

“Ku” tenê dema ku di şûna “ciyek”î de bê bikaranîn dibe cînavk, wê çaxê jî dibe cînavka pirsîyariyê:

**Mînak:** Tu çûyî ku?

Ez çûm malê.



### 3. HEVALNAV

Di mijara hevalnavan de jî şaşiya ku tê kirin ev e: brz. Samî Tan hinek peyv ji binyada xwe ve wekî hevalnav nîşan dane. Lê peyv, li gorî peywira ku hildigirin ser xwe, dibin hevalnav, ne ku ji binyada xwe ve hevalnav in. Di ravekirina pirtûkê de hatiye gotin: " Her wekî ji navê wê diyar e, hevalnav tê ber navdêran û reng, dirûv û teşeya wan vedibêje. Hin caran hejmar û maweya wan vedibêje." Ji vê raveya pirtûkê jî tê fêmkirin ku hevalnav tena serê xwe çênabin. Rave û mînakên ku hatine dayîn li hev nakin.

Mînakên rast hene di pirtûkê de; lê mînakên ku şaş hatine dayîn jî ev in:

Ev dar hişk e, hevalên min jêhatî ne, birayên min delal in, xaniyê me fireh e, birayê min serhişk e, dara gûz bilind e, ev dar ji hemûyan bilintir, hesin ji pembû girantir e...

Di van mînan de ravek çênebûye ku hevalnav çêbe. Ji xwe me di nivîsa xwe ya dî de jî dabû diyarkirin ku gelek mînakên ku wekî ravekên rengdêran hatibûn dayîn jî, ravekên navdêran bûn.

#### Peyv li gorî Pewyirê

Peyva "xweş"ê dibe ku bibe hevalnav, dibe ku bibe hoker, dibe ku wekî navdêr jî bê bi karanîn. Ev peywir in.

**Mînak:** Xwarina xweş (Bû hevalnav, ji ber ku navê nimand, ravek jî çêbû.)

Xweş dixwe. (Bû hoker, ji ber ku lêkerê bi lêkerê re têkil bû.)

Ev dar, xweş e (Bû navdêr, bi tena serê xwe hat bikaranîn.)

#### Neyîniya Hevalnavan

Bi vê babetê ve girêdayî, neyîniya hevalnavan jî di pirtûkê de dîsa şaş hatiye dayîn:

**Mînak:** Ev xwarin ne xweş e, Ev gotin ne hêja ye,

Di van her du mînakan de jî neyîniyên navdêran hatine dayîn; ne yên hevalnavan.

Ji bo yên hevalnavan, mirov dikare wiha mînak bide:

*Hevalê xweş Hevalê nexweş*

### **Hevalnavên Pirsyariyê**

Divê mijarê de jî pirsên ku hatine dayîn, hevalnavê nadin, pirs şaş in. Pirs dema ku tê kirin, divê di forma hevalnavê de be û bersiv jî dîsa divê hevalnav be. Lê em di mînakan de vêya nabînin.

Çend mînakên ku hatine dayîn ev in:

### **Mînaka yekemîn:**

Li bajêr bihayê nêr giran e.

Bihayê nêr çawa ye?

Giran e.

### **Mînaka diwemîn:**

Dara gûzê bilind e.

Dara gûzê çawa ye?

Bilind e.

Ev her du mînak jî şaş in; lewre pirs jî ne hevalnav e, bersiv jî. Mirov dikare bersivên cuda jî bide van pirsan. Lê di heman mijarê de mînakeke rast jî hatiye dayîn:

Elî hevalekî qenc e.

Elî hevalekî çawa ye?

Qenc e(*Divê bersiv jê bibûya 'hevalekî qenc' bûya.*)

#### 4. HOKER

Em dema ku bala xwe didin mijara hokeran jî, kêmasî û şaşî derdikevin pêşberî me. Bi taybetî mînakên ku hatine dayîn li mijarê nakin.

##### Hokerên Demê

Mînakên ku di vê mijarê de hatine dayîn û şaş in ev in:

Roj bi roj doz geştir dibe.

Sal bi sal karê me ber bi başiyê ve diçe.

Her du mînak jî têkildarê hokerên çawaniyê ne. Peyvên demê, di wateya çawaniyê de hatine bikar - anîn.

##### Hokerên Cî û Bergehê

Di vê mijarê de jî, tevliheviyek heye. Ji bo ku peyv bibin hokerên cî û bergehê divê ji binyada xwe ve cî û bergehê nîşan bidin. Lê brz. Samî TAN her navên ku ciyek nimandine, kirine hokera cî û bergehê.

##### Mînakên ku hatine dayîn:

Ew diçe gundê me.

Mamosta ji dibistanê tê.

“Gundê me” û “Ji dibistanê” mirov dikare bibêje dibin têrkera cî. Ji bona ku bibe hokera cî û bergehê, divê peyv ji binyada xwe ve cî û bergehê nîşan bidin:

Ew diçe jor.

Ew ji wir ve hatin.

Ji ser rabe.

“Jor”, “ji wir ve”, “ji ser” ji binyada xwe ve cî û bergehê nîşan didin, mirov dikare bibêje ku hokerên cî û bergehê ne.

### **Hokerên Çendanî û Hevrûkirinê**

Di vê mijarê de jî, hin mînak şaş hatine dayîn. Ew mînak dikevin mijara hokerên demê û çawaniyê:

#### **Du mînakên ku hatine dayîn:**

Deh bi deh gûzan dixin tûran.

Car caran bi min re xwarinê dixwe

Mînaka yekemîn bersivê dide pirsê “çawa”yê û dibe hokera çawaniyê.

Mînaka diwemîn jî bersivê dide pirsê “kengî” yê û dibe hokera demê.

## GRAMERÊ KIRMANCKÎ/ZAZAKÎ DE

### ZEMÎR

Çekuyêkê herinda nameyan gênê û herinda nameyan de şuxulîyenê zemîr ê. Semedê ke zemîrî bi eslê xo name yê, ê zî sey nameyan ancîyenê û suffiks û prefiksan gênê. Sey nameyan benê zafhûmar.

Nimûne:

“Ehmedî nan werd.” Keso ke nan werdo Ehmed o. Ehmed bi xo name yo. Na cumle de name dîyar o.

La eke ma vajî:

“Ey nan werd.” Na cumle de ma nêvanê Ehmed, Ma vanê ey. Ma, “Ey” herinda Ehmedî de şuxulnenê. “Ey” zemîr o.

Ehmedî o werd. Na cumle de “o” herinda nanî de şuxulîyo, “o” zemîr o.

Ey o verd: “ey” û “o” her dî zî zemîr ê.

“Golika Ehmedî vindî bîya.”

Çîyê ke vindî bîya golika Ehmedî ya. Golika Ehmedî hetê tewirê çeku ra name ya. Na cumle de zî name dîyar o.

Eke ma majê: “Aye vindî bîya.” “Aye” seba ke herinda “Golika Ehmedî” de şuxulîyaya bena zemîr.

Kirmanckî de zemîrî goreyê mana û şeklê xo ra benê şeş tewir î/çeşît î.

1-Zemîrê kesî

2-Zemîrê nîşankerdene

3-Zemîrê persî

4-Zemîrê nedîyarîye

5-Zemîrê wayîrîye

6-Zemîrê xo yî

1-Zemîrê kesî

Kirmanckî de di grûbê zemîrê kesî estî.

a-grûba yewine. (zemîro xoser)

b-grûba dîyine ( zemîro ante)

a-grûba yewine. (zemîro xoser)

ez

ti

o

a

ma

şima

ê

b-grûba dîyine ( zemîro ante)

mi

to

ey

aye

ma

şima

înan

a-zemîrê grûba yewine

Eke kar întansîtîf bo, heme deman de, heme raweyanê waştîşî de zemîrê grûba yewine (zemîrê kesî yê xoserî) benê kerdox.

Nimûne:

Rakewtene rakewt-ene

Demo nikayin

Ez rakewena

Ti rakewena/rakewenî

O rakeweno

A rakewena

Ma rakewenî/îme

Şima rakewenî

Ê rakewenî

Demo ameyox

Ez do rabikewa/ez do ranêkewa (rewşa negatîfî de bi wedarîyeno suffiksê negatîfî “-nê” )

Ti do rabikewî/rabikewa

O do rabikewo

A do rabikewa

Ma do rabikewî/îme

Şima do rabikewî

Ê do rabikewî

Demo vîyarteyo dîyar

Ez bermaya

Ti bermayî/bermaya

O berma

A berma

Ma bermayî/bermayîme

Şima bermayî

Ê bermayî

Demo vîyarteyo nedîyar

Ez rakewta

Ti rakewtî/rakewta

O rakewto

A rakewta

Ma rakewtî/îme

Şima rakewtî

Ê rakewtî

Baldarî:1-Eke kar întansîtîf bo heme deman de grûba yewine (grûba ez zî) beno kerdox û kar suffiksê kesî gêno.

2-Labelê eke kar transîtîf bo demo nikayîn, demo ameyox û heme raweyanê waştîşî (dilek kipleri)

de reyna zemîrê grûba yewine benê kerdox. Yanî heme demê vîyarteyan de eke kar transîtîf bo zemîrê grûba dîyîne benê kerdox.

Tayê nimûneyê bînî

Demo nikayin karo înransîtîf

Ez xo bi xo bermena.

Ti veresîya dare de ronîşena/ronîşenî.

O çarşî ra yeno.

A keyeyê xala xo ra yena.

Ma heme pîya rakewenî.

Şima huyenî.

Ê ver bi Dîyarbekîrî şonî.

Nê nimuneyê cumleyanê corînî de kar înransîtîf o û dem, demo nikayin o. Şima nê cumleyan de vînenê kerdoxê nê cumleyan zî zemîrê gruba yewin ê.

Demo nikayîn

karo transîtîf

Ez wanena

Ti wanenî/wanena

O waneno

A wanena

Ma wanenî/îme

Şima wanenî

Ê wanenî

sedemê demo nikayin bi karanê transîtîfan tayê cumleyê nimûneyî

Ez veresîya dara tuyere de romanî wanena.

Ti her roje erebaya sûre ramenî/ramena.

O ronîştto werdî weno.

A barê giranî bena.

Ma heme pîya wanenî/wanenîme.

Şima çira nê daran şikinenî?

Ê kincan derzenî.



Demo ameyox

karo transîtîf

Ez do biwana.

Ti do biwanî/biwana.

O do biwano.

A do biwana.

Ma do biwanî/îme.

Şima do biwanî.

Ê do biwanî.

sedemê demo ameyoxî bi karanê transîtîfan tayê cumleyê nimûneyî

ez do bişikina.

Ti do bidî viraştene/bida viraştene.

O do kitab biherîno.

A do bida deştene.

Ma do bişayî/bieşkayîme wedarê

Şima do bieşkayî wedarê.

Ê do bieşkayî wedarê.

Kerdoxê nê karan ê zemîrê grûba yewin ê. La seba ke dem, demo vîyarte nîyo bîyê kerdox

Baldarî:

Zemîrê kesî yê grûba yewine, kar transîtîf bo întansîtîf bo demo nikayin, demo ameyox û heme demanê raweyî de benê kerdox.

Tena demê vîyarteyan de û raweya waştîşî yê hikayeyan de zemîrê grûba dîyine benê kerdox.

Nimûne;

Ez nanî wena.....demo nikayin

Ti do erebeyî biramî/birama... demo ameyox

Ganî o robinişo.....raweya ganîyîye

Xwezila/werekna a bêra.....raweya waştîşî

Eke ma bêrî/îme.....raweya şertî

Nika zî ma biewnî nimûneyanê cêrînan ra eke zemîrê kesî demo vîyarteyan de senî bîyê kerdox.

b-zemîrê grûba dîyine

Demo vîyarteyo dîyar

Kar transîtîf

Obje nêrî/yewhûmar

Mi goşt werd.

To roman wend.

Ey tut berd.

Aye o berd.

Ma kelce berd.

Şima dar ard.

Înan kitab wend.

Obje makî/yewhûmar

Mi saye werde.

To awe arde.

Ey here berde.

Aye awe şimite.

Ma bize berde.

Şima awe şimite.

Înan manga dite.

Obje zafhûmar bo

Mi kitabî wendî.

To sayî werdî.

Ey herî berdî.

Aye zebeşî aw dayî.

Ma sayî werdî.

Şima kincî deştî.

Înan fraqi şutî.

Sedemê zafhûmarîye tayê cumleyê nimûne yê bînî.

Nimûne:

Bi karanê întansîtîfan

Karkerî hema nêameyî.....Ê hema nêameyî/ê.....Demo vîyarte .

Lajekî kotî ra yenî.....Ê kotî ra yenî. demo nikayin/ demo hîra.

Golikî ko ra ameybî.....Ê ko ra ameyîbî. mîşlî geçmîş zamanin hîkayesî.

Wendekarî vaz danî.....Ê vaz danî.

Darî vayê vakurî ra qelewîyê.....Ê vayê vakurî ra qelewîyê.

Dewarî nêşonî merge.....Ê nêşonî merge.

Qelemî pêro şikîyê.....Ê pêro şikîyê.

Wendekaran defter berdo.....Înan defter berdo.

Karkeran gure qedînayo.....Înan gure qedînayo.

Dewijan bize berde.....Înan bize berde.

Dewijan bizî berdî.....Înan ê berdî.

Tutan goşt werd.....Înan o werd.

Baldarî:

1-Zemîrê grûba dîyine (grûba anteyî) heme demê vîyarteyan de, demo vîyarteyo nikayin, demo vîyarteyo niyetin (gelecek zamanin hîkayesî) û demê hîkayeyanê raweyan de eke kar transîtif bo benê kerdox.

2-Seke şima zî nimûneyê corênan de vînenî demo vîyarte de “kar goreyê objeyî ancîyo”. Eke obje nêrî bo kar herfe nêgêno, eke obje makî bo kar herfa “-e” gêno, eke obje zafhûmar bo kar suffîksê zafhûmarî “-î” gêno.

Tayê Nimûneyê bînî. Nê cumleyan de zî zemîrê grûba dîyine, zemîrê anteyî biyê kerdox.

Mi roman wend .....demo vîyarteyo dîyar

to roman wendo.....demo vîyarteyo nedîyar

To goşt werdêne.....demo vîyarteyo nikayin.

Ey do nan biwerdêne.....demo vîyarteyo niyetin (sanal gelecek zamanin hîkayesî)

Aye kar kerdêne.....demo vîyarteyo nikayin (şîmdîkî zamanin hîkayesî)

Werekna/wa/xwezila mi nêwerdêne...raweya waşteneşî nikayin

Ganî to roman biwendêne.....demo vîyarteyo dîyar yê ganînîye

Cumleyê corênan de zemîrê anteyî yanî zemîrê grûba dîyine kerdox ê.

Cumle de zemîrê kesî senî benî kerdox û benê obje.

Zemîrê grûba dîyine, demo nikayin, demo ameyox û heme raweyan de kar transîtif bo benê obje, zemîrê grûba yewine zî benê kerdox.

Grûba yewine kerdox grûba dîyine obje

Nimûne:

Demo nikayin

Ez to bena.

Ti ey benî/bena.

O mi beno.

A aye bena.

Ma to benî/îme.

Şima ey benî.

Ê ma benî.

Demo ameyox

Ez do ey biwera.

Ti do aye tepîşî/tepîşa.

O do to bibero.

A do aye bibera.

Ma do to bikişî/îme.

Şima do ey biwendî.

Ê do aye biwendî.

Baldarî:1-Seke şima cumleyanê corênan de zî vînenî, demo nikayin û demo ameyoxî de zemîrê kesî yê yewine benê kerdox û zemîrê kesî yê dîyine zî benê obje. Kardar zî goreyê kerdoxî formule beno.

2-Eke grûba yewine kerdox bo, grûba dîyine bena obje, eke grûba dîyine kerdox bo grûba yewine bena obje.

Grûba dîyine kerdox, grûba yewine obje ya.

Nimûne

Demo vîyarteyo dîyar

Mi a berde.

To ez berda.

Ey o berd.

Aye ti berd/berde.

Ma to berd.

Şima o berd.

Înan ê berdî.

Mi ti kişta/kiştî.

Mi o kişt.

Mi a kişte.

Mi ma kiştî.

Mi şima kiştî.

Mi ê kiştî.

Demo vîyarteyo nedîyar

Mi a berda.

To ez berda.

Ey o berdo.

Aye ti berda/berdî.

Ma şima berdî/îme.

Şima ma berdî.

Înan ê berdî.

Demo vîyarteyo nîyetin(Gelecek zamanin hîkayesî/Sanal geçmîş zaman)

Mi do a biberdêne (onu goturecektîm.)

To do ez biberdêne

Ey do o biberdêne

Aye do ti biberdêne

Ma do şima biberdêne

Şima do ma biberdêne

Înan do ê biberdêne

Demo vîyarteyo nikayin (şîmdîkî zamanin hîkayesî)

Mi a berdêne

To ez berdêne

Ey o berdêne

Aye ti berdêne

Ma şima berdêne

Şima ma berdêne

Înan ê berdêne

Demo vîyarteyo nedîyar o verên(mişli geçmiş zamanin hikayesî)

Mi a berdîbî

To ez berdîbîya

Ey o berdîbî

Aye ti berdîbîy/berdîbîya

Ma şima berdîbîy

Şima ma berdîbîy

Înan ê berdîbîy

Baldarî:1-şima zî vînenî, demo vîyarteyo dîyar, demo vîyarteyo nedîyar de û Demo vîyarteyo nîyetin û Demo vîyarteyo nikayin de zemîrê kesî yê dîyine benê kerdox, zemîrê kesî yê grûba yewin zî benê obje. Kardar zî goreyê objeyî formule beno.

2-Kirmanckî de zemîrê kesan de “ma” û “şima” herdî grûban de zî eynî yê.

2-Zemîrê nîşankerdene/zemîrê nîşanî

Objeyo ke ma namê înan nêdanê, la ma herinda nameyê înan de cayê înan îşaret kenê, zemîrê nîşankerdene yê. Yan zî zemîrê îşaretî yê. Goreyê tarîfê rastnuştîşê “Grûba Xebate ya Vate”yî zî wina yo: “Zemîrê nîşanî, ê zemîrê yê ke gama ke merdim çîyêk yan zî çîyan îşaret keno-bê ke nameyê çî/çîyan bi xo vajo-xebitneno”.rîpel 65.

Nê zemîrî goreyê cayê dûrî û cayê nêzdî ancîyenê. Reyna nê zemîrî seke şima cêr de zî vînenê xo mîyan de benê di grûbî.

Baldarî: seba ke sifetê nîşankerdene yê û zemîrê nîşankerdene yê yew ê (eynî yê) ganî merdim nêkero têmîyan û şuxulnayîş de merdim hîşar bo.

Nimûne:

O lajek huyeno. Çekuya “o”yî lajekî mojnena coka “o” sifet o.

O huyeno. Çekuya “o”yî herînda nameyê kesê ke huyeno girewto û cayê eyî nîşan dano coka zemîr o.

zemîrê nîşankerdene

a-grûba yewine (grûba xosere)

Grûba yewine

(Grûba xoser)

Seba nêzdî

No

Na

Nê

-----  
Seba dûrî

O

A

Ê

grûba dîyine (grûba ante)

seba nêzdî

Ney

Naye

Nînan

-----  
Seba dûrî

Ey

Aye

Înan

Baldari: Zemîrê nîşankerdeneyî yê grûba yewine karo întansîtîf de heme deman de û heme raweyan de benê kerdox.

Nimûne:

Bi karanê întansîtîfan

Seba nêzdî

No şono/şino ...demo nikayin

Na şona/şina.. demo nikayin

Nê şonî/şinî.....demo nikayin

Nê do şorê.....demo ameyox

Seba dûrî

O şî.....demo vîyarteyo dîyar

A şîya.....demo vîyarteyo nedîyar

Ê do şorî.....demo ameyox

Tayê cumleyê nimûneyî

Wa na şora ..raweya emrî/fermanî

No şîyêne .....demo nikayino vîyarte

Eke ê bêrî xeylî ardim beno. (şert)

Werekna nê bêrî. (waştene)

Werekna no biameyêne.

Werekna a bişîyêne: (waştene) (demo vîyarteyo nikayin şîmdîkî zamanin hîkayesî )

Eke o bişîyêne ez nêameyêne.(raweya şertî yê hîkayeyî)

Eke na biameyêne o zî amêne

Eke o ame.....(Şert. Demo vîyarteyo dîyar).

Eke o nêame...(Şart.Demo vîyarteyo dîyar seba negatîfî).

Eke o ameyo ez şona/şina. (şart.....demo vîyarteyo nedîyar)

Nimûneyanê corênan de zî aseno, eke kar întansîtîf bo zemîrê nîşanî yê grûba yewine heme deman de beno kerdox.

Baldarî:

Zemîrê nîşankerdeneyî, yê grûba yewine karo transîtîfî de, demo nikayin, demo ameyox û heme demê raweyan de benê kerdox.

Nimûne:

Bi karanê transîtîfan

No weno. (demo nikayin) (n)

Na wena. (demo nikayin) (m)

Nê wenî/ê (demo nikayin) (zh)

O weno. (demo nikayin) (n)

A wena. (demo nikayin) (m)

Ê wenê/î. (demo nikayin) (zh)

No do boro (demo ameyox) (n)

Na do bora (demo ameyox) (m)

Nê do borî (demo ameyox) (zh)

O do boro (demo ameyox) (n)

A do bora (demo ameyox) (m)

Ê do borî. (demo ameyox) (zh)



Tayê cumleyê nimûne yê binî

No weneno....demo nikayin

Na wanena....demo nikayin

Nê wanenê....demo nikayin

O do biwano..demo ameyox

A do biwera...demo ameyox

Ê do biwanê

Eke ê vêşan manenê, ez nêwena (şart)

Eke nê bişikîtêne.. îstek kîpî. (Şîmdîkî zamanin hîkayesî/demo vîyarteyo nikayin)

Eke a vato..şart kîpî.mîşlî geçmîş zaman demo vîyarteyo nedîyar.)

Werekna o biwano. Keşke o okusa.îstek kîpî genîş zaman

Werekna nê biwendêne keşke bu okusa îstek kîpî. (Şîmdîkî zamanin hîkayesî/demo vîyarteyo nikayin)

Nê do borî/ê (demo ameyox)

O do boro (demo ameyox)

A do boro (demo ameyox)

Ê do borê/î (demo ameyox)

b-grûba dîyine (yê ante)

ney werd.....demo vîyarteyo dîyar

naye werd.....demo vîyarteyo dîyar

nînan werdo.....demo vîyarteyo nedîyar

ey werd.....demo vîyarteyo dîyar

aye werdo.....demo vîyarteyo nedîyar

înan werd.....demo vîyarteyo dîyar

ney do biwerdêne.....demo vîarteyo nîyetin (gelecek zamanin hîkayesî)

naye do biardêne.....demo vîarteyo nîyetin (gelecek zamanin hîkayesî)

nînan do biwendêne ..demo vîarteyo nîyetin (gelecek zamanin hîkayesî)

ey ardêne.....

aye ardêne

înan ardêne

Cumle de şuxulnayîşê zemîrê kesî yê xoser û yê ante, zemîrê nîşankerdeneyî û sifetê nîşankerneyî

Zemîrê kesî

a-grûba yewine. (zemîro xoser)

ez

ti

o

a

ma

şima

ê

b-grûba dîyine ( zemîro ante)

mi

to

ey

aye

ma

şima

înan

zemîrê nîşankerdeneşî

Grûba yewine (Grûba xoser)

Seba nêzdî

No

Na

Nê

-----  
Seba dûrî

O

A

Ê

grûba dîyine (grûba ante)

seba nêzdî

Ney

Naye

Nînan

-----  
Seba dûrî

Ey

Aye

Înan

Sifetê nîşankerdeyî

grûba xoser û objeyê nêzdî

no kitab

na qeleme

nê qelemî

-----  
grûba xoser û objeyê dûrî

o kitab

a qeleme

ê qelemî

grûba anteyî

nêzdî

nê kitabî(nêrî)

na qeleme(makî)

nê kênekî/kênekan(zafhûmar)

-----  
dûrî

ê kitabî (nêrî)

a qeleme (makî)

ê merdiman (zafhûmar)

cumleyê nimûneyî

zemîrê nîşankerdeneyî cumle de senî benê kerdox û benê obje

Grûba yewine/grûba xoser kerdox, grûba dîyîne/grûba ante obje

Demo nikayin

No naye ano

No ney ano.

No înan ano.

„„„„„„„„

Na naye ana.

Na ney ana.

Na înan ana.

Nê naye anî/ê.

Nê ney anê/î.

Nê înan anî/anê.

O ey/ney ano.

A înan/ney ana.

Ê ey/naye/nînan anî/ê.

Demo ameyox

No do naye bîyaro.

Na do ney/nînan bîyara.

Nê do ey/aye bîyarî/bîyarê.

O do aye bîyaro.

A do naye bîyara.

Ê do înan bîyarî/bîyarê.

Demo vîyarteyo dîyar

No ey ard.

Na aye arde.

Nê ey ard.

O înan ardî/ê.

A aye arde.

Ê ey ard.

Demo vîyarteyo nedîyar

No ney ardo.

Na naye arda.

Nê ney ardo.

O înan ardî.

A no ardo.

Ê nînan ardî/ardê.

Grûba dîyîne/grûba ante kerdox, grûba yewine/grûba xoser obje

a-Demo vîyarteyo dîyar

b-Demo vîyarteyo nedîyar

Baldarî: kirmanckî de grûba dîyîne demo nikayin û demo ameyoxî de nêbeno kerdox.

a-Demo vîyarteyo dîyar

seba nêzdî

Ney no werd.

Naye no werd.

Nînan no werd.

Ney na werde.

Naye na werde.

Nînan na werde.

Ney nê werdî.

Naye nê werdî.

Nînan nê werdî.

-----  
Seba dûrî

Ey no werd.

Aye no werd.

Înan no werd.

Ey na werde.

Aye na werde.

Înan na werde.

Ey nê werdî.

Aye nê werdî

Înan nê werdî.

b-Demo vîyarteyo nedîyar

seba nêzdî

Ney no werdo.

Naye no werdo.

Nînan no werdo.

Ney na werda.

Naye na werda.

Nînan na werda.

Ney nê werdî/ê.

Naye nê werdî/ê.

Nînan nê werdî/ê.

-----  
Seba dûrî

Ey no werdo.

Aye no werdo.

Înan no werdo.

Ey na werda.

Aye na werda.

Înan na werda.

Ey nê werdî/ê.

Aye nê werdî/ê.

Înan nê werdî/ê.

3-zemîrê persî

Zemîrê ke cayê nameyan bi rayîrê persî bigêrê, zemîrê persî yê.

Kam

Çi

Çiçi

Kamcîn/kamcîne

Bê nê zemîrê corênî tayê edatî zî estê ke ê zî goreyê rewşa nameyan sey zemîrê persî şuxulîyenî.

nimûne

Kam/kame: kam yeno. Kamî va. Kame amî/eye. O kam o. a kam a. Kam nê kitabban herîna.

Kamî

Nê cumeyî zî bi edetan virazîyê.

Kamî ra: mi kamî ra vato. Ey kamî ra girewto. Nê çîyan kamî ra girewtê.

Kamî de: kam kamî de qisey keno. Kamî de kitab esto. Ey no kamî de girewt.

Ti çi wazena.

Çi kewt mîyanê birrî?

A çika/çîya to ya.?

Ti kamî vînena.?

Kamcî bîyo kan?

Kamcî şî

Kamcî rindek o?

Kamcîye rindek a?

Ti çend rojî manena?

Çend qelemê to estê?

Ti çiqas wazena

Şona kotî

O kotî yo (o nerededîr)

A kotî ya?

O key yeno

Ti çira nêgureyena/sen neden çalişmîyorsun. Ez nêweşa coka

4-zemîrê nedîyarîye

Zemîrê ke cay kamcî nameyî girewtê, dîyar nêbê ê zemîran ra vajîyenî.

Tayêne keyeyê xo bar kerd şîy

Tayê şimitiş ra hes kenê

Pêrunê nan werdo

Her kes ameyo

Tu kes nêşino

5-zemîrê wayîrîye

Kirmanckî de yew heb tena zemîrê wayîrîye esto. (ê/yê)

Gayê min o

Ê min o

O yê min o

No zemîr zafane îzafeya nameyî û îzafeya sifati rey de şuxulîyeno. Ma vajîme:

Hîkayeya Ehmedî. Nê îzafe de seba ke hîkaye makî ya tamambîyaya seba wayîrî herfa “a” girota.

Kitabê Ehmedî. Tîya de zî seba ke tamambîyaya nêrî yo seba wayîrîye temambîyaya “ê” girota.

Kitabê Ehmedî. Tîya de zî kitabê Ehmedî zafhûmar o. Reyna “ê” seba zafhûmarî herfa wayîrîye ya.

Ma şikenê naye ra vajê suffîksê temambîya ya.

Tayê nimûneyî

Nêrî

Herê mi..... ê mi

Golikê to..... ê to

Berê ey.....ê ey

Kitabê aye.....ê aye

Computurê ma.....ê ma

Nanê şima.....ê şima

Tutê înan.....ê înan

Makî

Saya mi.....ê mi

Hera to.....ê to

Golika ey.....ê ey

Qelemma aye.....ê aye

Masaya ma.....ê ma

Çaya şima.....ê şima

Dara înan.....ê înan

Zafhûmar

Sayê mi.....ê mi

Herê to..... ê to

Qelemê ey.....ê ey

Berê aye.....ê aye

Qelemê ma.....ê ma

Nanê şima.....ê şima

Darê înan.....ê înan



6-zemîrê “xo” yî

No twir zemîr reyna ageyreno xoser. No zemîr bi heme zemîranê kesî rey de şuxulîyeno. No zemîr suffiksan û prefiksan nêgêno. Formê ey yê zafhûmarî çinîyo, la goreyê manaya xo zafhûmarî îfade keno.

A bi xo şîya Dîyarbekir.

O xo ra hes keno

Ti dersa xo xebetîyena.

O birayê xo beno

Estorê xo yê rindekî şîyê.

Mi xo da kişta

To xo arê da.

Aye xo nimita

Şima xo rê roman anê

Ma derdanê xo vajî.

Şima bi xo şinî. 8pekîştîrma zemîrî)

zemîrê “ci” yî

Kirmanckî de yew zemîrêko bîn zî esto ke ey ra vanê “ci” yan zî zemîrê “ci” yî.

Ci: herinda kesê hîreyên gêno/gêna/gênî. Hem herinda “o” hem herinda “a” hem zî herinda “ê” de şuxulîyeno/a/ê.

Tayê nimûneyî

Mi ci ra vat.

Ez ci ra vana.

Ez ci resena.

Ci ra vace

Ci ra pey

Şo xebere biresêne ci.

“Awa sîya gêra ci”.

“Badî pê birê ci ame”.

“Bayê ci ame ê kerdê têra.”

“Birê ci xergelê çîke rê nêbenê”.

“Cayê ci, ca keno”.

Keso ke ti xo ci resnê estê”.

“Destê ci cale eştê”.

## Awayê nivîsîna lêkera alîkar ya dema bê

### *Zana Farqînî*

Di zimanê me yê nivîskî de qertafa dema bê bi awayên ji hev cihe tê nivîsandin. Heta her redaksiyona weşanekê der barê awayê nivîsîna vê qertafê de xwedî biryarekê ye.

Nivîskar bi awayekî dinivîsîne, redaksiyon bi awayeki din ji xwe re sererast dike. Ev yek jî dibe sedema tevlihevî û nerazîbûnan. Tişteki balkêş e, tenê der bare vê qertafa hanê de du awayen nivîsînê hene. Qertafên demê yê din hemû bi lêkerê ve tînin nivîsandin. Tenê ev qertafa dema bê yan bi cînavkê ve yan jî bi tena sere xwe tê nivîsandin. Divê ev cudatî ji holê rabe. Niha em li ser ve yekê rawestî û ramana xwe derpêş bikin. Di zimanê me de deh cureyên peyvê hene ku nemir Celadet Bedirxan ew bi navê "birên qisetê" navandine.

Em van cureyên peyvên (ango texlîtên bêjeyan) bidin xuyakirin: Navdêr, veqetandek, pronav (cînavk), jimarnav, lêker, rengdêr, hoker, daçek, gihanek û baneşan. Ji van her pêncên pêşîn guhêrbar û her pêncên din jî neguhêrbar in. Di nav van birên qisetê de tenê veqetandek bi tena sere xwe nayên nivîsandin. Lê her neh cureyên din bi sere xwe ne û bi peyvên din ve nayên nivîsandin. Ji bilî ku gava bi wan navên hevedudanî û dariştî bînin çêkin. Wekî din jî hin awarte hene. Li aliyê din, ew ji cureyên peyvên cuda tînin nivîsandin. Vekîta wan ango rastnivîsa wan wiha ye. Ligel vê yekê, gava terkîb bînin çêkin, an jî peyv bînin tewandin, dengî bi hin cureyên peyvên ve dibin. Em dikarin encameke wiha ji ve rewşê derxin. Nexwe ji ber ku cînavk jî cureyeke peyvê ye, ji bilî ku di hin rewşan de qertafa tewangê lê zêde dibe, dive ku ew bi tena serê xwe be. Lê mixabin nemir Celadet Bedirxan qertafa dema bê "ê" bi cînavkê ve nivîsiye, îcar gava ku qertafa dema bê mina "dê" bi kar aniye, ji

cînavkê cuda nivîsiye. Her wiha gava ku ev qertafa dema bê wekî "wê" tê bikaranîn jî dîsan, bi tena serê xwe tê nivîsandin.

Em wiha bibêjin: Qertafa dema bê di rastiya xwe de "dê" ye, lê bi awayeki giştî mîna "ê" tê bikaranîn. Îcar carinan mîna "wê" jî tê bilêvkirin ku ev şêwe tenê ji bo kesê sêyemin ê yekejimar û yê pirezimar tê bikaranîn. Li vir pirs ev e, gava ev qertaf wek "ê" tê bikaranîn bi cînavkê ve, lê belê gava wek "dê" û "wê" tê bikaranîn, îcar ji cînavkê cuda tê nivîsandin. Çimaş Bi ya min tu sedemeke rêzimanî û ya wateyî nîn e.

Ji bo hin kesan bûye adet an jî, li gorî hin kesan di zimanê devkî de gava ev qertaf mîna "ê" tê bikaranîn, wekî bi cînavkê ve be, tê bilêvkirin, loma jî bi cînavkê ve tê nivîsandin. Vekita zimanekî li gorî zimanê devkî nabe ku bê tespîtkirin. Ji bo vekîtê divê ku rêziman esas be. Jixwe pîrê vî karî Celadet Bedirxan bi xwe jî di Hawarê de, (hejmara 28, rûpel 11) der barê vekîtê de wiha dibêje: "Qeydeyên vekîtê ji tevayiya gramêrê dertên.

Di bihebebûna bêjeyan de qeyda gelemper ew e ko her bêje bi serê xwe tete nivîsandin û bi bêjeyên din ve nabin; ji hin awartan pê ve." Bi rastî jî gava em li gorî zimanê devkî vekîta xwe tespît bikin, gerek em niha dev ji gelek rêzik û qaydeyên xwe yên vekîtê berdin.

Hema bala xwe bidinê ku hemû qertafên lêkera bûnê, em di dema kişandina navdêr û rengdêran de cuda dinivîsin, lê di wexta bilêvkirinê de mîna ku pê ve bin, em dixwînin û bi lêv dikin. Nexwe, divê em xwe bispêrin gramerê, ne ku awayê zimanê devkî ji xwe re rast û durist bibînin. Wek encam; hewce ye ku em qertafa dema bê (ê, dê û wê) ji cînavkê cuda binivîsin. Jixwe em tev qertafa dema bê "dê" û "wê" (ku ev ji "ew ê" pêk hatiye) ji cînavkê cihê dinivîsin.

Lê bi tenê di warê awayê nivîsîna qertafa dema bê "ê" de cudahî heye. Hin ji me bi cînavkê ve û hin ji me jî, ji cînavkê cihê dinivîsin. Bi ya min gerek ew jî, ji cînavkê cuda bê nivîsandin. Ji bo ku bi cînavkê ve bê nivîsandin ez sedemeke mantiqî nabînim. Eger "dê" be jixwe em cuda dinivîsin, lê eger bi awaye "ê" be em bi cînavkê ve dinivîsin, gava pê ve be gelo wateyeke din jê diçeş Na. Hinceta ku ji aliyê telafûzê ve wisan sivik e jî, bi ya min ne rast e. Çimkî em nikarin xwe bispêrin rêzik û qaydeyên zimanê devkî. Sûd û kelk di dubarekirinê de heye.

Ji bo mijar û dabaşa vekît û rastnîvîsê jî, divê ku em xwe bisperin rezikên rêziman û gramerê. Rênîşander û rênima divê ku ev rêziken rêzimanê bin. Ne tiştên tercîhî û subjektîf bin ku ev li gorî kesan guhêrbar in.

## Baneşan

*Abdullah Karabax*

### Nasîn

- a. Peyv û dengên ku hêstan; bi kovan û nayîrînan, bi tirs û şayîşan, bi şaşwaziyan, bi heciban û hejmetkariyan, bi şahî û dilxweşiyên, bi îkaz û şiyarkirinan, bi fermanan, bi gazîkirinan, bi mixab û nifiran, bi nazaketan û bi hwd. diyar dikin re baneşan tê gotin.
- b. Hêmanên ku di binyatên xwe de baneşan in, ev neguhêrbar in.
- c. Gelek peyvên din(navdêr, cînavk, lêker, hoker, daçek, hwd.) jî bi erkên baneşanî bikar tên, di yê hevedudanî de û hwd. cih digirin.
- ç. Di her hevokên baneşanî de peyv û dengên baneşanî nîn in. Ji ber ku hin hevok bêyî wan, awayê baneşanî diparêzin.

### Destpêk

---

Çend mînak ji bo bikaranînên nîşandeka baneşanê(!) :

1. Nîşandeka baneşanê(bangnîşan), tê dawiyê hevoka baneşanî :

Ax serê min diêşe!

Ravek 1 : Ji aliyê baneşanê ve hemî hêmanên hevokê hemta ne.

2. Nîşandeka baneşanê, tê dawiyê peyva baneşanê û ya hevoka duyemîn :

Ax! Serê min çawa diêşe!

Ravek 2 : Li vir du hevok hene; ji aliyê baneşanê ve ev, wek hev hemta ne.

3. Peyv an peyvên baneşanî, bi bêhnokê tên veqatandin û nîşandeka baneşanê diçe dawiya hevokê :

Ax, êşa serê min her şev giran dibe!

Ravek 3 : Peyva baneşanê(ax); bi awayekî lêrûniştî, çalakiya êşê nîşan dike û nîşandeka baneşanê wan bi hev ve girê dide.

A) Beşên baneşanan :

Gelek baneşan, bi wate û erkên xwe di hevokan de cuda cuda bikar tên. Mirov dikare wan li deh beşan dabeş bike û wiha vekolîne :

Mînak 537/1 : Baneşanên kovan û nayîrînan diyar dikin :

a. Ji yê peyv û dengên baneşanî : Ax! Ay! Hey lê/Hey lo! Of! Oy!

Wî! Wex/Wax! Wey/Way! Wey lê/Wey lo!

Qursên Kurdî, A. Karabax

Bikaranîn :

Ax kurê min nexweş bûye!

Ay! Êşa serê min rabû!

Hey lê, dîsa dilê min dikele!

Hey lo, bê mala me!

Of ev çi êş e!

Oy derdê bê derman!

Pîrika dengbêj her ku dihat dawiya bendekê, digot : “Wî! Wî! Wî!..”

Wex! Agir bi mala min ketiye!

Wey zarokek di avê de fetisiye!

Zarokek di avê de fetisiye, wey!

Wey lê, ev çi kul e ku kes pê nizane!

Ev çî kul e ku kes pê nizane, **wey lê!**

**Wey lo**, hişkesaliyê gundê me wêran kiriye!

Hişkesaliyê gundê me wêran kiriye, **wey lo!**

**b. Ji yê n peyvên navan : Hawar! Lorî!**

**Bikaranîn :**

**Hawar** Xwedêyo, vê nexweşiyê zarok ji me re nehîştin!

Min xwedî kir, xaka reş bir; **lorî** berxê min **lorî!**

**c. Ji yê n biwêjî : De lorî! Ax li min ezê/ezo! Wey li minê/Wey li mino!**

**Bikaranîn :**

Diya te mir, **de lorî** qîza min **lorî!..**

Ez ê çawa bikim vê şîrmijê, **ax li min ezo!**

**Wey li minê!** Ji min re hatiye dirûtin kirasê bêkesiyê!

**Mînak 537/2 : Baneşanên tirs û şayîşan diyar dîkin :**

**a/1. Ji yê n peyv û dengên baneşanî : Him! Pix! Wex! Wey! Wiş!**

**Bikaranîn :**

**Him**, te ev ji min re negotibû!

**Pix!** Kurino, sinetker têye!

**Wex** ji warê wan re, tu malbat lê nemane!

**Wey** pergala me qediyaye!

**Wiş** zarokino! Baş guhdarî bikin, a niha şano dest pê dîke!

**a/2. Ji yê n peyv û dengên baneşanî, ji bo heywanan : Hoşt!**

**Bikaranîn :**

Qursên Kurdî, A. Karabax

**Hoşt** kûçikê şîrheram! **Hoşt** be, ha!



b. Ji yê peyvên navan : Hawar!

Bikaranîn :

Hawar! Şerê birekujiyê dest pê kiriye!

c. Ji yê biwêjî : Hawar li min/me! De bêje, hawar li min/me!

Bikaranîn :

Mar ketine warên me, hawar li min!

Hawar li me! Sermê, kulîlkên dar û berên me şewitandine!

Lehiya biharê em bêmal kirin, de bêje, hawar li min!

Mînak 537/3 : Baneşanên şaşwaziyan diyar dikan :

a. Ji yê peyv û dengên baneşanî : A! Aha! Erik/Herik! He! Tew! Wiş! Wî!

Bikaranîn :

A! Ew qîz çi xweşik dilîze!

Aha! Havalê Nalînê jî lîstikvan bûye!

Erik, hemû ciwanên vê taxê lîstikvan bûne!

Wêneyên dîwarên şaredariyê, we çêkiribûn, he?!

Tew! Stranbêjê me jî dibêje : “Ez îşev nikarim bistrêm!”

Wiş, qîza wan reviyê ha!

Wî! Di gundekî de tu kesî nan nedayê parsekê!

Wî, min navê te bîr kiriye!

b. Ji yê peyvên navan : Hawar!

Bikaranîn :

Hawar, zîlamên we navê welatî xwe nizanine!

Mînak 537/4 : Baneşanên eciban û hejmetkariyan diyar dikan :

a. Ji yê peyv û dengên baneşanî : Bijî/Bijîn! Çi! Eh! Ha ho! O! Peh/Pehe!

Bikaranîn :

Gulê got : “ Dayê, min xelata yekemîn girt!”

Diya wê : “**Bijî** qiza min!”

Memê got : “Bavo, pola me bi basketbolê bi ser ket!”

Bavê wî : “ **Bijîn!**”

Memê : “ Bavo, di koma basketbolê de ez jî hebûm!”

Bavê : “Her **bijî**, lawê min!”

Qursên Kurdî, A. Karabax

**Çi** bajarekî dîrokî ye!

**Eh** baş e, we ji zarokan re şekir aniye!

**Ha ho!** Hevalno bibezin, ev çî masî ne!

**O!** Tu mezin bûyî, emrê te dirêj be!

**Peh!** ew çî bajarekî xweşik bûye!

**b. Ji yên biwêjî : Çi zehmet e!/Çi zehmet in! Serkeftin!**

**Bikaranîn :**

Bavê Rewşenê : “Ew çemekî har e, pireya wî sê caran hatiye çêkirin!”

Mêvan : “**Çi zehmet e!**”

Lîstikvanên koma taxê derketin ser qada futbolê.

Temaşevan diqîrîn : “**Serkeftin!..**”

**Mînak 537/5 : Baneşanên şahî û dilxweşiyan diyar dîkin :**

**a. Ji yên peyv û dengên baneşanî : Aferîn! Ay! Gidî! Hah! Hey gidî! Ox!**

**Bikaranîn :**

Gulçînê got : “Dayê, ez dê xwendina xwe bidomînim.”

Diya wê : “**Aferîn** delala min!”

Evîndar dibêje : “Min îro yara xwe dîtiye, **ay** dilê min!”

Nalîn lê vegerî û got : “Gidî, wiha mebêje!”

Hah, ev jî bi hatina we gelekî kêfxweş bûye!

Hey gidî dilo, bi baranê ve bi ser kê de dibarî..!

Ox! Ev çi dîlan e lê, ha bireq(i)sin qîzino!

b. Ji yên peyvên navan : Tîlîlî!

Bikaranîn :

Her ku diçû govend şên dibû û jinan tilîlî dikirin : “Tîlîlîlîlîlî..!”

Mînak 537/6 : Baneşanên îkaz û şiyarkirinan diyar dikan :

a/1. Ji yên peyv û dengên baneşanî : Biv! Çûçê! Viş/Viş! De! Dê! Cece! Gelî! Hey!

Bikaranîn :

Zarokê destê xwe dirêjê êgir dikan.

Dayikê got : “Biv! Çeçê te bişewite!”

Zarok ji cihê xwe rabû.

Dayikê got : “Çûçê, kurê bavê xwe!”

Qursên Kurdî, A. Karabax

Zarok digiriya.

Dayikê : “Wiş!” got, “kurê min megirî!”

De, ev xebat wisa tê meşandin!

Dê bixebitin, em vî karî biqedînin!

Pêlevan, destê xwe li singê xwe xist û pê re qîriya : “Ceceeee!”

Gelî xebatkaran, em sibehê jî li vir dixebitin!

Hey keçê, divê ku tu biçî mala me!

a/2. Ji yên peyv û dengên baneşanî, bo heywanan : Ço! Çûş! Hoş!

Bikaranîn : Ço! Çûş!

1. Bo heywanan(ker) :

Apê Dildar li kera xwe siwar bû û got : “Ço!”

Apê Dildar, kera xwe li ber deriyê hewşê rawestand û got : “Çûş!”

2. Bo mirovan(argo) :

Apê Dildar : “Kuro, heta ku ez ji te re nabêjim ço, tu nameşî!

Apê Dildar : “Kuro, tu rawestinê jî nizanî, heta ku ez nabêjim çûş!”

Bikaranîn : Hoşt!

1. Bo heywanan(kûçik) :

Kûçikê malê diewitiya. Apê Dildar got : “Hoşt! Hoşt!”

2. Bo mirovan(argo) :

Wê rojê civak di odeya keyatiyê de civiyabû.

Xortekî tasek av ji kalekî dixwest.

Apê Dildar qarî û pê re got : “Hoşt! De rabe ji vir!”

b. Ji yên peyvên navan : Tîlîlî!

Bikaranîn :

Leşker ketibûn nava gund. Qîrewîrê dest pê kir, deh kes hatibûn girtin.

Lê şiyarkirina jinan dewam dikir : “Tîlîlîm..!”

Mînak 537/7 : Baneşanên fermanan diyar dikin(ev bi lêkeran çêdibin) :

a. Ji yên erênî : Bike/Bikin! Bîne/Bînin! Vexe/Vexin! Hwd.

b. Ji yên neyînî : Meke/Mekin! Meyne/Meynin! Vemexe/Vemexin! Hwd.

Mînak 537/8 : Baneşanên gazîkirinan(banglêkirinan) diyar dikin :

Qursên Kurdî, A. Karabax

a/1. Ji yên peyv û dengên baneşanî :

Ey! Hê/Ho! Hey! Hey gidî! Hey lê/Hey lo! Lê/Lo!

Bikaranîn :

Ey zilam(i)no, bibezin!

Hê Gulê, binêre, Nalîn tê!

Ho Azado, raweste, ez têm!

Hey porzerê, te mala min xera kir!

Hey gidî çavreşê, ez li benda te me!

Hey lê dilnarînê, bê cem yarê xwe!

Hey lo lawo, ez bang dikim, tu çima deng nakî!

Lê devbikenê, hêdî hêdî bibêje!

Lo, de bilezîne, em dereng man!

a/2. Ev baneşan pirjimar bikar tê : Gelî!

Bikaranîn :

Gelî mirovan, hun bi xêr hatin!

Gelî mirovino, hun bi xêr hatin!

b/1. Ji yên peyvên navdêrîn, yekjimar, nêr(-o), mê(-ê) :

Cano/Canê! Kuro/Keçê! Bavo/Dayê! Mêriko/Jinikê! Havalno/Hevalê! Çavreşo/Çavreşê! Serzero/Porzerê! Kewo/Kewê! Welato!Xakê! Hwd.

b/2. Ji yên peyvên navdêrîn, pirjimar, nêr/mê(-(i)no) :

Canino/Canino! Kurino/Keçino! Bavino/Dayino! Mêrikinno/Jinikino! Havalno/Hevalno! Çavreşno/Çavreşno! Serzerno/Porzerno!Kewino/Kewino! Welatino! Xakino! Hwd.

c/1. Ji yên baneşan û navan, yekjimar, nêr(-o), mê(-ê) :

Hey cano/Hey canê! Lo hevalo/Lê hevalê! Ey bavo/Ey dayê! Hwd.

c/2. Ji yên baneşan û navan, pirjimar, nêr/mê(-(i)no) :

Hey canino! Lo hevalno/Lê hevalno! Ey bavino/Ey dayino! Hwd.

ç. Ji baneşanên ku bi dirêjxwendina tîpên peyvan bikar tên :

Baran | Baraaan! Zîn | Zîneêêêê! Çiya | Çiyayooooo..! Hwd.

Mînak 537/9 : Baneşanên mixaban û nifiran diyar dikin :

a. Ji yên peyvên baneşanî : Ê! Heyf!

Qursên Kurdî, A. Karabax

Bikaranîn :

Ê bes e lê, te em ji guhan de kirin!

Heyf ji we re! We nikariye bi ser kevin!

b. Ji yên biwêjî : Nelet lê bê/bên! Bi derdê giran biketê/biketo! Heyf e!

Çi heyf! Heyfa te/we! Malxerabê(o)! Malik wêranê/wêrano! Hwd.

Mînak 537/10 : Baneşanên nazaketan(silavdayîn, xweşbêşî, xweşmerî, hwd.) diyar dikin :

a. Ji yên silavdayînan(ev peyv di binyatên xwe de ne baneşan in) :

Beyanî baş! Rojbaş! Roja te/we xweş! Êverbaş! Şevbaş!

b. Ji yên xweşbêşiyên(ev peyv di biyatên xwe de ne baneşan in) :

Tu bi xêr hatî/Hun bi xêr hatin! Ser çavan! Bimîne xweşiyê de!

Bimînin xweşiyê de! Oxir be! Mala te/we ava be! Hwd.

c/1. Ji yên nazaketan(ev peyv di binyatên xwe de ne baneşan in) :

Bibore/Biborin! Bibexşîne/Bibexşînin! Derbasî be! Serê we sax be!

Ez benî! Lebê! Norş û can be! Malava! Xwedê ji te/we razî be! Emrê

te/we dirêj be! Cejna te/we pîroz be! Sersala te/we pîroz be! Hwd.

c/2. Ji bo mezinan nazaket(ev peyv di binyatên xwe de ne baneşan in) :  
Bi gelemperî bilî yên rewşên malbatî û yên cancigerî; kesê(a) duyemîn  
ên pirjimar, li şûna kesê(a) duyemîn ê/a yekjimar tên bikaranîn :

Çend bikaranîn :

Biborin! Bibexşînin! Derbasî be! Serê we sax be! Ez benî! Lebê!  
Norş û can be! Mala we ava be! Xwedê ji we razî be! Emrê we  
dirêj be! Cejna we pîroz be! Sersala we pîroz be! Hwd.

B) Ji aliyê peyvsaziyê ve baneşan : Ev li du beşên sereke dabeş dibin :

1. Yên xwerû(sade) : Gelemperiya van, di binyatên xwe de baneşan in.
2. Yên hevedudanî(pêkhatî) : Mirov dikare van li çar beşan dabeş bike :
  - a. Ji yên bi du hêmanan.
  - b. Ji yên dubare.
  - c. Ji yên komebaneşanî.
  - ç. Ji yên biwêjî.

Mînak 538/1 : Baneşanên xwerû :

Ji peyv û dengên banêşanî

: A! Ax! Ay! Biv! Eh! Ê! Gelî! Gidî! Ey! Hey! Heyf! Hoşt! Lê! Lo! Of! Oy! Pix! Tew! Wax! Way! Wey! W  
iş! Wî! Hwd.

Qursên Kurdî, A. Karabax

Mînak 538/2 : Baneşanên hevedudanî :

a/1. Ji yên bi du hêmanan : Ax lê! Ey lê! Ey lo! Hey gidî! Hey lê! Hey  
lo! Lebê! Lêlê! Lolo! Wey lê! Wey lo! Hwd.

Bikaranîn :

Mê : Lêlê(lê+lê)!

Şivanê kal, bangî keça şivan dike lê ew guh nadê û dibeze.

Şivanê kal : “Lêlê, tu çi bûyî hespa berî!”

Nêr : Lolo(lo+lo)!

Şivanê kal, bangî xortê şivan dike lê ew guh nadê û dibeze.

Şivanê kal : “Lolo, tu çi bûyî hespê berî!”

a/2. Ji yê bo heywanan an jî yê argo : Çûş lo! Çûş lê! Hoşt lo! Hwd.

a/3. Ji yê bi peyvên baneşanê û yê din ve pêk tên : De lorî! De hawar!

De biçê/biçin! Ax yadê/yabo! Lê vexwe/vexwin! Lo vexwe/vexwin! Hwd.

b/1. Ji yê dubare : Ay! Ay! Ey! Ey! Hey! Hey! Lê! Lê! Lo! Lo! Hwd.

b/2. Ji yê bo heywanan an jî yê argo : Ço! Ço! Hoşt! Hoşt! Hwd.

c. Ji yê komebaneşanî : De wî! wî! Hey gidî lêlê! Wey lolo! Hwd.

ç. Ji yê bi biwêjî : Ax li min ezê! Ax li min ezo! Hawar li me! Hwd.

C) Di hevokan de bikaranîna baneşanan :

Mînak 539 : Di hevokan de baneşan, çend bikaranîn :

1. Di avaniya dançêkir de : Lê, de wan nûçeyan bide xwendin!
2. Di avaniya tebatî(pasîf) de : Hey rêwiyê, erebeya me hate veherandin!
3. Di hevokên erênî de : Mala we ava be, em gelek dilxweş bûn!
4. Di hevokên neyînî de : Êdî bes e lo, vî dermanî mexe!
5. Di hevokên pirsiyarî de : Lebê ez tê negihîştim, hun dikarin ducar bikin?



## “Zava” û “damad” – anku cudahiyên dengnasî yên kurdî û farisî

### Wekhevî û cudahî

Kurdî û farisî du zimanên îranî ne anku ji eynî binemalê ne. Di wan de gelek tiştên wek hev hene: deng (herf), peyv, qeyd û bendên pirtiknasî (morfolojî) û hevoknasîyê (sîntaks). Bo nimûne, piraniya dengên di kurdî de hene di farisî de jî hene. Bi hezaran peyv wek hev in yan jî pirr nêzîkî hev in. Ji aliyê rêzimanê ve cihê peyvan di hevokê de bi piranî wek hev e.

Lê di navbera van herdu zimanên lêzim de herwiha gelek cudahî jî hene. Di kurdî (bi taybetî kurmancî) de hin deng (herf) hene ku di farisî de nînin. Bo nimûne, di kurmancî de li destpêka peyvê jî bi kêmî du cûreyên dengên Ç, K, P, T hene ku yek jê bipif (req, bi inglîzî “aspirated”) û yê din jî bêpif (nerm, “unaspirated”) in. Lê di farisî de ew herdem li destpêka peyvê req in. Bi sedan yan hezaran peyvên wisa jî di kurdî û farisî de hene ku ne wek hev in. Hin caran hin peyv hene ku wek hev in lê maneya wan di kurdî û farisî de ji hev cuda ye. Ji aliyê rêzimanî ve, bo nimûne, di kurmancî de navdêr ji aliyê rêzimanî nêr yan mê ne lê di farisî de peyvan ti cinsê/zayenda rêzimanî nîne. Kurmancî zimanekî ergatîv e lê farisî zimanekî akuzatîv e: bi kurmancî mirov dibêje “ez dibêjim” lê “min got” lê di farisî de “men mîgoyem” û “men goftem” anku di herdu haletan de di farisî de kirde (men) wek xwe dimîne û lêker jî li gor wî paşpirtia xwe (-em) werdigire.

Di vê kurtevekolînê em ê em tenê li ser cudahiyên dengnasî yên kurdî û farisî rawestin. Em ê nimûneyan bi farisî û kurmancî bidin. Heke behsa zaravayên din yên kurdî neyê kirin, hingê ew jî wek kurmancî ne. Heke ji kurmancî cuda bin, em ê vekirî bibêjin.

## Berhevdana deng

### FARISÎ

### KURDÎ

#### A

#### carinan (H)A/Ê/Î<sup>10</sup>

- Bi piranî di herdu zimanan de A ye
- Di kurdî li destpêkê gelek caran H tê berî wê
  - o F: asan, ahen                      K: hêsan, hesin/asin

#### B

#### V, W

- Di kurmancî û soranî de li nav û dawiyê, di kelhurî, zazakî û hewramî de li destpêkê jî dibe V/W
  - o F: ab, ebr,şeb, leb                      K: av, ewr, şev, lêv

#### D

#### Z, D, -

- Li destpêkê bi F dikare D be û bi K dikare Z be
  - o F: dana, damad,                      K: zana, zava
- Li dawiyê di farisî de D, di kurdî de dikare vala be
  - o F: bad, bûd,                                      K: ba, bû
- Li nava peyvê D di kurdî de heliye û bûye Y yan jî bi temamî rabûye
  - o F: zaden, bûden, K: zan/zayîn, bûn/bûyîn

#### E

#### I

- Bi piranî di kurdî de E ya îranî bûye I
  - o F: kerden, x[v]arden, behar, K: kirin, xwarin, bihar<sup>11</sup>

<sup>10</sup> Bi soranî û bi taybetî jî bi zazakî jî bi piranî A ye.

<sup>11</sup> Bi zazakî jî bi piranî E ye: kerden, werden, wesar

**Ë (Ê-ya kurt)****I**

- Dengê "î" yê tam wek yê kurmancî di farisî de nîne, bûye "ë" ku wek "ê" ye lê kurttir e. Wek "e" ya piraniya zimanên ewropî ye
  - o F: dël                                      K: dil

**G****B, G**

- Carinan V/W ya îraniya kevn yan navîn di farisî de carinan bûye G lê di kurdî de bûye B
  - o farisî: goraz, gorosnê      K: beraz, birsî/birçî
- Lê hin caran di herdu zimanan de jî bûne G:
  - o F: gol, gorg,                      K: gul, gur(g)

**H****S, V**

- Carinan, bi taybetî li nava peyvê di farisî de H lê di kurmancî de S heye:
  - o F: mahî, ahen                      K: masî, asin/hesin
- Carinan jî, bi taybetî li nava peyvê di farisî de H lê di kurmancî de V heye:
  - o F: kolah, kohen, dehan      K: kulav, kevn, dev

**M****V<sup>12</sup>**

- li pey vokalan
  - o F: nam, zemîn, merdom      K: nav, zevî, mirov/meriv
- ne li destpêka peyvê:
  - o F: morden, merdom              K: mirin, mirov
- ne li pey konsonantan:
  - o F: germ                                      K: germ

<sup>12</sup> Di soranî û kelhurî de W ye, di zazakî û hewramî de jî wek farisî M ye. Berê M bû lê di kurdî de guheriye.

**O (lê ji ya kurdî kurttir)****U / I**

- Gelek caran li cihê O ya farisî di kurdî de U yan I heye:
  - o F: kord, bolbol                      K: kurd, bilbil
- Bide ber O ya kurdî ku di farisî de bi piranî wek Û tê gotin

**Ş****H<sup>13</sup>**

- Carinan, bi taybetî li dawiyê
  - o F: goş, çeşm, têşnê                      K: guh, çehv (→ çav), tihnî (> tînî, tî)
  - o

**Û****O**

- Gelek caran li cihê O ya kurdî di farisî de Û heye:
  - o F: rûz                                      K: roj
- Di farisiya devkî de gelek caran Û ketiye cihê A ya farisiya standard û kurdî:
  - o F: dûnisten (= danisten)                      K: zanîn

**V****W**

- Di farisî de dengê W peyda nabe, hevberî W-ya kurmancî di farisî de bi piranî V ye, carinan jî B ye:
  - o F: bergerdan, ebr                      K: wergerandin, ewr

**X****carinan H / K**

- Gelek caran li cihê X ya farisî di kurdî de H yan K heye:
  - o F: xer, xoşk, telx                      K: ker, hişk, tehl

<sup>13</sup> Di zazakî û hewramî de jî wek farisî ye, di soranî de yan hatiye avêtin yan W ye.

**Z**

- gelek caran
  - o F: zen, zindegî
- Lê ne herdem
  - o F: zerd, zemîn

**J**

- K: jin, jiyar
- K: zer, zevî

**Çima “zava” û “damad”**

“Damad” ya farisî maneya “zava” ya kurmancî dide. Ew bi çend dengên xwe ji hev cuda ne. Ya kurmancî bi Z dest pê dike û farisî bi D. Di ya kurmancî de li navê V heye, di ya farisî de M. Ya kurmancî çar-herfî ye, ya farisî pênc-herfî. Di ya farisî de D li dawiyê heye, di ya kurmancî de nîne.

Dîsa jî ev herdu peyv ji eynî rehî ne. Bo isbatkirina vê idiyaya xwe, em ê heman peyvê bi çend ziman û zaravayên din jî bidin:

- kurmancî: zava
- soranî: zawa
- zazakî: zama
- hewramî: zema
- belûçî: zamat
- avestayî: zamater
- farisiya kevn: damater
- farisî: damad

Bi borîna demê re ew guherîna heta ku her yek gihiştiye qalibê xwe yê niha. Lê guherîna dengên wan ne tesedîfî ye. Di gelek peyvên din de jî ev heman guherîn peyda dibin.

Bo nimûne, guherîna D/Z tiştekî gelek berbelav e:

- kurmancî: zanîn
- soranî: zanîn
- zazakî: zanayen

- avestayî: zan-
- pehlewî: dan-
- farisî: dan-isten

- kurmancî: dest
- soranî: dest
- zazakî: dest
- farisî: dest
- avestayî: zeste

- kurmancî: dev
- soranî: dem
- farisî: dehan
- farisiya kevn: defen
- avestayî: zefen

Bi heman awayî guherîna M/V jî diyardeyeke mişe ye:

- F: nam, zemîn, merdom K: nav, zevî, mirov/meriv

Ketina D ji dawiya peyvê di kurdî de jî dîsa berbelav e:

- F: bad, bûd, dad (ji "daden") K: ba, bû, da (ji "daden")

Anku peyvên "zava" û "damad" ne tenê yek lê sê cudahiyên giring yên dengnasiya kurdî û farisî bo me diyar dikin.

**Husein Muhammed**

## Zimanî standard, zimanî yekgirtû, zimanî resmî û mafî zimanî

### *Ce'fer Şêxulîslamî*

Maweyeke mişt û mirrêkî gerim le ser zimanî Kurdî destî pêkirdûwe. Zor kes, le mamosta û şarezay em buwarewe bigre heta qutabîyan û goranîbêjan û xellkî asayîş.

Le ser em base duwawin. Eweş nîşaney girîngî babetekeye. Em witare beşêke lew bas û xuwase û berewpîrî wutarekey mamosta Cemall Nebez deçê, ke lem duwayîyaneda le mallperrî "emiro"da billaw botewe (<http://www.emiro.com/lebirakuciy8.htm>). Ray mamosta Nebez le ser em babete girînge, çunke katêk ew destî be baskirdinî zimanî yekgirtûy Kurdî kird zorbey ew kesaney emirro denûsin dîyar nebûn, lewane minîş.

Min lêre da sereta basî ew xalle behêzaney nûsînekey mamosta Nebez dekem. Paşan basî ewe dekem ke pêm wa nîye mamosta le nêwan ziman û zimanî standardda cîyawazîyekî pêwîstî kirdibê. Her leber eweş, herçend mamosta deyhewê nîşan bida ke hellwêstekey cîyawaze le helwêstî ew 53 kesey ke daway berresmî kirdinî [ ] Kurmancî xuwarû (soranî) yan kird, le rastîda legellyan hawdenge le peyrrewkirdinî aydîolojî netewe- dewllet da, ew aydîolojîyey dellê: yek netewe debê bes yek xak, yek dewllet, yek kultûr û yek zimanî hebê.

Witarekey mamosta Nebez çend xallî girîngî têdaye ke minîş birrwam pêyane. Pêm waye emane girîngin û debê dûpate bibnewe. Em xallane birîtîn le emane:

- "Hemû şêwezar û binzarêk giringî zoy heye û beşêke le zimanî Kurdî".
- Yekdest nebûn û yek nebûnî rênûsî zimanî Kurdî: "deçim" dij be "eçim", ... giriftêkî cîdîdîye bo standardbûnî şêwezarî kurmancî xuwarû.
- Zimanekan carî waye le layen nûseran û hunerweranewe, carî waşe le layen desellatêkewe û be hoy xwêndin û qutabixanewe standard dekirên. Hemû zimanêk boy heye standard bibê.
- Lew bas û xuwasaney duwayîda, tenanet "sûkayetîş be xellkî beromet û zehmetkêşî Badînan û Bakûrî Kurdistanîş kirabû, ke eweş dîyare sêrey roşinbîrî û piley nîştimanperwerî ew kesane pêşandeda ke xoyan kirdûwe be demrrastî Kurd".
- "... Dasepandinî şêwenûsînêk wek standard, le katî êsteda ... Le zîyan bew lawe, hîç encamêkî dîkey nabê".

Destxoşane le mamosta dekem bo hênane gorrî em xalle girîngane. Minîş birrwam bem xallaneye çunke pêw waye beşêkin le ruwangey layengirî le corawcorî û mafî zimanî. Bellam, mamosta amancî dîkey heye bo baskirdinî em xalle girîngane, wate berewpêşewebirdinî bîrurray xoy ke birîtîye le birrwa hebûn be yek zimanî yekgirtû bo hemû netewey Kurd.

Boye mamosta dellê, "... Pêrrewkirdinî 'cût standard'îş, jehrêke bo netewey Kurd". Ber lewe ke bême ser em xalle, ke pêw waye xallî hawbeşî mamosta û pencawsê kesekeye, debê bizanîn ke mamosta ray le ser zimanî standardî Kurdî û zimanî standard be giştî çîye. Pênasekirdinî zimanî standard le layen mamosta Nebezewe rêk nîye legell zimanewanî emirro. Mamosta dellê: "hîç şêwezarêkî nûsînî Kurdî, carê nebûwe be standard". Be ray mamosta, bo standard bûn ewe bes nîye ke zimanêk pêw binûsirê. Başe edî zimanî standard çîye? mamosta Nebez, be pêçewaney zor kesî dîke, her le xorra emane nallê, bellkû pêman dellê ke mebestî le zimanî standard çîye. Denûsê: "zimanî standard, bew zimane degutirê, ke çî le barî rêziman û çî le barî dengnasî û çî le barî ristesazî û çî le barî wuşenasî û çî le barî rênûsewe, şêweyekî qalbbestûy wergirtibê û, şêway destkarî û herkes boxoyî nebê, ke bew zimaneş nûsra, her bew şêweye binûsrê". Be pêw em têgeyştine le zimanî standard, mamosta pêw waye zimangelêkî wekû Farsî û Turkîş hêştta standard nebûn, bellam zimangelêkî wekû 'Errebî û Inglîsî standard bûn. Bellam, le rastîda eger birrwa bikeyn ke zimanî standard her eweye ke mamosta dellê, ew kate natuwanîn be Inglîsîş billêyn zimanêkî standard, herwekî êsta nîşanî dedem.

Êsta ba her ew tarîfey mamosta le zimanî standard be bejnî zimanî Inglîsî bigrîn. Emirro le edebî komellnasî zimanda basî zimane Inglîsîyekan deken, wekû Inglîsîy Birîtanîyayî, Emrîkayî, Hîndî, Sengapûrî, Fîlîpînî û htd. Min lêreda dûy serekî pêkdegirm: Inglîsî Birîtanîyayî û Emrîkayî. Em dû



standarde Inglîsiye le hemû em biwaraneda ke mamosta wekû taybetmendîyekanî zimanêkî standard basyan deka le yekitr cîyawazin:

- - Rêziman: le Inglîsîy Birîtanîyayîda nawêkî ko lewaneye yan formî takî kirdar werbigrê yan formî koy kirdar werbigrê, bellam le Inglîsîy Emrîkayîda, eger naweke tak bê debê formî kirdarîş tak bê û be pêçewane: (Birîtanîyayî: The Kamkars are/is a Kurdiş band.!: Emrîkayî: The Kamkars is a Kurdiş band.)).
- - Dengnasî: cîyawazî rawêjî Birîtanîyay û Emrîkayî le biwarî dengewe zor aşkraye û pêwîst be îsbatkirdin naka. Tenanet le naw xoy Inglîstanîşda xellkî wahren, wekû axêweranî "kaknî", ke lêtêgeyştinyan bo Inglîsîzimananî dîkey Birîtanîyaş zor esteme. Cîyawazî le biwarî dengnasî (fonolojî)şewe heye.
- - Ristesazî: le rîzkirdinî wuşegelişda cîyawazî le nêwan dû şêwe Inglîsiyekeda zore. Bo nimûne, Inglîsîy Birîtanîyay (stop Hiwa going home), bellam Emrîkayî (stop Hiwa from going home). Ew dû şêwe herweha cîyawazin le merr dekarhênanî pîtî te'rîf (the) legell hendêk nawda. Herweha cîyawazin katî bekarhênanî - wuşenasî [morfolojî]: serfî hendêk le kirdarekan le katî rabirdûda cîyawazin. Le Inglîsîy Birîtanîyayîda bo zor kirdaran formî naasayî dekar dekirê bellam le Emrîka herçend forme naasayîyekeş becardê bellam zorbey katan forme asayîyekan kelkîyan lêwerdegîrdirê. Bo nimûne rabirdûy (light) dekirê hem (lit) bê û hem (lighted). Rabirdûy têperr (partîçiple) (gotten) be zorî le Emrîka becardê bellam (got) le Birîtanîya. Be setan nimûne lem cîyawazîyane hen.
- - Rênûs: cîyawazî le biwarî rênûsîşda heye. Her bo nimûne, Birîtanîyayî denûsê (colour) bellam Emrîkayî denûsê (color). Birîtanîyayî denûsê (centre), bellam Emrîkayî denûsê (center). Xallbendîş le nêwan ew dû Inglîsiyeda cîyawaze, be taybet le merr kelikwergirtin le koma (,). Kewabû, yan Inglîsî zimanêkî standard nîye, yan boçûnî mamosta le ser zimanî standard tewaw nîye. Hîç şikim nîye ke zimanî Inglîsî zimanêk, yan zimangelêkî, standarde. (bo agadarî zortir le ser em cîyawazîyane birwane:[http://en.wikipedia.org/wiki/Amerîçan\\_and\\_Britîş\\_Englîş\\_differençes](http://en.wikipedia.org/wiki/Amerîçan_and_Britîş_Englîş_differençes) ).

Eger boçûnî mamosta le ser zimanî standard tewaw nîye, zimanî standard çîye? zimanî standard ew zimaneye ke ber le hemû şit nûsraw bê. Legell eweşda, zimanî standard eweye ke zimanî pêxwêndin, zimanî damûdezga dewletî û medenîyekan û zimanî mîdîya bê. Bew pêyeş hem Kurmancî Xuwarû û hemîş Kurmancî jûrû standardin, çunke herdûkyan em karaneyan pêkirawe û dekirê. Mamosta pêy waye çunke her le nêw şêwenûsînî Kurmancî Xuwarûda narrêkî û nayekdestî heye (bo wêne, yek

denûsê "deçim" û ewîtir denûsê "eçim") ew şêwezare nebûwete standard. Xo raste û minîş legell ray mamostam ke debû ta êsta zor şitî lew babete yekdest kiraban, bellam ewe bew manaye nîye ke zimaneke standard nîye. Pêştir nîşanim da ke ew nayekdestîye le nêw Inglîsîşda heye, le nêwan Purteqallî Porteqall û Birezîlda û, le nêwan Feranseyî Ferranse û Kobekîşda heye. Dîyare le nêw Kurdîda narrêkî zortire, bellam em wez'e bo zimanêkî ke dewlletêkî be serewe nebûwe yekcar seyruşemere nîye. Ew dû şêwezare Kurdîye demêke qonaxî standard bûnyan destpêkirdûwe û pirosekeş, herçend şil û bêbernameye, dirêjey heye. Standard bûn qonaxêkî negorr nîye ke zimanêk pêy biga û têyda qetîs bimênê. Standardikrdin yan bûn pirroseyeke dirêjey heye û qetîş tewaw nabê. Heta jîyan le gorranda bê, pirrosey pêgeyştinî ziman û lewaneş pirrosey zimanî standard le gorranda debê. Ziman be pêy helumerce sîyasî, kultûrî, abûrî û komellayetîyekanewe degorrdirê. Jîyan degorrdirê: zimanîş degorrdirê: zimanî standardîş herwetir.

Aşkiraye ke ew rastîyane le mamosta Cemall Nebez şarawe nîn, ke ew dû şêwezare hemû karêkîyan pêkirawe û pêdekirê ke zimane standardekanî dinya pêyan kirawe û pêyan dekirê, herçend ke le biwarî "be roşinbîrîkirdinda" (întlêkçûwelayzeyşin) pêwîste zor kar bikrê. Bellam, mamosta ewe qebûll naka, çunke qebûll kirdinekey dijî ew pirrojeye dewestê ke mamosta nizîkey çil sallêke hewillî bo deda: sazkirdinî taqe zimanêkî yekgirtû bo hemû Kurd. Le ruwangey mamostawe yek netewe debê her yekzimanî standardî hebê.

Lêre daye ke mamosta legell 53 kesekeda hawdenge: herdûkîyan pêyan waye ke hîç şêwezarek nebûwe be standard. Herdûkîyan pêyan waye ke eger zortir le zimanêkî standard le Kurdistan hebê ewe netewey Kurd parçe parçe debê û defewtê. Herdûkîyan, le esasda, peyrrewî aydîolojîy netewewewllet deken, her ew aydîolojîyey ke le layen dewlletekanî êran û Turkîyawe bo nizîkey set sall peyrrew kirawe û zimanî Kurdî qedexê kirdûwe û Kurdî be zimanî 'eşîret û şaxnişînan nawdêr kirdûwe. Ew aydîolojîyaye dellê ke yek netewe xawenî yek dewllet, yek xak û yek ziman û yek kultûre. Êstaş zorêk le qellebedestanî Kurd her bew lojîke bîr dekenewe û dellên eger neteweyek yan wullatêk zortir le yek zimanî standardî hebê ewe defewtê. Ewane tenanet wekû roşinbîran û desellatdaranî 'Errebî 'êraqîşîyan pê nakirê ke birrwa biken dewllet- neteweyek dekirê zortir le yek zimanî standard, zortir le yek kultûr û zortir le yek qewim û girûpî etinîkî, tenanet zortir le yek netewey hebê. Le ruwangey em Kurdanewe eger Farsêk, Turkêk yan 'Errebêk peyrrewî le aydîolojîy netewewewllet bika ewe şovînîste, bellam eger Kurdêk wa bîr bikatewe ewe nîştimanperwewere.

Aya be rrastî yek netewe herdebê yek zimanî standardî hebê? na. Swîsira çuwar zimanî standardî heye, Kanada dûy heye, Norwêj dûy heye, Efrîqay Başûr zortir le de û Hîndustan zortir le pazde şêwezarî standardî heye. Ba hîç dûrîş nerroyn, 'êrraq dûy heye. Way dabinêyn ke ewe raste ke billêyn yek netewe debê bes yek zimanî standardî hebê. Eger ewe rast bê, debê pêçewanekeşî rast bê, wate debê bituwanîn billêyn ke her zimanêkî standard bes hî yek netewe bê nek hî çend netewe, çunke eger awa bê ew netewaney ke yekzimanyan heye hemû debin be yek netewe. Romantîkekanî allmanî, lewane Fîxte, benawbang bûn bo billawkirdinewey em fikire. Bellam eweş natuwanê rast bê, çunke be setan nimûne le dinyada hen ke zimanêk zimanî deyan netewe û netewe- dewllete. Lew zimanane be sakarî detuwanîn bîr bikeynewe le Inglîsî, Ferranseyî, Purteqallî, êspanîyayî û htd. Ew Kurdaney peyrrewî le aydîolojîy netewe- dewllet deken û pêyan waye ke yek netewe debê tenya yek zimanî standardî hebê, qewmî bîr dekenewe. Ewane qewim û neteweyan lê têk çûwe. Ewe qewime ke zorbey katan be zimanêkî şaz pênase dekirê nek netewe. Neteweyek detuwanê le çend qewim pêkbê, her bew pêyeş çend şêwezarî standard yan nastandardî hebê.

Bellam aya ewe rast nîye ke dewllet- netewekanî modêrin be pêy aydîolojî netewe- dewllet damezran? ba, ewe zor raste. Herçend wullatêkî wekû Swîsira taqaneye, zorbey here zorî dewllet- netewekanî modêrin le Feranse û Emrîkay kotayî çerxî hejdewe bigre heta êran û Turkîyay seretay çerxî bîstem bew fikire damezran ke yek netewe- dewllet debê bes yek zimanî standardî hebê. Bellam, ewe serdemêkî dîke bû û, be nîrxî pêşêlkirdinî mafe zimanîyekan û serkutkirdinî kemînekan kira. Êsta her ew wullataney ke serdemanêk zimangeli wekû "Geylk" û "Wêlz"yan le Bîrîtanîya serkut dekird emirro be mîlyon û bîlyon dollar xeric deken bo ewe ke ew zimanane bibûjênnewe û dewllemendtiryan biken. Bo? le ber ewe ke boyan derkewtûwe ke bêcgele layenî maffî mirov û zimanî, xwêndin be zimanî xomallî hem bo serkewtûyî le xwêndinda başe, hem bo abûrî başe û he m bo yekgirtûyî neteweyî başe. Ewe be pêçewaney fikirî pêşûy netewe- dewllet bû ke pêy wabû corawcorî zimanî debête hoy lêkhellweşanewey wullatêk. Herçend emeş rûydawe, bellam be dirêjayî mêjû zortirîn gîrugiriftî qewmî û nakokî û narrêkî neteweyî lew wullataneda hatûne pêş ke haşayan le bûnî zimanekanî dîke, kultûrekanî dîke û qewmekanî dîkey naw wullatêk kirdûwe. Ba hîç dûr nerroyn, birwanine wullate dirawsêkanî Kurdistan.

Êsta çî bikrê başe?

Be zûtirîn kat pêwîste lêjneyek dabimezrê bo saxbûnewe le ser baştirîn û guncawtirîn bername û pîlanî zimanî bo Kurdistanî Başûr. Ew lêjneye baştîre bernamey zimanî bo Kurdistanî Başûr dabirrêjê,

nek Kurdistanî Gewre. Hendêk lew erke serekîyaney ke weha lêjne yan dezgayek debê rayanperrênê birîtîn le:

1. Yan hîç şêwezarek le Kurdistanî Başûr nebête resmî (herçend Kurmancîy Xuwarû renga de façto, be kirdewe, resmî bê), yan eger birryare ke zimanî resmî hebê, ba Kurmancî Jûrûş bibête resmî, lanî kem lew parêzgayeda ke qisey pêdekirê (Dehok). Boçî? hendêk le akamekanî dasepandinî yekzimanî standard emanen: (-) sûkayetîkirdin be axêweranî şêwezare standardekey dîke. Le akamda ewaney wepîştgwê xirawin lewaneye tûşî xobekemzanîn bibnewe: (b) pêşêlkirdinî mafî zimanî û le akamda mafî mirov. Pêşgirtin le axêweranî zimane biçûkekan ke her ew xwêndin û deretaneyan hebê ke zorbe heyetî: (p) bêbeşikrdinî hemû mindallanî Kurdistan le xwêndin be şêwezarek ke nizîke le zimanî mall û civatekeyan: (t) dasepandinî yek kultûrî hejmonîyane (desellatdar) û yek şêwe bîrkirdinewe. Eme dû rêga dexate berdem zimane biçûkekan, yan tuwanewe, yan xorragirî û muqawimet. Eweş akamekey zorbey katan destpêkirdinî şerruhellla û nakokîye.
2. Le seranserî Kurdistan be herdûk şêwezar deris bixwêndirê. Rêjey radey xwêndinî her şêwezarek le nawçeyek yan parêzgayek be pêy jimarey danîştuanî axêweranî şêwezarek lew nawçane debê bigorrdirê. Bo wêne le Silêmanî zortir be Kurmancîy Xuwarû bixwêndirê.
3. Deretan birrexisê, le layen ew lêjnewe yan şitêkî lew babete be budcey dîyarîkiraw û desellatewe, bo ewe ke dû şêwezare standardeke yekdesttir bikrên, be rroşinbîrtir û zanîstîyanetir bikrên. Ferhengî bawerrpêkirawî hemelayeneyan bo durust bikrê, kitêbî rêziman û rênûs û ferhengî hemepesendîyan bo amade bikrê.
4. Imkanat dabîn bikrê bo ewe ke eger gerekîyan bê mindallekanî Hewramî û Feylî le çend sallî seretayîda be zimanî zigmakîyan bixwênin.
5. Le her halletêkda debê ballansêk, hawsengîyek hebê le nêwan rêzgirtin le mafî zimanî şêwezare biçûkekan û deretan rexsandin bo hemû layek ke fêrî zimanî serekî zanist û bazarr û mîdîya bin, bo ewe ke le hellsûrrane komellayetî, sîyasî û abûrîyekanî giştîy Kurdistanê weduwa nekewin. Ewe wullamî ew nîgeranîye dedatewe ke le layen hendêk kesî dijî cîyawazîy zimanî hatote gorrê. Ke goya eger mindallanî Hewraman boyan hebê be zimanî zigmakî xoyan bixwênin ewe hemû gerrekêk daway ewe deka. Ewe boçûnêkî bê însafaneye. Hewraman gerrekêk nîye, zimanî Hewramîş lehce û rawêjî komellayetî naw şarêk yan cîyawazîy lehcey şarêk legell gundekanî nîye.

6. Bername dabindirê ke zimangeli wekû 'Errebî û Ingîsî le çî qonaxêkda û bo çî maweyek bixwêndirên.

Be kurtî Kurdistanî Başûr pêwîstî be lêjneyek yan dezgayek heye ke be piley yekem le lêzananî zimannasîy karkirdî û paşanîş le lêzananî pêxwêndin, mîdîya û sîyaset û biwarekanî dîke pêkbê, bo ewe ke bername û pilanêkî becê û rêkûpêk û guncaw bo ew herême dabirrijin. Ew dezgaye debê ber le hemû şit berijewendî xellkî Kurdistanî le babet xwêndin û hellsûrranî karubare komellayeti û abûrîyekanewe le berçaw bê. Eweş katêk misoger debê ke mafî zimanî û mirovî hemû tuwêj û çînekan û mellbendekanî Kurdistan le berçaw bigîrdirên. Ew bername û yasagele debê dabindirên û berrêwe bibrdirên ke mafî hawullateti hemû layek be pêy pêwîst biparêzê, bew core ke xellkî mellbende cîyawazekan û axêweranî zimane cîyawazekan birrwa biken ke le nîştimanî xoyanda dejîn.

Nîştiman ew şwêne nîye ke şêwezarekit beserda dasepênin, ca ba ew şwêne nawî Kurdistan bê, 'Êraq bê yan Êspanîya bê. Pênasey netewayeti her be ziman dîyarî nakirê. Çunke zimanî "Gana"îyekan îngîsîye, ewe ne nîşaney eweye ke Ganayekan êsta Ingîsîn û, ne nîşaney eweşe ke Gana netewe û willatî serbexo nîye. Bêcgele ziman pênasey netewayeti be zor şitî dîke dîyarîdekirê wekû xak, kultûr, mêjû û ezimûnî rabirdû, pêkewejîyanî henûkeyî û herweha awat û meylî pêkewejîyan le dahatûda. Lanî kem le set sallî rabirdûda, ziman hoy be yekewe girêdanî xellkî Kurdistanî Başûr nebûwe, bellkî çewsanewey hawbeş, xebatî hawbeş, dujminî hawbeş û hîwa û amanc bo çêkirdinî kîyanêkî hawbeş hoy yekgirtûyî ewan bûwe. Ewaney ke pêyan waye hebûnî zortir le yek şêzearî standard le Kurdistanî Başûr debête hoy dûberekî le helle dan. Ew dû şêzeware çend sedeye ke cîyawaz bûn. Ew cîyawazîyeş nebûwe be hoy letbûnî Kurdistanî Başûr. Pêrrageştin be herdûkyan û ruwanî le herdûkyan be şêweyekî beranber û yeksan tenya debête hoy zortir tebayî û leyeknizîkbûneweyan. Le serdemî becîhanîbûn, peregirtinî civate tarawgekan, corawcortirbûnî komellgekanî însanî û, billawbûnewe û behêzbûnî mîdîya dîcîtalekanî sinûrperrênda, çîtir pêwîst naka û naşikrê ke yek netewe be zebuzeng dabimezrê. Eger bikrê, ewe pêy dellên dîkitorîyet û pêşêlkirdinî mafî mirov. Eweş sakartirîn û tembellanetirîn kare ke mirov detuwanê bîka, çunke zebuzeng û kuştin û birrîn pêwîstî be bîrkirdinewey qûll û rawtegbîr û rawêj û dîyalogî çirrupir nîye. Ewey ke pêwîstî be emaneye birîtîye le dozînewey guncawtirîn rêga bo perwerdekirdinî yekîyetî le naw komellgeyekî corawcorda. Raperrandinî ew erkaney ke be rastî le însan deweşênewe ta êsta zehmettir û girantir bûn lew erkaney ke dîkitorrekan û dasepêneranî hejmonî pêy nasirawn.

-----

Beşêkî zor lew kesaney le ser em babete nûsîwyane pêyan waye ke zimanî standard birîtîye le zimanî resmî û be pêçewaneş. Wa nîye. Dekirê zimanêk standard bêt bellam resmî nebêt. Hellbet hemû zimane resmîyekan kemtazor standard in.

## LÊKER (KAR) DI ZIMANÊ KURDÎ DE (5)

*Deham Ebdulfetah*

(10)

### BIRRÊ DEHEM

#### - Karên Rêzder

- 1 - Viyan
- 2 - Şiyan
- 3 - Zanîn
- 4 - Karîn
- 5 - Wêrîn
- 6 - Hatin
- 7 - Bûn (to be - être)
- 8 - Hebûn

#### - Karên Rêzder (Awarte):

Karên rêzder ew kar in, ên ku di forma veguhestina xwe de ji rêza karên celebê xwe derdikevin, anku ne li ser rêzik û destûrên wan tîn veguhestin û ne li wan jî tîn pîvan.

Her karekî rêzder li gora taybetmendiya xwe bikar tê û li wê gorê jî raweyên veguhestina xwe, yê pêşkerî û daxwazî werdigire.

Karên rêzder, ên ku bi pirranî tîn xebitandin ev in:

(Viyan, şiyân, zanîn, karîn, wêrîn, hatin, bûn, hebûn), veguhestina van karên rêzder di her sê demên raweya pêşkerî de, bi van şêwazên jêrîn pêk tê:

### 1 - Viyan:

Karê (viyan) bi raweya (vên) û (vîn) jî hatiye.

- **Gêwê Mukriyanî** di ferhenga xwe de, ya bi navê (kurdistan) dibêje (di Kurmanciya Bakur de):

Vên: Wîstin, xoşewîstin, arezû.

Vîn: Daxwazî (Kurmanciya Bakur).

- **Hejarê Mukriyanî** jî di ferhenga xwe ya bi navê (Henbane Borîne) de dibêje:

Vîn: Eşiq, evîndarî, arezû.

Ev her du gotin, bi wan wateyên jorîn, di hindek jêderên dîtir de jî hene:

- **Ehmedê Xanî** di (Nûbihara Biçûkan) de dibêje <sup>(14)</sup>:

(Îşaret wehî û telwîh û îradet vên û qudret şên)

Anku, (vên: xwestin, daxwazî, arezû).

Ev kar bi raweya (viyan), weku jêderên karan, di hemû dem û raweyan de tê veguhestin: (Min viya, ez divêm, ez ê bivêm....).

Rêzderiya (awarteyiya) vî karî ji du hêlan ve hatiye:

1 - Ji hêla teşeyê (formê) ve, ev rawe (viyan) wek karên nederhingêv (têneper) saz bûye:

(Kenîyan / kenîn /, gerîyan / gerîn /, kişîyan / kişîn /, westîyan / westîn /...) û li wê şopê jî viyan û / vîn /<sup>(15)</sup>

2 - Ji hêla têgeh û watedariyê ve, weku karên derhingêv (têper), bi wateya (xwestin), dihingive berkarê xwe yê rasteder (rastewxo):

(Min pirtûkek viya / xwest /, ez pirtûkekê divêm / dixwazim /, ez ê pirtûkekê bivêm / bixwazim /....).

Em dizanin ku hemû karên nederhingêv (li gora rêzika xwe), di hemû deman de, bi cînavên koma / ez / re tîn veguhestin: (viyan) jî, li gora forma xwe ya nederhingêv, gerek bi wê pîvanê bihata veguhestin: (Ez viyam, ez divêm, ez dê bivêm....).

Ev jî ne durist e. Çiku (viyan) li vir derhingêv e, gerek di demên borî de bi cînavên koma (min) re bê veguhestin, Wek:

- Min pirtûkek viya (xwest)

- Te pirtûkek viyaye (xwestiye)

<sup>14</sup> - Xanî : Nûbihar. Vekolîna Mela Hemdî (Selefî) - Bexda (1990). Rû. / 44 /.

<sup>15</sup> - Bi dîtina min, (vîn) navê jêderî ye, ne jêdere.



- Wî pirtûkek diviya (dixwest)
- Wê pirtûkek viyabû (xwestibû).
- ....

Lê di demên nuha û paşeroj de, ev kar (derhingêv be yan nederhingêv be) pêwîst e ku bi cînavên koma / ez / re bê veguhestin:

- Ez pirtûkekê divêm (dixwazim)
- Ez ê pirtûkekê bivêm (bixwazim)

Di warê kiryarîyê (pratîkê) de karê (viyan), di nav gel û di nivîsaran de jî, bi du coran tê xebitandin:

### 1 - Corên Nederhingêv:

Ev corê nederhingêv li gora demê tê guherîn:

#### Dema Nuha:

Di vê demê de ev kar bi raweya (divê) bikar tê.

Wek:

- Divê ez te bibînim  
(gerek ez te bibînim)
- Divê em herin Şamê  
(pêwîst e em herin şamê)
- Divê hûn zimanê xwe biparêzin  
(pêdivî ye hûn zimanê xwe biparêzin)

Em dizanin ku raweya hemû karên nederhingêv ên asayî (normal) li gora karayên (kiryarên) xwe tên guherîn, anku eger kara yekjimar be, yan komjimar be, kar jî li wê gorê, raweya xwe digire, wek (ez diçim, tu diçî, ew diçe, em diçin...).

Lê karê (divê), digel ku nederhingêv e û di dema nuha de ye jî, nehatiye guherîn, gelo çima ?!

Di mînakan de, karê (çûn), li gora guherîna karan (ez, tu, ew, em) tê guherîn. Lê karê (divê), ji ber ku karekî rêzder e (awarte ye), karayê wî hevoka li pey wî ye. Ev hevok jî bi karayekî yekjimar tê texmînkirin, anku hevok cihê karayekî yekjimar digire. Loma karê (divê) di raweya yekjimarê de (bê guherîn) dimîne:

- Divê em biçin = çûn bo me divê = çûn divê bibe
- Divê tu pirr bixwînî = xwendina pirr divê = bo te xwendin divê.

Di van mînakan de (çûn, xwendin) karayên yekjimar in, karê (lêkera) wan jî (divê), li wê gorê yekjimar hatiye. Ev jî li gora aheng û kategoriya karên nederhingêv pêk hatiye.

Di hindek hevokên vê raweya (divê) de, kara navekî eşkere, li pêş karê xwe (divê) bikar tê, anku wek hemû karên nederhingêv:

- (Arvan ji malê re /divê/, şikir û ardû jî /divên/...).

Di vî şêwazê hevokan de karê (divê) jî, weku karên dema nuha, nîşandekên jimara kara lê xuya dibin:

- Pênûsek bo min divê (gerek e)
- Gelek tişt bo min divên (gerek in)

## 2 - Corê Derhingêv:

Li gora ku (vîyan) bikar tê, ew jî weku hemû karên derhingêvên asayî, li gora rêzik û destûran tê veguhestin:

1 - Di her çar demên borî û daxwaziyên beranberî wan de, bi cînavên koma / min / re tê veguhestin.

Wek:

- Min sêvek viya (xwest)
- Te sêvek viyaye (xwestiye)
- Wî sêvek diviya (dixwest)
- Wan sêvek viyabû (xwestibû)
- (Xwezî) min çar sêv biviyana (bixwestana)
- (Bila) te jî pênc sêv viyabûna (xwestibûna)
- HD.....

2- Di dema nuha û daxwaziya wê de, ev kar bi cînavên koma / ez / re tê veguhestin.

Wek:

- Ez sêvekê divêm (dixwazim)
- Tu sêvekê divêyî (dixwazî)
- Ew sêvekê divê (dixwaze)
- Hûn sêvekê divên (dixwazin)
- (Gerek) ez sêvekê bivêm (bixwazim) !
- (Xwezî) tu jî sêvekê bivêyî (bixwazî) !
- (Bila) ew jî sêvekê bivê (bixwaze) !
- (Belkî) em jî sêvinan bivên (bixwazin) !
- HD.....

3 - Ev kar di dema paşeroj û daxwaziya wê de jî bi cînavên koma / ez / re tê veguhestin.

Wek:

- Ez ê sêvan bivêm (bixwazim)
- Hûn ê sêvan bivên (bixwazin)
- (Gerek) em jî (sibe) sêvan bivên (bixwazin)
- HD.....

**Bi** vê veguhestina karê (viyan), ku di hemû dem û raweyan de pêk hatiye, em piştrast dibin ku ev kar weku hemû karên derhingêv, bi asayî dikeve ber rêzan û destûrên rêzimanî.

**Lê** tiştê seyr û balkêş di karê (viyan) de ew e, ku di warê kiryarî de berevajî wê veguhestina jorîn bikar tê.

1 - Li gelek herêman û bi berfirehî di nav gel de tê gotin:

- Min ji te divê...
- Min ji te navê....
- Te çi ji min divê ?
- We çi divê.... ?

**Ev** şêweyê veguhestinê ne bi devikî tenê bikar tê, lê di nivîsînên gelek kesan de jî tê dîtin.

2 - Seyda Sadiq Behadînê Amêdî, derbarê karê (viyan) dibêje: (kirineka / karekî / ne rastrêzan e / rêzder e /). Seyda Amêdî veguhestina vî karî bi vî şêweyî pêk tîne:

**Borî:** Weku karekî derhingêv bi cînavê koma / min / re veguhestiye: (Min viya, min viyaye, min diviya, min viyabû....).

**Nuha:** Di vê demê de (nerastrêzana) vî karî diyar dike û berevajî destûra veguhestina hemû karên derhingêv û yên nederhingêv jî, karê (viyan) bi cînavên koma (min) re vediguhêze:

(Min divêt / divê /, te divêt, wî / wê divêt, me divêt, we divêt, wan divêt).

**Paşeroj:** Di vê demê de jî, berevajî karên derhingêv û nederhingêv, vî karî bi cînavên koma / min / re bikar tîne:

(Min dê vêt, te dê vêt, wî / wê dê vêt, me dê vêt, we dê vêt, wan dê vêt).

3 - Di helbestên Kurdî yên kevneşop (kilasîk) de jî ev xebitandina ku ne li gora rêzan û destûa rêzimana Kurdî, pêk hatiye:

- **Ehmedê Xanî dibêje:**

- Her çî te divê bibî (ddelalê - ضلالی)
- pabendî dikî bi zulf û xalê <sup>(16)</sup>

- **Melayê Cizîrî jî dibêje:**

- Me bi dil nêrgizên xasse divên,

<sup>16</sup> - Xanî : Mem û Zîn (şirovekirina Jan Dost. Beyrût (1995) - Rû. / 32 /.

semen û yasimînê taze divên

- Bi ziyaret me ji wan bose divên

turreya şengê dil- aşufte divên <sup>(17)</sup>

- **Melayê Bateyî** jî bi wî şêwazî dibêje:

- Meclisa bê saz û heyhey

min nevêt, naçimeyê <sup>(18)</sup>

Di van mînanan de xuya ye ku her sê helbestvanan karê (divê), wekî ku ew karekî derhingêv di dema borî de be xebitandiyê û bi cînavên koma / min / re veguhestiyê, digel ku ev (divê) di dema nuha de ye, ne ya borî .

Arîşeya vî karî, bi vî şêweyê xebitandinê, ev e:

1 - Raweya (divê) forma dema nuha ye, boriya vî karî ev e (viya, viyaye, diviya, viyabû), ne (divê) ye.

2 - Forma (divê) ya dema nuha, gerek bi cînavên koma / ez / re bihata veguhestin, ne bi cînavên koma / min / re. Anku, li şûna (min te divê) û (wî tiştek (divê), gerek bê gotin: (Ez te divêm) û (ew tiştekî divê).

## 2 - Şiyan (karîn):

Karê (şiyana) derhingêv e, bi wateya (karîn) tê xebitandin. Ev kar di hemû deman de, weku karekî derhingêv tê veguhestin. Lê bi du taybetmendiyên ji karên derhingêv ên dîtir cuda dibe:

a - Em tev dizanin ku karên derhingêv ew kar in, ên ku hevokên wan bêyî berkarên rasteder sergihatî nabin.

Anku, her karekî derhingêv navekî yan cînavê berkar dixwaze.

Wek:

- Memo sêv çinîn

- Zîne ez dîtîm

Carinan jî berkerên hinek karan, li şûna nav û cînavan, dibin hevok û li pey wan tên.

Wek:

- Zîne got: Birayê min çû bajêr.

Berçav e ku di hevoka (Zîne tiştek got), navê (tiştek) bûye berkarê rasteder bo karê (got), lê di hevoka (Zîne got: Birayê min çû bajêr), hevoka biçûk (birayê min çû bajêr) ew bûye berkarê (got).

Lê karê (şiyana) ji vê rêzika karên derhingêv derketiyê. Anku, berkarê wî berdewam hevokeke sergihayî, li pey wî tê.

<sup>17</sup> - Cizîrî : Dîwan (şirovekirina Zivingî ). Heleb (1987 ) Bergê duwem - Rû / 821 /.

<sup>18</sup> - Ebdulreqîb Yûsif : Dîwana Kurmancî. Nefes. (1971 ) - Rû. / 52 /.

Wek:

- Min şiya ez nameyê bixwînim
- Hûn neşên biçin zozanan

Bi vê pîvanê, yekcar berkarê (şiyar) nabe nav, yan cînav. Anku, berkarê (şiyar) berdewam hevok e.

b - Rêzika neyîniya karên dema nuha ew e, ku bi alava / na / tîn neyînkirin, wek (ez naçim, tu nanivîsî...). Lê karê (şiyar) bi alava / ne / dikeve raweya neyîne.

Wek:

- Ez neşêm nameyê bixwînim
- Ew neşên biçin zanîngehê

Bi van her du taybetmendiyên karê (şiyar) dikeve rêza karên rêzder (awarte). Ji bilî van her du xalên taybet, karê (şiyar) weku hemû karên derhingêv tê veguhestin. Wek:

- **Demên Borî:**

- **Nêzboriya Xwerû:**

**Erênî:**

- Min şiya ez biçim
- Te şiya tu biçî
- Wî / wê şiya ew biçe
- Me şiya em biçin
- We şiya hûn biçin
- Wan şiya ew biçin

**Neyîni:**

- Min neşiya ez biçim
- Te neşiya tu biçî
- Wî / wê neşiya ew biçe
- Me neşiya em biçin
- We neşiya hûn biçin
- Wan neşiya ew biçin

**Pirsiyarî:**

- Min şiya ez biçim ?!
- Ma te şiya tu biçî ?!
- HD.....

**- Boriya Sergihayî:****Erênî:**

- Min şiyaye ez biçim
- Te şiyaye tu biçî
- Wî / wê şiyaye ew biçe
- HD.....

**Neyînî:**

- Me neşiyaye em biçin
- We neşiyaye hûn biçin
- Wan neşiyaye ew biçin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma me şiyaye û em neçûne ?!
- We şiyaye hûn biçin ?!
- Gelo wan şiyaye û neçûne ?!
- HD.....

**- Boriya Berdewam:****Erênî:**

- Min dişiya ez te bibînim
- Te dişiya tu min bibînî
- Wî / wê dişiya ew me bibîne
- HD.....

**Neyînî:**

- Me nedişiya em te bibînin
- Te jî nedişiya tu me bibînî
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma me dişiya em te bibînin ?!
- Yaxod te dişiya tu me bibînî ?!
- Kê dişiya kê bibîne ?!
- HD.....

**- Boriya Çîrokî:****Erênî:**

- Min şiyabû ez te bibînîm
- Te şiyabû tu min bibînî
- Wî / wê şiyabû ew me bibîne
- Me şiyabû em wan bibînin
- HD.....

**Neyînî:**

- Me neşiyabû em kesekî bibînin
- We neşiyabû hûn me bibînin
- Wan neşiyabû ew te bibînin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Gelo min şiyabû ez te bibînîm ?!
- Yan te şiyabû tu min bibînî ?!
- Ma me şiyabû em hev bibînin ?!
- HD.....

**- Dema Nuha:****Erênî:**

- Ez dişêm pirtrûkê bixwînîm
- Tu dişêyî pirtûkê bixwînî
- Ew dişê pirtûkê bixwîne
- Em û hûn, em dişên pirtûkê bixwînî
- Ew jî dişên pirtûkê bixwînî

**Neyînî:**

- Ez neşêm pirtûkê bixwînîm
- Tu neşêyî pirtûkê bixwînî
- Ew neşê pirtûkê bixwîne
- Ez û ew, em neşên pirtûkê bixwînî
- Hûn jî neşên pirtûkê bixwînî

**Pirsiyarî:**

- Ma ez dişêm pirtûkê bixwînîm ?!
- Gelo tu dişêyî pirtûkê bixwînî ?
- Kî dişê pirtûkê bixwîne ?!
- Aya hûn dişên pirtûkê bixwînî ?!

**- Dema Paşeroj:****Erênî:**

- Ez ê îşev bişêm te bibînîm
- Tu yê îşev bişêyî min binînî
- Ew ê îşev bişê me bibîne
- Em ê îşev bişên hev bibînî
- HD.....

**Neyînî:**

- Îşev ez neşêm te bibînîm
- Îşev tu neşêyî min bibînî
- Îşev kes neşê kesî bibîne
- Îşev, em tev neşên hev bibînî (19)
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê îşev bişêm te bibînîm ?
- Tu yê îşev bişêyî min bibînî ?!
- Îşev, kî yê bişê kê bibîne ?!
- Em ê îşev bişên we bibînî ?!
- HD.....

Di raweyên daxwazî de jî karê (şiyar) li gora demên pêşkerî, tê veguhestin:

- **Fermanî:** Bişê, bişên
- **Bilanî:** Bila min bişêya te bibînîm !  
Bila min bişêya (ez) te bibînîm !
- **Xwezî:** Xwezî min şiyaba biçûma Amedê !
- **Gerekî:** Gerek min şiyabûya xwe biparêzim!
- **Mercî:** Eger em bişên em ê hev bibînî

**3 - Zanîn:**

Karê (zanîn) karekî derhingêv e, weku hemû karên derhingêv hevoka xwe bi berkarê xwe yê rasteder sergihayî dike. Berkarê vî karê rêzder bi du şeweyan tê xebitandin:

A - Navekî yan cînavêkî berçav, li pêşiya karê (zanîn) xuya dibe:

<sup>19</sup> - Alava neyîniya (şiyar) di dema paşeroj û nuha de / ne / ye. Di daxwaziya paşeroj de jî alava neyînê / ne / ye, lê digel nîşandeka dema paşeroj (ê / dê) wek: (Bi gumana min, ez ê îşev neşêm te bibînîm).



- Te dîroka Dêrsimê zanîbû ?!

- Tu çî ji wê dîrokê dizanî ?!

B - Hevokeke watedar li pey karê (zanîn) bikar tê:

- Min nizanîbû tu li kû dimînî !

- Kî dizane em ji çî welatî ne ?!

Karê (zanîn) bi du taybetiyan ketiye rêza karên rêzder, (veguhestin û neyînkirin). Veguhestina karê (zanîn) bi vî şêweyî pêk tê:

- **Demên Borî:**

**Nêzboriya Xwerû:**

**Erênî**

- Min zanî tu kî yî

- Te zanî ez kî me

- Wî / wê zanî em kî ne

- Me zanî hûn kî ne

- We zanî ew kî ne

- Wan zanî em kî ne.

**Neyînî:** - (Karê / zanîn / di nêzboriya xwerû de bi pirranî, bi alava / ni / dikeve raweya neyînê):

- Min nizanî tu kî yî

- Te nizanî ez kî me

- Wî / wê nizanî em kî ne

- Wan nizanî em kî ne<sup>(20)</sup>

**Pirsiyarî:**

- Ma min zanî tu kî yî ?!

- Kê zanî ew kî ye ?!

- HD.....

- **Boriya Sergihayî:**

{ Li gora pîvanê, gerek boriya sergihayî bi forma (min zaniye, te zaniye....) bihata, lê ev dem di warê kiryarî de, di çarçeweke teng de bikar tê. Anku, li hin herêman bikar nayê }.

- **Boriya Berdewam:**

**Erênî:**

<sup>20</sup> - Li hin herêman, (min nezanî ) û (min nazanî ) jî bikar tên.

- Min dizanî tu kê yî
- Te dizanî ez kê me
- Wî / wê dizanî em kê ne
- Me dizanî hûn kê ne
- We dizanî ew kê ne
- Wan dizanî em kê ne

**Neyînî:**

- (Karê / zanîn / di boriya berdewam de bi alava / ne / dikeve raweya neyîniyê):

- Min nedizanî tu kê yî
- Te nedizanî ez kê me
- Wî / wê nedizanî em kê ne
- Me nedizanî hûn kê ne
- Wan nedizanî em kê ne

**Pirsiyarî:**

- Ma min dizanî tu kê yî ?!
- Kê dizanî em kê ne ?!
- Kengî te dizanî ew kê ne ?!
- HD.....

**- Boriya Çîrokî:**

{ Ev boriya çîrokî bi firehî bikar tê. Gelek caran jî li şûna boriyên dîtir, nemaze boriya sergihayî, bikar tê. Anku di nav gel de, li şûna ku bê gotin: (Min zanî, min zaniye, min dizanî), tê gotin: (Min zanîbû).

**Erênî:**

- Min zanîbû tu kê yî
- Te zanîbû ez kê me
- Wî / wê zanîbû hûn kê ne
- Me zanîbû ew kê ne
- We zanîbû ew kê ne
- Wan zanîbû em kê ne

**Neyînî:**

- Min nizanîbû hûn heval in
- Te jî nizanîbû em heval in

- We jî nizanîbû ku ew heval in

-HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma kê zanîbû em heval in ?!

- Gelo we zanîbû em heval in ?!

- Çawa wan zanîbû ku em heval in ?

- HD.....

**- Dema Nuha:**

(Karê / zanîn / di dema nuha de bi du şêwazan tê xebitandin:

1 - Digel pêşgira dema nuha / di /:

- Ez dizanim biçim yarîgehê

2- Bêyî pêşgira dema nuha / di /:

- Ez zanim biçim yarîgehê

**Erênî:**

- Ez dizanim ev der kû ye

- Tu dizanî / zanî / ev der kû ye

- Hûn dizanin.....

**Neyînî:**

- Ez nizanim ev der kû ye

- Tu nizanî rê li kû ye

- Ew nizane, tu kî yî

- Em nizanin hûn çi dikin !

- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez dizanim tu çi dikî ?!

- Kî zane kî çi dike ?!

- Gelo ew dizane..... ?!

- Yan tu dizanî..... ?!

- HD.....

**- Dema Paşeroj:**

**Erênî:**

- Ez ê bizanim tu kî yî <sup>(21)</sup>
- Tu yê jî bizanî ez kî me
- Îro em ê bizanin hûn ji kû ne
- HD.....

**Neyînî:** - Di neyîniya karên paşeroj de, gelek caran tevhevî di navbera raweya pêşkerî û ya daxwazî de çêdibe. Neyîniya her du raweyan ji hev cuda ne:

1 - Neyîniya karên paşeroj, ên raweya pêşkerî li gora raweya wan a dema nuha pêk tê. Anku, neyîniya

her karekî paşeroj, weku raweya neyîniya wî di dema nuha de saz dibe, wek: (Çûn, nivîsîn, zanîn):

**Nuhaya Erênî**

- Çûn: -Ez diçim
- Nivîsîn: -Ez dinivîsim
- Zanîn: -Ez dizanim

**Nuhaya Neyînî**

- ez naçim
- ez nanivîsim
- ez nazanim

**Paşeroja Erênî**

- Çûn: -Ez ê biçim
- Nivîsîn: -Ez dê binivîsim
- Zanîn: -Ez ê bizanim ez nizamim (nizamim)

**Paşeroja Neyînî**

- ez naçim
- ez nanivîsim

2- Neyîniya karên paşeroj ên raweyên daxwazî jî, weku raweya pêşkerî pêk tê, tenê alava neyîniyê dikeve ser karan:

**P. Pêşkerî (erênî)**

- Çûn: Ez ê biçim
- Nivîsîn: Ez ê binivîsim
- Zanîn: Ez ê bizanim(zanibim) ez ê nizanibim
- HD.....

**P. Daxwazî (neyînî)**

- ez ê neçim <sup>(22)</sup>
- ez ê nenivîsim

**Pirsiyarî:**

- Gelo ez ê bizanim ew kî ye ?!
- Ma tu yê zanibî rê li kû ye ?!
- Çawa ew ê bizane em çi dikin ?!
- HD.....

<sup>21</sup> - Li herêmanan ev raweya paşeroj : (Ez ê bizanibim, tu yê bizanibî) bikar tê. Bi baweriya min, ev şewaz devokeke herêmkî ye, ne li ser rêbazeke rêzimanî, wek (ez ê bizanim, ez ê zanibim) hatiye. Di vê raweyê de pêşgira dema paşê / bi / û binyata karê bûn / b /, her du bi hev re bikar hatine (bi - zani - bin ).Ev jî bargiraniyeke negerek e.

<sup>22</sup> - Di veguhestina raweyên daxwazî de em ê vê mijarê bi firehî ronî bikin.

- **Raweya Fermanî:** - Zanibe, bizane..... (tu)
- Zanibin, bizanin..... (hûn)

Raweyên daxwazî, yê dîtir jî, her yek ji wan, beranberî demeke pêşkerî (borî, nuha, paşeroj) bi formekê bikar tê, Wek:

- Bila min zanîba, zanîbûya.....
- Xwezî ez bizanim, zanibim.....
- Gerek te zanîbûya wî çi dixwest
- Divê ew nizanibin em li kû ne !
- HD.....

#### 4 - Karîn:

Ev karê derhingêv jî, karekî rêzder e, bi du taybetmendiyên ji rêza karên asayî derketiye:

1 - Berkarê vî karê derhingêv, weku nav û cînav, li pêş wî bikar nayê. Anku, berkarê (karîn) berdewam hevok e, Li pey wî tê.

Wek:

- Min karîbû ez te binasim
- Ma te karîbû tu herî bajêr ?!
- Ez dikarim gotarê binivîsim
- Tu jî karî gotarê binivîsî
- Em ê bikarin hev bibînin
- Hûn dê karibin biçin seyranê
- HD.....

Di pêvajoya hin hevokan de karê (karîn) bêyî hevoka berkar jî tê xebitandin:

- Kî bi kê kare ?!
- Xelk bi te karin, tu jî bi min karî

2 - Ev kar jî, weku karê (zanîn) bi alava / ni / tê neyînkirin, tenê di boriya berdewam de bi / ne / yê dikeve raweya neyînê:

- Min nikarî, min nikarîbû
- Min nedikarî
- Ez nikarim
- Ez ê nikaribim

Bi van her du taybetmendiyên, karê (karîn) jî, weku karê (zanîn) tê veguhestin:

**- Demên Borî:****- Nêzboriya Xwerû:****Erênî:**

- Min karî ez biçim gulistanê
- We karî hûn biçin gulistanê
- HD.....

**Neyînî:**

- Min nikarî ez biçim gulistanê
- Wan nikarî ew biçin gulistanê
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma min karî ez biçim gulistanê ?!
- Gelo te karî tu biçî gulistanê ?!
- Çawa we karî hûn biçin.... ?
- HD.....

**- Boriya Sergihayî:**

{ Ev kar jî, weku karê (zanîn), di boriya sergihayî de gerek bi şeweyê (min kariye, te kariye...) bihata, lê ev borî kêmbikar tê, li hin herêman nayê bihîstin. Li şûna vê raweyê boriya çîrokî (karîbû) bikar tê }:

**- Boriya Berdewam:****Erênî:**

- Min dikarî ez vegerim.....
- We jî dikarî hûn vegerin.....
- HD.....

**Neyînî:**

- Te nedikarî tu kar bikî
- Wî jî nedikarî ku kar bike
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma te dikarî ku tu kar bikî ?!
- Gelo kê dikarî kar bike ?!
- HD.....

**- Boriya Çîrokî:**

**Erênî:**

- Min karîbû (ez) pirtûkê bixwînim
- Te jî karîbû (tu) pirtûkê bixwînî
- HD.....

**Neyînî:**

- Min nikarîbû (ez) pirtûkê bixwînim
- Wan jî nikarîbû pirtûkê bixwînin <sup>(23)</sup>
- HD.....

**Pirsyarî:**

- Ma min karîbû (ez) pirtûkê bixwînim?!
- Kê karîbû pirtûkê bixwîne ?

**- Dema Nuha:****Erênî:**

- Ez dikarim (karim) te bibînim
- Tu jî dikarî min bibînî
- HD.....

**Neyînî:**

- Em nikarin we bibînin
- Tu nikarî me bibînî
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez dikarim te bibînim ?!
- Kî dikare te binîne ?!
- Ka em dikarin we bibînin ?!
- HD.....

**- Dema Paşeroj:****Erênî:**

- Ez ê bikarim
- Tu dê bikarî
- HD.....

<sup>23</sup> - Eger jî pêvajoya hevokê wateya wê bê zanîn, durist e ku karayê hevoka duwem bê avêtin : (Wan karîbû pirtûkê bixwînin ), durist e jî ku neyê avêtin : (Wan nikarîbû, ku ew pirtûkê bixwînin ).

**Neyînî:**

- Sibe jî ez nikarim te bibînîm
- Saleke dî jî, tu nikarî min bibînî

(Neyîniya raweyên daxwazî):

Neyîniya raweyên daxwazî jî bi alava / ni / pêk tê:

- Eger tu nikarî ez ê jî nikaribim
- Ku tu karibî, çima em ê nikaribin
- Xwezî hûn jî nikaribin !
- Bila em jî nikaribin !

**- Raweyên Daxwazî:****Fermanî:**

- Bikare, karibe (tu)
- Bikarin, karibin (hûn)

**Bilanî:**

- Bila we karîba.....
- Bila hûn karibin....

**Xwezîni:**

- Xwezî we karîba.....
- Xwezî hûn karibin.....

**Mercî:**

- Eger tu bikarî (karibî) were,
- Em ê karibin li benda te bimînin
- HD.....

**5 - Wêrîn:**

Ev kar jî karekî derhingêv e, berkarê wî jî berdewam hevokeke pê ve girêdayî ye û li pey wî bikar tê:

- Ez wêrim bikevim avê

Rêzderiya (awarteyiya) karê (wêrîn) ji neyîniya wî tê. Em dizanin ku hemû karên asayî di dema nuha de bi alava / na / tên neyînkirin. Karê (zanîn) û (karîn) jî bi alava / ni / tên neyînkirin. Lê karê (wêrîn) û karê (şiyar) bi alava / ne / dikevin raweya neyînê.

Wek:

- Ez newêrim gotina xwe bibêjim.

Ji bilî vê taybetmendiya awarte, karê (wêrîn) jî, wek hemû karên dîtir tê veguhestin:



**- Demên Borî:****- Nêzboriya Xwerû:****Erênî:**

- Min wêrî ku ez bikevim avê
- Te wêrî tu bikevî avê <sup>(24)</sup>
- Wan wêrî ku herin çiyê
- HD.....

**Neyînî:**

- Min newêrî ez avjeniyê bikim
- We newêrî hûn avjeniyê bikin

**Pirsiyarî:**

- Ma min wêrî ez avjeniyê bikim ?!
- Kê wêrî ku avjeniyê bike ?!
- HD.....

**- Boriya Sergihayî: (Ev borî jî kêr tê bihîstin):****Erênî:**

- Min wêriye ez derkevim

**Neyînî:**

- Wan newêriye derkevin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma te wêriye tu derkevî ?!
- Kê wêriye derkeve ?!

**- Boriya Berdewam:****Erênî:**

- Min diwêrî ez derkevim
- Te diwêrî tu derkevî
- Wî / wê diwêrî ew derkeve
- Me diwêrî em derkevin
- HD.....

**Neyînî:**

- Min nediwêrî ku ez derkevim

---

<sup>24</sup> - (Min wêrî ku ez bikevim ), (min wêrî ez bikevim ) û (min wêrî bikevim ), her sê şewaz jî durist in.

- Te nediwêrî ku tu derkevî
- We nediwêrî hûn derkevin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma kê diwêrî ku derkeve ?!
- Wan çawa diwêrî ku derkevin ?!
- Ma te diwêrî tu derkevî ?
- HD.....

**- Boriya Çîrokî:**

(Ev boriya ku bi raweya / wêrîbû / bi pirranî bikar tê û şûna boriyên dîtir jî digire):

**Erênî:**

- Min wêrîbû ez derkevim
- Te wêrîbû tu derkevî
- Wan wêrîbû ku derkevin
- HD.....

**Neyînî:**

- Min newêrîbû ku ez derkevim
- Te newêrîbû ku tu derkevî
- Me newêrîbû ku em derkevin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma min wêrîbû ez derkevim ?!
- Kê wêrîbû ku derkeve ?!
- Te jî wêrîbû tu derkevî ?!
- HD.....

**- Dema Nuha:****Erênî:**

- Ez diwêrim (wêrim) derkevim
- Tu diwêrî (wêrî) derkevî
- Ew diwêre (wêre) derkeve
- Em diwêrin (wêrin) derkevin
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez newêrim derkevîm
- Tu newêrî derkevî
- Ew newêre derkeve
- Em newêrin derkevin
- Hûn newêrin derkevin
- HD.....

**Pirsiyarî:** - Ma ez diwêrim derkevîm ?!

- Kî diwêre derkeve ?!
- Gelo hûn diwêrin derkevin ?!
- HD.....

**- Paşeroj:**

**Erênî:**

- Ez ê / dê biwêrim derkevîm (wêribim) <sup>(25)</sup>
- Tu yê / tê / biwêrî derkevî
- HD.....

**Neyînî:** - (Li gora pîvanê, gerek neyîniya vê demê jî wek neyîniya dema nuha bihata: / ez newêrim /. Lê di nav gel de, wek neyîniya daxwazî, (ez ê newêribim) bikar tê.

**Pirsiyarî:**

- Ma ez ê biwêrim derkevîm ?!
- Gelo ew ê biwêre derkeve ?!

**- Raweyên Daxwazî:**

**Fermanî:**

- Biwêre, wêribe (tu)
- Biwêrin, wêribin (hûn)

**Bilanî:**

- Bila ez wêribim.....
- Bila hûn biwêrin.....

**Xwezîni:**

- Xwezî min wêrîba.....
- Xwezî hûn wêribin.....

**Mercî:**

- Eger tu wêribî bêyî Amedê

<sup>25</sup> - Di nav gel de, li şûna (biwêrim), raweya (wêribim) bikar tê.

Ez ê jî wêribim te bibînim

### 6 - Hatîn:

(Hatîn) karekî nederhingêv e, di hemû dem û raweyan de tê veguhestin. Bi vê danasînê ev kar, karekî asayî ye. Lê ji ber ku li hindê herêman karê (weriyan) li şûna (hatîn) / nemaze di dema paşeroj û raweya fermanî de / bikar tê, hinek şarezayên zimên ev kar di nav karên rêzder (awarte) de dûrêz kiriye:

Nimûne:

#### Hatîn

#### Weriyan

Paşeroj:

- Ez ê bêm (êm)

ez ê werim

Fermanî:

- Bê (tu)

were

Bên (hûn)

werin

Lê rastiya vî karî ew e, ku di hemû dem û raweyan de tê veguhestin:

- **Demên Borî:**

- **Nêzboriya Xwerû:**

**Erênî:**

- Ez hatim

- Tu hatî

- Ew hat

- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nehatim

- Tu nehatî

- Ew nehat

- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez hatim ?!

- Bo çî tu hatî ?!

- Ew hatin ?!

- HD.....

- **Boriya Sergihayî:**

**Erênî:**

- Ez hatime
- Tu hatiyêye
- Em hatine
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nehatime
- Hûn nehatine
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Kî hatiye ?
- Çima hûn hatine ?!
- HD.....

**- Boriya Berdewam:****Erênî:**

- Ez dihatim
- Tu dihatî
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nedihatim
- Hûn nedihatin
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma tu dihatî ?!
- Kî dihat ?
- Gelo ew dihatin ?!
- HD.....

**- Boriya Çîrokî:****Erênî:**

- Ez hatibûm
- Tu hatibûyî
- Em hatibûn
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nehatibûm
- Tu nehatibûyî
- Hûn jî nehatibûn
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma hûn hatibûn ?!
- Kî ji we hatibû ?
- Ez bixwe hatibûm ?!
- HD.....

**- Dema Nuha:****Erênî:**

- Ez dihêm (têm)
- Tu dihêyî (têyî)
- Ew dihê (tê)
- Em dihên (tên)
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nayêm (nahêm)
- Tu nayêyî (nayê.../ nay...î)
- Ew nayê
- Em nayên <sup>(26)</sup>
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez dihêm / têm ?!
- Gelo hûn dihên / tên ?!
- HD.....

**- Dema Paşeroj:****Erênî:**


---

<sup>26</sup> - Karê (hatin) di dema (nuha) de, li herêma Behdînan bê sivikbûn bikar tê (ez dihêm). Lê li pîrraniya herêman tîpa / h / tê avêtin û tîpa / i / ji / di / tê avêtin, / d / jî dibê / t / : (Ez dihêm = ez di... êm = ez d..... êm = ez têm).  
- Li herêma / Efrînê / raweya (netê) jî, li şûna (nayê) bikar tê.

- Ez ê bêm (bi + ê + im = b... ê.. m)
- Tu dê bêyî
- Ew dê bê
- Em ê bên
- HD.....

**Neyînî:**

- Ez nayêm
- Tu nayêyî (nayê.... / nay...î)
- Ew nayê
- Em nayên
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ew ê bên ?
- Kengî hûn ê bên ?!
- Çima ew ê bê ?!
- HD.....

**- Demên Daxwazî:****Fermanî:**

- Bê, bihê / were (tu)
- Bên, bihên / werin (hûn)

**Bilanî:**

- Bila ew jî hatibûna

**Xwezînî:**

- Xwezî em hatibana

**Gerekî:**

- Gerek hûn hatibana

**Mercî:**

- Eger ez bêm, ma ew ê jî bê ?!
- Eger hûn hatibûna min ê hûn dîtibûna
- Xwezî em bihatana !
- Gerek hûn hatibana
- Bila ew jî hatibûna

- HD.....

### 7 - Bûn (to be - être):

(bûn) karekî rêzder e, aloz û arîşdar e. Aloziya vî karê awarte ji du hêlan ve berçav dibe:

- Teşe (form)

- Veguestin.

### - Teşe (form):

Di zimanê Kurdî de / 2 / kar bi teşeya (bûn) hene. Her du (bûn) jî nederhingêv (têneper) in. Lê ji hêla wate û veguestinê ve her du kar ji hev cuda ne. Yek ji wan rêzder e û yê dî asayî ye.

- **(Bûn)a** rêzder bi wateyê nêzî wateya (hebûn, heyîn) bikar tê:

- Ez dostê te bûm

(ez dostê te hebûm)

- Nuha jî ez dostê te me

(nuha jî ez dostê te heme)

- Sibe jî ez ê dostê te bim

(sibe jî ez ê dostê te hebim)

- **(Bûn)a** bi wateyê nêzî wateya (çêbûn), ku têgeha guherînekê digihêje rewşa karayê vê (bûn)ê:

- Em bûn dostên hev

(me hev nedinasî, va em bûn dostên hev)

(dostanî çêbû)

- Em dibin dostên hev

(berê em ne dost bûn va em dibin....)

(dostanî çîdibe).

- Em ê bibin dostên hev

(nuha em ne dost in, lê em ê bibin....)

(dostanî dê çêbibe)

Ji van mînakên xuya dibe ku wateyên her du (bûn)an ji hev cuda ne. Bikaranîna wan jî, di pêvajoya hevokan de ji hev cuda ne. Tenê di dema (nêzboriya xwerû) de, eger pêvebir (pêxistî) <sup>(27)</sup> hevalnav (rengdêr) be, hingê her du (bûn) bi yek rawe û yek formê di pêvajoya hevokê de bikar tên.

Wek:

<sup>27</sup> - Pêvebir (pêxistî) : Ew navdêr û rengdêrê ku di hevokê de cihê rewşa salixî digire, wek (Azad jîr bû, gul sor in )

- Pîvebir : Celadet Bedirxan bikar aniye.

- Pêxistî : Kamîran Bedirxan bikar aniye.



- Ava ku min vexwar sar bû (bûn rêzder e)
- Xwarin li ber bê sar bû (bûn asayî ye)

Lê carinan, (bûn) di yek hevokê de wateya her du karan (rêzder û asayî) bi xwe ve digire. Anku, dibe ku (bûn) rêzder be û dibe jî ku asayî be.

Wek:

- Sêv sor bûn.

Ev hevok wateya her du (bûn)an dide:

- (Bûn)a rêzder: Dema min sêv kurrîn sor bûn.
- (Bûn)a asayî: Dema min sêv kurrîn kesk bûn,  
pişt re sor bûn.

Derbarî vê tevheviya her du (bûn)an, pirs ev e: Gelo, em ê çawa van her du karên hevteşe, di hevokeke wisan de, ji hev binasin û wateyên wan jî (li wê gorê) destnîşan bikin ?!

**- Dengdayîn / Fişar (stress):**

Ev kêşeya tevheviya her du (bûn)an diyardeyeke danganî (fonitîkî) ye. Dengê bilêvkirina her du (bûn)an ne wek hev in. Dengê (û) di (bûn)a rêzder de hinekî kurt û sivik dibe, nêzî dengê (u) bilêv dibe.

Wek:

- Hevalê te ez bûm.

Lê dengê (û) di (bûn)a asayî de, hinekî dirêjtir yan bilindtir tê bihîstin:

- Ez bûm hevalê te.

Ev diyardeya danganî di hemû zimanan de heye.

Zimanzanan nîşandekê bo kîta dengbilind (dirêj) daye xuyakirin. Di zimanê me de jî ev diyarde peyda dibe, lê ew nîşeya cudakirina dangan hêj cih negirtiye.

Hinek şarezayan ew nîşe bi navê (kurpandin) daye nasîn û hindekan jî navê (derbedayîn) lê kiriye. Ev her du nav jî bi mebesta dengdayîn (fişar) hatine.

Di zimanê Ingilîzî de (stress) hatiye, di yê Firensî de (accent) hatiye, di yê Farisî de (tikeyê şiddet - تکیه شدت) û di zimanê Erebî de (nebre - نبرة) tê gotin.<sup>(28)</sup>

Vêca ku em nîşandekê, wek (...َ...)(dînin ser,

yan bin kîta <sup>(29)</sup> dengdayî, em ê bilêvkirina bêjeya wê kîte ji hevteşeya wê binasin û em ê wateya wê jî, ji ya dîtir cuda bikin.

**Nimûne:**

<sup>28</sup> - Mirov dikare forma nîşandekê danganî û cihê wê li gora xwestekê destnîşan bike.

<sup>29</sup> - Kîte : Birrekî dangan, wek (ar - û - vir - ba -... ).

- Xwarin:

- (Weku kar) dengê kîta (rin)asayî ye:

- Zarokan sêv xwarin

- Xwarin:

- (Weku jêder) dengê kîta (rin) bilindtir tê xwendin (xwarin).

Li vê gorê jî em karin dengê bilêvkirina jêder û karan ji hev binasin:

**Jêder**

**Kar**

- Ha<sup>o</sup>tin

em hatin

- Kuş<sup>o</sup>tin

wan ew kuştin

- Ke<sup>o</sup>tin

hûn ketin

- Sorb<sup>o</sup>ûn

gul sor bûn

Bi heman pîvan jî, dengê bilêvkirina her du (bûn)an ji hev tên nasîn û wateyên wan jî, ji hev cuda dibin:

**- Veguhestin:**

- Dar mezin bû (berê mezin bû)

- Dar mezin bû (berê piçûk bû).

Di veguhestinê de form û raweya hevokên her du karên (bûn) ji hev cuda ne:

**- Demên Borî:**

**- Nêzboriya xwerû:**

Di vê boriyê de raweyên her du (bûn)an li gora celebê pêvebir (pêxistî), wekî hev tên yan cudayî hev tên:

Eger pêvebir hevalnav (rengdêr) be, hingê her du (bûn) li pey pêvebir tên:

- Tirî reş bû (rêzder)

- Tirî reş bû (asayî)

Lê eger pêvebir nav yan cînav be, (bûn)a rêzder li paş pêvebir tê û (bûn)a asayî li pêş tê:

- Azad serok bû (rêzder)

- Azad bû serok (asayî)

Li vê gorê, veguhestina her du karan di nêzboriya xwerû de bi van raweyên jêrîn pêk tê:

**Bûna Rêzder**

**Bûna Asayî**

**Erênî:**

- Ez dirêj bûm

ez dirêj bûm

- |                  |                |
|------------------|----------------|
| - Tu dirêj bûyî  | tu dirêj bûyî  |
| - Ew çi bû ?     | ew bû çi ?     |
| - Em şagirt bûm  | em bûn şagirt  |
| - Hûn şagirt bûn | hûn bûn şagirt |
| - Ew çi bûn ?    | ew bûn çi ?    |

**Neyînî:**

Di warê neyînkirina (bûn)a rêzder de, alava / ne / dikeve ser pêvebir (ez negeş bûm), lê di neyînkirina (bûn)a asayî de / ne / dikeve ser (bûn)ê bixwe (ez geş nebûm):

**Bûna Rêzder**

- Ez ne dirêj bûm
- Tu ne dirêj bûyî
- Ew ne kes bû
- Em ne şagirt bûn
- Hûn ne şagirt bûn
- Ew ne tişt bûn

**Bûna Asayî**

- ez dirêj nebûm
- tu dirêj nebûyî
- ew nebû kes
- em nebûn şagirt
- hûn nebûn şagirt
- ew nebûn tişt

**Bûna Rêzder****Pirsiyarî:**

- |                         |                        |
|-------------------------|------------------------|
| - Ma ez dirêj bûm ?     | Ma ez dirêj bûm ?      |
| - Ma tu dirêj bûyî ?    | ma tu dirêj bûyî ?     |
| - Ka ew kî bû ?!        | ka ew bû kî ?          |
| - Gelo em şagirt bûn ?! | çima em bûn şagirt ?!  |
| - Ma hûn şagirt bûn ?!  | çire hûn bûn şagirt ?! |
| - Ew çi bûn ?           | ma ew bûn çi ?         |

**Bûna Asayî**

Her weku me berê jî gotibû, (bûn)a rêzder di demên borî, yê dîtir de (sergihayî, berdewam, çîrokî), nayê veguhestin, anku bikar nayê. Lê (bûn)a asayî, weku hemû karên normal di her dem û raweyê de tê veguhestin.

**- Dema Nuha:**

Di dema nuha de (bûn)a rêzder bi raweyên (im, î, e, in) tê dîtin, bêyî ku tiştek ji binyata wê diyar bibe, lê (bûn)a asayî li gora rêzika xwe tê veguhestin.

Nimûne:

**Bûna Rêzder****Erênî:****Bûna Asayî**

- |                 |                  |
|-----------------|------------------|
| - Ez dirêj im   | ez dirêj dibim   |
| - Tu dirêj î    | tu dirêj dibî    |
| - Ew karmend e  | ew dibe karmend  |
| - Em şagirt in  | em dibin şagirt  |
| - Hûn şagirt in | hûn dibin şagirt |
| - Ew çi ne      | ew dibin çi ?    |

**Neyînî:**- (Bûn)a rêzder bi / ne / yê tê neyînkirin (dikeve ser pêvebir) lê (bûn)a asayî bi / na / tê neyînkirin:

**Bûna Rêzder****Bûna Asayî**

- |                                  |                  |
|----------------------------------|------------------|
| - Ez ne dirêj im <sup>(30)</sup> | ez dirêj nabim   |
| - Tu ne dirêj î                  | tu dirêj nabî    |
| - Ew ne karmend e                | ew nabe karmend  |
| - Em ne şagirt in                | em nabin şagirt  |
| - Hûn ne şagirt in               | hûn nabin şagirt |
| - Ew ne tişt in                  | ew nabin tişt    |

**Pirsiyarî:**

- |                     |                      |
|---------------------|----------------------|
| - Ma ez dirêj im ?  | ma ez dirêj dibim ?  |
| - Ma tu dirêj î ?   | ma tu dirêj dibî ?   |
| - Gelo ew dirêj e ? | gelo ew dirêj dibe ? |
| - Em dirêj in ?     | em dirêj dibin ?     |

- HD.....

**- Dema Paşeroj:**

Di vê demê de (bûn)a rêzder bi binyata dema nuha (b) û paşkokên kesîn tê veguhestin, wek (ez ê bim). Lê(bûn)a asayî bi binyat û pêşgira dema paşeroj (bi) û paşkokan tê veguhestin:

**Bûna Rêzder****Bûna Asayî**

- |                   |                   |
|-------------------|-------------------|
| - Ez ê dirêj bim  | ez ê dirêj bibim  |
| - Tu yê dirêj bî  | tu yê dirêj bibî  |
| - Ew ê dirêj be   | ew ê dirêj bibe   |
| - Em ê dirêj bin  | em ê dirêj bibin  |
| - Hûn ê dirêj bin | hûn ê dirêj bibin |
| - Ew ê dirêj bin  | ew ê dirêj bibin  |

<sup>30</sup> - Li herêmanan (Ez dirêj nin im / nîn im) jî tê gotin.

Neyînî:

Di paşeroj de (bûn)a rêzder bi alava / ne / dikeve raweya neyînî. Ev alav dikeve ser pêvebir (pêxistî), ne ser (bûn)ê:

**Erênî**

**Neyînî**

- |                     |                      |
|---------------------|----------------------|
| - Ez ê dostê te bim | ez ê ne dostê te bim |
| - Dostê te ez ê bim | dostê te ne ez ê bim |
| - HD.....           |                      |

Lê (bûn)a asayî, weku her karê sergihayî, bi alava / na / dikeve raweya neyînî:

**Bûna Rêzder**

**Bûna Asayî**

- |                      |                              |
|----------------------|------------------------------|
| - Ez ê ne dirêj bim  | saleke dî jî ez dirêj nabim  |
| - Tu yê ne dirêj bî  | saleke dî jî tu dirêj nabî   |
| - Ew ê ne dirêj be   | saleke dî jî ew dirêj nabe   |
| - Em ê ne dirêj bin  | saleke dî jî em dirêj nabin  |
| - Hûn ê ne dirêj bin | saleke dî jî hûn dirêj nabin |
| - Ew ê ne dirêj bin  | saleke dî jî ew dirêj nabin  |

**Pirsiyarî:**

- |                       |                       |
|-----------------------|-----------------------|
| - Ma ew ê poşman be ? | ma ew ê poşman bibe ? |
| - Hûn ê poşman bin ?  | hûn ê poşman bibin ?  |

**- Raweya Fermanî:**

**Bûna Rêzder**

**Bûna Asayî**

**Erênî:**

- |                       |                       |
|-----------------------|-----------------------|
| - Mirovekî mêrxas be  | bibe mirovekî mêrxas  |
| - Mirovinî mêrxas bin | bibin mirovinî mêrxas |

**Neyînî:** - Ne tirsonek be nebe tirsonek

- |                   |                |
|-------------------|----------------|
| - Ne tirsonek bin | nebin tirsonek |
|-------------------|----------------|

Di raweyên daxwazî de jî, her du (bûn) ji hev cuda dibin:

**Xwezîni:**

- Xwezî ez pêşmerge bim (bûna rêzder)
- Xwezî ez bibim pêşmerge (bûna asayî)
- HD.....

**Bilanî:**

- Bila ez pêşmerge bûma (bûna rêzder)

- Bila ez bûbûma pêşmerge (bûna asayî)
- HD.....

**Gerekî:**

- Gerek ez pêşmerge bim (bûna rêzder)
- Gerek ez bibim pêşmerge (bûna asayî)
- HD.....

**- (Bûn) û paşkokên (im, î, e, in):**

**Berî** nuha me gotibû, (bûn)a rêzder a bi wateyeke nêzî wateya (hebûn), di dema nuha de vederî forma xwe ya resen tê veguhestin. Lê di demên borî, paşeroj û raweya fermanî de tîpin ji binasaziya wê diyar dibinn:

- Em dostên hev bûn (borî)
- Em ê dostên hev bin (paşeroj)
- Dostên hev bin (fermanî)

**Di dema nuha de tiştek ji binasaziya (bûn)ê namîne:**

- Ez dost im
- Tu dost î
- Ew dost e
- Hûn dost in

**Derbarî** van kurtebêjeyan (im, î, e, in) pirseke giring û rewa di serên şareza û xemxurên zimanê Kurdî de digere:

- Gelo ev pirtik (im, î, e in) çi ne?! Şarezayên zimên ew çawa dane nasîn?!

Zimanzanên Kurd, di pirtûkên xwe de, ew kurtebêj ne mîna hev dane nasîn:

- Reşîdê Kurd, Samî Tan û hinin dîtir jî, ew kirine cînavên kesane û navên (cînavên dûmdar, cînavên pêvebestî û cînavên paşgînkirî) li wan kirine.

- Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Sadiq Behadînê Amêdî, Nûrî Elî Emîn û gelekên dîtir jî dibînin, ku karê (bûn)ê, di dema nuha de ne.

- Qenatê Kurdo jî, ew kirine paşkokên nav û cînavan.

Ev her sê danasînen durrî hev di pirtûkên rêzimanî de cî girtine û di nav destên xwendevanan de ne. Ev jî ne durist e ku bi vê têvelî û tevheviyê bimînin.

Berî ku ez nêrîna xwe derbarî vê kêşeya rêzimanî eşkere bikim, em ê bi hev re wan her sê danasînan di ber çavên xwe re derbas bikin û hindekî li ser wan rawestin:

**A - Cînav:**

1 - Em dizanin ku cînav ew bêje ne, yên ku cihê navdêran digirin û li şûna wan bikar tên.

Wek:

- Azad çû dibistanê  
(ew çû dibistanê)
- Zînê pirtûk xwend  
(kê çi xwend)
- (wê ew xwend)

Li gora vê danasînê, gerek ev kurtebêje jî (eger cînav bin) cihê navdêran bigirin û li şûna wan bikar bên. Gelo, di vê mînakê de (Azad şagirt e), ev (e) dikare cihê (Azad) bigire (..... şagirt e)?! Dibe ku ji pêvajoya qissekirinê bê zanîn ku (e) li (Azad) vedigere, lê di vê mînakê de (Azad û Zîn şagirt in), (... û... şagirt in), yekcar nayê zanîn ku ev / in / li kîjan cînavî, ji van cînavan (em, hûn, ew) vedigire.

2 - Di vê mînakê de (ez şagirt im), ev (im) cihê çi girtiye ?!. Berçav e ku (im) bi cînavê kesîn / ez / ve girêdayî ye. Lê ku em çavên xwe ji gelek pirsan bigirin û bibêjin, ev / im / cîgirê cînavê / ez / e, gelo bi çi behaneyê û bo çi sûdê (cînav) cihê cînavê diyar û eşkere digire ?!

3 - Di pêvajoya hevokan de nav dibin kara (kiryar) û berkar (bireser). Dema ku nav tên avêtin cînav cihê wan digirin û li şûna wan dibin kara û berkar.

Wek:

- a - Hevalan mêvan dîtin  
(wan ew dîtin)
- b - Heval mêvanan dibînin  
(ew wan dibînin)

Di mînaka / a /yê de / in / bi navê (mêvan) û cînavê (ew) ve girêdayî ye. Ev nav û cînav jî, di hevokê de berkar in. Vêca ku ev / in / jî cînav be gerek ew jî cihê (mêvan, ew) bigire û wekî wan bibe berkar:

Wek:

- Hevalan / in / dîtin ?!

Di mînaka / b /bê de jî (heval, ew) kara (kiryar) in û / in /a (dîtin) bi wan ve girêdayî ye. Gerek ev / in / jî karibe cihê wan bigire û li şûna wan jî bibe kara!.

Wek:

- / in / mêvanan dibînin ?!

Ev jî nabe û ne durist e ku bibe.

4 - Di şêwezarê Kurmancî de cînavê kurtkirî / ê / tenê cînavê pêgir (pêvebestî) ye. Ev cînav bi du şêweyan ji cînavên kesîn (wî, wê) kurt dibe:

- a - Bi pêbestan re (bi, ji, li, di):

- Bi + wî, wê = bê = pê

(Min bi wê nivîsî = min pê nivîsî)

- Li + wî = lê

(Min li wî da = min lê da)

- HD.....

b - Bi karan re:

- Min da wî = min dayê

- Ez ketim wê = ez ketimê

Lê di şêwezarê Soranî de cînavê (pêvebestî) heye û bi navê (ranawî likaw) tê nasîn. Ji van mînakên jorîn tê zanîn ku ev kurtebêj (im, î, e, in) ne cînav in.

### B - Karê (bûn):

1 - Çi karê heye du mercên sereke bi xwe ve digire:

- Demeke destnîşankirî (borî, nuha, paşeroj)

- Bûyereke (rûdanek, bizavek)

Karê (bûn) jî, di dema borî û paşeroj de, ev her du merc lê xuya dibin:

- Ez şagirtkî jîr bûm (borî)

- Ez dê şagirtkî jîr bim (paşeroj)

Lê di dema nuha de: (Ez şagirtkî jîr im), pêjina dema nuha, bi egera / im / ê ji hevokê tê (nuha ez şagirtkî jîr im), lê ka rûdana bûyerê ?!. Anku, bûyer, bi şêweyekî diyar û eşkere, di van pirtikan de (im, î, e, in) nîn e.

2 - Dema ku karekî nederhingêv (têneper) di dema borî de bikar tê yek ji van pirtikan (im, î, e, in) digihêje wî karî: - (Ez ketim). vêca ku ev (im) karê (bûn)ê di dema nuha de be, çawa karekî borî (ket)digel karekî dema nuha (im), her du kar bi hev re, karekî di nêzboriya xwerû de saz dikin ?!. Anku, (ket + im = ketim) ?!.

3 - Eger (yî), di vê mînakê de (tu hevalê min bûyî) karê (bûn) di dema nuha de be, gerek karê (bûyî) karekî lêkdayî (hevedûdanî) be, ji (bû + yî), anku / (bûn) di dema borî de + (bûn) di dema nuha de = (bûneke lêkdayî) di dema borî de / ?!.

4- Eger rast ev (im, î, e, in) karê (bûn) di dema nuha de bin, gerek hemû kar di zimanê Kurdî de lêkdayî bin. Anku, binesaziya her karekî (lêkerekê) di zimanê Kurdî de ji / 2 / karan pêk hatiye.

Wek:

- Çûn: Ez diçim (diç + im)

- Hatin: Tu hatî (hat + î)

- Nivîsîn: Ew dinivîse (dinivîs + e)



- Ketin: Em ketin (ket + in)

Eger em bibêjin ev (im, î, e, in), di van mînakên de karê (bûn) in, jixwe karên (diçim, hatî, dinivîse, ketin) lêkdayî ne û karên xwerû (sade) di zimanê me de nîn in. Ev jî gotineke nayê gotin, ku bê gotin jî nayê pejirandin.

### C - Paşkok (Paşpirtik):

Gotina (paşkok) navlêkirina Prof. Qenatê Kurdo ye. Lê Qenat ronî nekiriye, ka çima ev kurtebêje (im, î, e, in) paşkok in (eger gotibe jî min bixwe nedîtiye). Bi dîtina min jî, ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan in. Ev paşkok di raweya rast û resen (bê verês / tewang) de li pey nav û cînavan bikar tên û weku alavên girêdanê ser û pêgirên hevokan bi hev ve girêdidin, wateyên wan sergihayî (temam) dikin.

Wek:

- Dostê te ez im
- Tu dostê min î
- Azad dostê me ye
- Em dostên hev in

Ev paşkok li pey karan jî bikar tên, lê herî bi nav û cînavan ve girêdayî ne, çî ew nav û cînav di hevokan de kara (kiryar) bin.

Wek:

- Ez diçim xwendingehê
- Tu jî li malê dimînî

Yan jî berkar bin.

Wek:

- Min hûn dîtî
- We ez dîtî

ji van nimûne û mînakên derbasbûyî tevan tê zanîn ku ev pirtik (im, î, e, in) ne cînav in, ne karê (bûn) di dema nuha de ne jî. Bi baweriya min ew paşkokên nav û cînavên raweya rast (bê tewang) in. Anku, peyrewên wan ên pabendî (lazim) ne. Ew nav û cînav li kû bikar bînin ev paşkok jî li pey wan bikar tên.

Li dawiya danasîna van paşkokan pîrsek, giring rabeî me radiweste:

- Eger ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan bin, vêca karê (bûn) di dema nuha de li kû dimîne ?! Em dizanin ku karê (bûn) di demên borî, paşeroj û raweya fermanî de diyar û Berçav e.

Wek:

- Ez dostê we bûm (borî)

- Ez ê dostê we bim (paşeroj)

- Dost be, dost bin (fermanî)

Lê di dema nuha de tenê pêjna karê (bûn) bi forma (im)ê re tê rojevê.

Wek:

- Nuha jî dostê we ez im

Pirs xwe dûbare dike: Eger ev (im) ne (bûn) be, gelo ev pêjna karê (bûn)ê di dema nuha de, ji kû, yan ji çi hatiye ?!. Pirseke rast û rewa ye. Lê sê encamên rast û ronî jî, beranberî pirsê li dar in:

1- Ev (im) ne karê (bûn)ê ye.

2 - Tîpek tenê jî, ji binesaziya karê (bûn) di

hevokê de nîn e.

3 - Pêjina (bûn)a dema nuha ji hevokê tê.

Çawa (bûn) nîn e û di heman dem de pêjina wê heye ?! Ma ev dibe ?! Jixwe ev e kêşeya vê (bûn)a rêzder.

Bi egera vê kêşeya aloz jî nêrînên zimanzanan, derbarî danasîna wê ne yeksan in !

Em dizanin ku hevoka navdêrî di zimanê Hindo - Ewropî de nîn e, lê derbirîneke navdêrî heye, wek(ka birayê te ?). Zimanê Kurdî jî yek ji zimanên Hindo - Ewropî ye.

Vêca ku ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan bin (bêyî ku girêdanek wan bi jêdereke bûyerî ve hebe), divê em mukir bîn ku hevoka navdêrî di zimanê me de heye û ev hevok (ez şagirt im) hevokeke navdêrî ye. Ev jî arîşeyeke dîtir e vederî hevoksaziya zimanên Hindo - Ewropî ye.

Bi baweriya min, hemû hevokên zimanê Kurdî kardarî (lêkerî) ne. Kêşeya hevokên van paşkokan jî bi van mînakên jêrîn ronî dibe:

1 - Ez ji te bawer dikim

(Ez ji te bawer /... / im)

Ez ji te bawer im.

2 - Tu bi min bawer dibî

(Tu bi min bawer /... / î)

Tu bi mi bawer î.

3 - Ew cihê baweriya min digire

(Ew cihê baweriya min /... / e)

Ew cihê baweriya min e.

Di van her sê mînakên de paşkokên (im, î, e) bi karên dema nuha (dik..., dib..., digir...) ve hatine xebitandin, lê ew bixwe jî peyrewên cînavên (ez, tu, ew) û pêgirên wan in. Dema ku her sê kar ji mînakên hatin avêtin, paşkok li şûna wan man û pêjina dem û bûyerên wan bi xwe ve girtin. Loma

em dibêjin, pêjina bûyereke nepenî di dema nuha de ji hevokên van paşkokan tê. Bi vê egerê jî, pîrraniya şarezayên zimên guman dikin ku ev paşkok karê (bûn)ê di dema nuha de ne.

Di zimanê Farisî de karê " bûden" di dema borî de beranberî karê "bûn" bikar tê:

**Farisî****Kurdî**

- |                    |                |
|--------------------|----------------|
| - Men şagird bûdem | Ez şagirt bûm  |
| - To şagird bûdî   | Tu şagirt bûyî |
| - Û şagird bûd     | Ew şagirt bû   |

Lê di dema nuha de, li şûna (bûden) karê (hesten) bikar tê:

**Farisî****Kurdî**

- |                        |                |
|------------------------|----------------|
| - Men şagird hest - em | Ez şagirt - im |
| - To şagird hest - î   | Tu şagirt - î  |

Carinan jî karê (hesten), bi egera sivikbûnê tê avêtin û hevok bi vî şêweyî tê xebitandin:

- Men şagird (...) em = men şagird - em
- To şagird (...) î = to şagird - î
- HD.....

Di zimanê Kurdî de jî, ez bawer dikim ku karê (bûn) di dema nuha de, li dirêjahiya demê, hatiye avêtin û paşkokên nav û cînavan (weku şûnmayên / bûn /a avêtî) li pey pêvebir (pêxistî) mane:

- Ez şagirt (dib - im) = ez şagirt.... im
- Tu şagirt (dib - î) = tu şagirt..... î
- Ew şagirt (dib - e) = ew şagirt... e
- Em şagirt (dib - in) = em şagirt.... in
- Hûn şagirt (dib- in) = hûn şagirt... in
- Ew şagirt (dib - in) = ew şagirt.....in

Em dizanin ku her zimanek taybetmendiya wî hene û zimanê Kurdî li yê Farisî jî nayê pîvan. Lê di vê xala rêzimanî de her du ziman nêzî hev dibin, digel ku di Farisî de hevoka karê girêdanê (hestin), hevokeke navdêrî ye, lê hevoka Kurdî (ez şagirt im), hevokeke kardarî (lêkerî) ye, (bi egera karê avêtî, ku ew jî / bûn /e).

Di zimanê me de karê (hebûn lêkdayî ye), ji binyata karê (heyîn), ku (he)ye û (bûn)a rêzder pêk hatiye.

De ka em binêrin, çawa ev kar bikar tê:

- Dema borî: Hespekî min hebû
- Dema nuha: Hespekî min he.... ye = heye

Diyar e ku di dema nuha de (bûn) ji (hebûn)ê tê avêtin, wekî ku (bûn)a xwerû ji hevoka (Ez şagirt... im) hatiye avêtin !

Hebûna van paşkokan (im, î,e, in) sê erkên watedarî pêk tînin:

1 - Heyîna û kiriyariya wan nav û cînavên ku bi wan ve girêdayî tekez dikin:

- Ez hatim

- Azad mamoste ye

Dema ku cînav bi egera sivikbûnê tê avêtin, paşkok hebûna wî tekez dike:

- Tu çi kes î ?

-..... Kurd im !

2 - Jimara nav û cînavên ku bi wan ve girêdayî destnîşan dikin.

- Ev mirov mîvan e (yek mirov)

- Ev mirov mêvan in (gelek mirov)

3 - Dema ku (bûn)a rêzder di dema nuha de tê avêtin paşkok pêjina dem û bûyeran destnîşan dikin:

- Sala par ez karmend bûm

(bûyera karmendiyê di dema borî de)

- Nuha jî ez xwendekar im

(bûyera xwendekariyê di dema nuha de)

Wisana jî:

- Em heval bûn (borî)

- Em heval in (nuha)

- Em dê heval bin (paşê)

Bi vê şirovekirina xwe em rastnivîsa van paşkokên kesîna jî tekez dikin, ku ev paşkok bi du şeweyan tên nivîsîn:

1-Eger li pey karan bîna, divê bi wan ve bîna nivîsîn:

-Ez hatim

-Tu dinivîsî

-Hûn dostên min bûn

2-Lê ku li pey nav û cînavan bîna, hingê divê serbixwe bîna nivîsîn:

-Ez mêvam im

-Tu nivîskar î

-Hûn dostên min in

**8 - Hebûn:**

Bi dîtina min, karê (hebûn) karekî lêkdayî ye, ji binyata karê (heyîn) ku (he) ye û karê (bûn)a rêzder pêk hatiye, anku (he + bûn = hebûn).

Em dizanin ku hemû karên nederhingêv (têneper) bi cînavên koma / ez / re tîn xebitandin:

- Ez çûm gulistanê

Karên derhingêv jî bi cînavên koma / min / re tîn xebitandin:

- Min gul çinîn

Lê karê (hebûn) ji vê rêzan û destûra karan der e. Anku, ev kar li gelek herêman û di pirtûkên rêzimanî de jî, bi cînavên koma / min / re tê veguhestin:

- Min dil hebû ku ez biçim gulistanê

- Te çar dost hene

- Wan malek heyê

- HD.....

Bi dîtina min ev şêwazê xebitandina karê (hebûn) ku bi cînavên koma / min / re pêk hatiye, di reseniya xwe de bi cînavên koma / ez / re bikar hatiye. Anku, raweya hevokên mînakên me, di reseniya xwe de ev e:

- Dilê min hebû ku ez biçim gulistanê

(ew hebû.....)

- Çar dostên te hebûn

(ew hebûn.....)

- Malek wan heyê

(ew heyê.....)

Ji bilî vî şêwazê rêzder jî, karê (hebûn) bi şêweyekî asayî jî, bi cînavên koma / ez / re tê xebitandin:

- Sala şewata Sînema Amûdê Reşo hebû

- Wê salê hûn jî hebûn

- Va nuha jî em hene

Destpêka mijarê me got, karê (hebûn) li ser karê (bûn) ava bûye. Bo vê egerê jî veguhestina van her du karan (hebûn, bûn), di gelek raweyan de wekî hev tê xebitandin:

**- Dema Borî:**

Karê (hebûn) jî, weku karê (bûn)a rêzder, di nêzbvoriya xwerû tenê de tê veguhestin.

- **Nêzboriya Xwerû** <sup>(31)</sup>:

**A - Raweya Resen:**

**Erênî:**

- Ez hebûm
- Tu hebûyî
- Ew hebû
- Em hebûn
- Hûn hebûn
- Ew hebûn

**Neyînî:** - karê (hebûn) di dema borî de bi alava / ne / dikeve raweya neyînê. Li hinek herêman ev kar bi (tune) tê neyînkirin. Di raweya neyînê de (he) ji (hebûn) tê avêtin û alava neyînê / ne / şûna wê digire:

- Ez hebûm = ez nebûm / tunebûm
- Tu hebûyî = tu nebûyî / tunebûyî
- Hûn hebûn = hûn nebûn / tunebûn
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez hebûm ?
- Tu hebûyî ?!
- HD.....

**B - Raweya Veguhertî:**

**Erênî:**

- Min pirtûkek hebû  
(pirtûkek min hebû)
- Te pirtûkin hebûn  
(pirtûkin te hebûn)
- Wî pirtûk û pêûs hebûn  
(pirtûk û pêûsên wî hebûn)
- Me pirtûk û pêûs hebûn  
(pirtûk û pêûsên me hebûn)
- HD.....

<sup>31</sup> - Li herêmanan (hebûye, hebûwe), anku di boriya sergihayî de jî, tê bihîstin.

**Neyînî:**

- Min pirtûkek nebû / tunebû
- (pirtûkek min nebû / tunebû)
- Te pirtûkin nebûn / tunebûn
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma min pirtûkek hebû ?!
- (ma pirtûkek min hebû ?!)
- Gelo te pirtûkin hene ?!
- (gelo pirtûkin te hene ? !)
- HD.....

**- Dema nuha:**

Di mijara karê (bûn)a rêzder de me nêrîna xwe derbarî ketina (bûn), di dema nuha de diyar kiriye. Vêca, ji ber ku ew (bûn) bixwe bûye parçeyekî bingeîn ji karê (hebûn), dîsan (bûn) di dema nuha de tê avêtin û (he) digel paşkokên kesane dimîne:

**A - Raweya Resen:****Erênî:**

- Va ez he.... me = ez heme (heyim)
- Va tu he.....yî = tu heyî
- Ew he.....ye = ew heye
- Em he..... ne = em hene (heyin)

**Neyînî:** - Beriya nuha me got, (bûn)a (hebûn) di dema nuha de tê avêtin û / he / tenê dimîne. Lê ku / he / ket raweya neyîniyê, ew jî tê avêtin. Anku di neyîniya dema nuha de karê (hebûn) tê avêtin û paşkokên kesane (weku şûnmayî), dem û bûyera karê avêtî tekez dikin. Alavên neyînê, yên ku li herêmên corecor bikar tên ev in:

(Nin, nîn, ni, tune):

- (Ez heme)
- Ez nin im, ez nîn im, ez tune me
- (Tu heyî)
- Tu nin î, tu nîn î, tu tune yî
- (Ew heye)
- Ew ni ye, ew nin e, ew nîn e, ew tune ye

- (em hene)
- Em nin in, em nîn in, em tunen in (tune ne)
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma ez, weku karker, heme ?!
- Ma tu, weku karker, heyî ?!
- Gelo ew hene ?!
- HD.....

**B - Raweya Veguhertî:****Erênî:**

- Min dostek heye  
(dostekî min heye)
- Te dostin hene  
(dostin te hene)
- Wê dostin hene  
(dostin wê hene)
- We jî dostek heye  
(dostekî we jî heye)
- HD.....

**Neyînî:**

- Min dostek ni ye, nin e, nîn e, tune ye  
(dostekî min ni ye, nin e, nîn e, tune ye)
- Te dostin nin in, nîn in, tune ne  
(dostin te nin in, nîn in, tune ne)
- Wê dostin nin in, nîn in, tune ne  
(dostin wê nin in, nîn in, tune ne)
- HD.....

**Pirsiyarî:**

- Ma min dostek heye ?!  
(ma dostekî min heye ?!)
- Gelo te dostin hene ?!  
(gelo dostin te hene ?!)



- HD.....

**- Dema Paşeroj:**

**a - Raweya Resen:**

**Erênî:**

- Ez ê hebim

- Tu yê hebî

- Ew ê hebe

- Em ê hebin

- Hûn ê hebin

- HD.....

**Neyînî:** Di raweya neyîniya paşeroj de, (hebûn) bi alava / ne / û / tune / tê neyînkirin:

- Ez ê nebim (nehebim)

Ez ê tunebim

- Tu yê nebî (nehebî)

Tu yê tunebî

- Ew ê nebe

Ew ê tunebe

- Em ê nebin

Em ê tunebin

- HD.....

**b - Raweya Veguhertî:**

**Erênî:**

- Min pirtûkek dê hebe

(pirtûkek min dê hebe)

- Te pirtûkin dê hebin

(pirtûkin te dê hebin)

- Wî pirtûk dê hebe

(pirtûka wî dê hebe)

- Wê pirtûk dê hebin

(pirtûkên wê dê hebin)

- Me pirtûk dê hebin

(pirtûkên me dê hebin)

- HD.....

**Neyînî:**

- Min pirtûkek dê nebe (nehebe)

Min pirtûkek dê tunebe

(pirtûkek min dê nebe / tunebe)

- Te pirtûkin dê nebin

Te pirtûkin dê tunebin

(pirtûkin te dê nebin / tunebin)

- Wî pirtûk dê nebe

Wî pirtûk dê tunebe

(pirtûka wî dê nebe / tunebe)

- Wê pirtûk dê nebin

Wê pirtûk dê tunebin

(pirtûkên wê dê nebin / tunebin)

- Me pirtûk dê nebin

(pirtûkên me dê nebin / tunebin)

- HD.....

**- Raweyên Daxwazî:**

**- Fermanî:**

- Hebe, nebe / mebe

- Hebin, nebin / mebin

Di raweyên daxwazî, yên dîtir de jî (bilanî, xwezînî, gerekî, mercî....), karê (hebûn) li gora demên xwe yên pêşkerî tê veguhestin.

**Borî:**

- Bila ez hebûma !

- Xwezî ez nebûma / tunebûma

- Gerek hûn hebûna

- Eger bapîrên me nebûna, em ê jî tunebûna !

- HD.....

**- Nuha û Paşeroj:**

- Bila tu hebî ?

- Xwezî em hebin !
- Gerek hûn jî hebin
- Eger welatê me tunebe, rûmeta me jî dê tunebe !
- HD.....

## Zimanî nynorskîy Norwêç

**Nûsînî:** *Lars Sigurdsson Vikør*

**Wergêrran le Inglîsîyewe:** *Hesenê Qazî*

**Têbînî wergêrr:** em nûsraweyey Lars Sigurdsson Vikør, profêsorî zimannasî zimane Skandînavîyekan le zankoy Oslo u berpirsyarî serekî qamûsî Norwêjî (Norsk Ordbok), qamûsêkî zanistî sebarete be Nynorsk u lehçe Norwêjîyekan, sêyemîn babete ke le layen em wergêrrewe be mebestî nasîyawbûnî hogiranî babetî nasik u girîngî zimannasane le Kurdistan, legell barudoxî zimanî le Norwêj wek wullatêk ke dû standardî zimanî heye wergêrdirawe. Em babete be pêçewaney wutarî pêşû le ruwangey le serkirdinewey Nynork nûsrawe.

### Nynorsk çîye?

Nynorsk şêwezarêkî standardîy nûsînî zimanî Norwêjîye. Wuşeke bo xoy manay " Norwêjî Nwê " yan " Norwêjî Modêrn "e. Em zimane le ser binemay lehce Norwêjîyekan dandirawe, ke le Sedey Nozdeyem da zimannas u şa'îr Ivar Aasen qa'îde u rêsay pênûsînî le şêwey here berayî xoyda bo darrişt u,le sallî 1885we şan be şanî zimanî standardî nerîtî , ke be reçellek Danmarkî bû, bellam bere bere bû be

" Bokmålî Norwêjî" didanî pêda hatûwe u wekû zimanî Norwêjîy pênûsîn be resmî nasrawe. Bokmål u Nynorsk be tenîşt yekewe le hawjînî hêminane da bûnu hen , bellam her weha le sertaserî sedey

rabirdû da le gell yek le rikeberî berdewam u xebatîş dq ( şerre qise) bûn. Em wutare zanyarî seretayî lemerr Nynorsk u barudoxî zimanî Norwêjî le ruwangey Nynorsk ewe degêrrêtewe.



*Ivar Aasen*

*Şorişgêrrî Zimanî u babegewrey Nynorsk*

1813- 1896

### **Pêşîney mêjûyî**

Zimanî Norwêjî ser be binemalley zimanîy Jêrmenîye, ke be asayî be likî zimananî Jêrmenî Rojawayî ( Inglîsî, Allmanî, Holendî, Firîsîyayî u îdîke.) u likî zimananî Jêrmenîy Bakûrî (Norwêjî, Swêdî, Danmarkî, Ayslendî, Farwêseyî) dabeş dekrê. Norwêjî zor le Swêdî u Danmarkî nizîke, u axêweranî ew zimanane le yekitrî têdegen.

Le serubendî sedekanî nêwerrastda, Norwêj şanişînêkî serbexo bû u lewêda be lehce cîyawazekanî zimanî Norsêyî kon; Old Norse qise dekira, ew zimane be tenîşt zimanî Latînîyewe wekû zimanî resmîy nûsînîş dekar dekira. Bellam le sallî 1380 be duwawe, Norwêj şay xoy le gell Danmark beş kird, u bere bere bû be jêrdestey ew wullate. Boye le mawey Sedekanî Pazde u Şazdey zayînîda zimanî Danmarkî wekû zimanî standardî nûsîn cêgey Norsêyî konî girtewe. Bellam, le astî qisekirdin da lehce Norwêjîyekan le nerîtî xoyan hellnebirran u bekar dehêndiran u rêzimanekanyan le rûy zimanî Norsêyî konewe ke dezgayekî zor pêçellpêçî gerdan kirdinî hebû sade kiranewe u binaxeyekî hasanî modêrnyan peyda kird be sîstêmêkî gerdan kirdinî zor kemewe.

Le sallî 1814-î zayînîda, Norwêj le Danmark cwê bûwewe. Duway hewlêkî nîwe tewaw bo ewey wullateke bibê be wullatêkî serbexo, le gell Swêd kewt u yekêtîyekî le gell ew wullate pêk hêna, bellam ta dereceyekî zor hukm u fermanrewayî nêwxoyî hebû, u legell şitî dîke da, parlamen, hukûmet u sîstêmî qezayî le merr xoy hebû.

Lew serubende da korrukommellî nuxbey Norwêj be zimanî Danmarkî deyannûsî u le qîsekirdinîşda le ser binemay dezgay fonêtîkî Norwêjî şêweyekî allugorrkirawî ew zimaneyan bekar dehêna. Swêdîyekan qet hewlyan neda zimanî xoyan be ser Norwêjîyekananda bîsepênin, ca boye destelatî zimanî Danmarkî herwa berdewam bû u çî qortî le ser rê nebû.

Serhellhênanî nasyonâlîzm u romantîsîzmî neteweyî,ke le Allmanewe serçawey degirt u lew serubende da rêgey bo nêw zor wullatan der kirdibû pirrîşkî geyîşte Norwêjîş, eme le nêw kor u komellî destroywî Norwêj narezayetêkî werûjand sebarew rastîyey ke zimanêkî cîyawazî Norwêjî le gorrêda nebû, cige le lehcekan nebê , ke zor le nîşanekanî zimanî Norsêyî konyan parastibû u bergey eweyan girtibû ke zimanî Danmarkî le nêw xoyda neyan tuwênêtewe u be rûnî lew zimane cîyawazbûn. Romantîsîzmî neteweyî bizûtneweyek bû bo netewe çêkirdinî kultûrî le Norwêj, u beşêkî girîng u gewre le çalakîyekanî birîtî bû le ko kirdinewe u billaw kirdnewey folklor (çîrok u heqayet, efsaney bûmî, beytubaw, mûzîkî folklorî cor be cor), u ko kirdnewey deq be zimanî Norsêyî kon;Old Norse ( ke zor car binçîney Ayslendîyan hebû), girdewekoyî mêjûy Sedekanî Nêwerrast u konîne nasî u çalakî dîkey lew çeşîne. Lêkollînewe u " aşkrakirdinî" lehce Norwêjîyekan beşêk lew xebate bû. Ivar Aasen (1813- 96) , kurrî cûtêrkî xellkî Rojaway Norwêj şanî weber ew kare da, ke kemta zor le lay xoy çendîn ziman u lewane Norsêyî kon, zimannasî berawirdkarane, u lehcey xoy fêr bibû u rêzimanêkî bo dana u wuşekanî le kitêbêkda şî kirdewe, Komelley Seltenetî Zanstekan, ke daûdezgayekî taybetî u nadewlletî bû le şarî Trondheim, yarmetî mallî pêkird bo ewey be sertaserî wullatda bigrê u sebarew be lehcekan zanyarî kokatewe: pirrojeyek ke çuwar sallî xayand, u le sallî 1848 da Ivar Aasen rêzimanêkî berawirdîy lemerr lehce Norwêjîyekan billaw kirdewe ke deyselmand ewan dekrê wekû zimanî Norwêjî xesllet u hebûnêkî serbexoyan hebê , le gwên u hawşan le gell zimananî Swêdî u Danmarkî. Dû sall duwatir ew qamûsêkî têr u teselî billaw kirdewe.

Le ser binemay ew zanyarîyaney koy kirdibûnewe, Aasen qa'îde u rêsay zimanêkî nûsînî darrişt ke dekira wekû "şêwezarî seretayî" bê bo lehcekan: wate ew lehcekanî le gell yekitrî u le gell zimanî Norsêyî kon le ber yek rona, u têkoşa ew xalle bidozêtewe ke ewanî le yektrî cwê dekirde. Be sazdanewey formî hawbeş ke ew hestî dekirde le binaxey rastîne u şêwe cîyawazekanî qise kirdin da

hebûn, Aasen bew akame geyîşt ke binçîneyekî hawbeşî bo zimanêkî Norwêjî standard dozîwetewe. Le sallî 1853 da, Ivar Aasen kitêbêkî billaw kirdewe ke deqî lehce cîyawazekanî têdabû u her weha sebarew bew zimane standardey ke pêşinyarî dekird u nêwî lînebû " Landismål ", wate zimanî wullat ( le wuşey " wullat" mebestî Norwêj bû, egerçî zor car ew nêwe be manay dûyemî, wate, " gund u derewey şaran" lêkdedrayewe). Aasen dirêjey be karekanî xoy da u le sallî 1864 da rêzimanêkî pêwerdaneî gewrey billaw kirdewe u le sallî 1873êş da qamûsêkî pêwerdaneî hemûlayeney billaw kirdewe u bew karey lew birrwaye dabû ke standardekey birrawetewe u tewawe.

Aasen be zimanî xoy honraweşî billaw kirdewe, ke ême pêy dellên Nynorsk egerçî em nêwe be resmî tenê le sallî 1929da wexo kira. Nûseranî dîkeş be rêpêllgey Aasenda çûn u hêndey pêneçû zimaneke bo nûsînî mijar u babetî corbecor bekar hêndira, honrawe, pexşanî dastanî, Bexişanî nadastanî, rojnamenûsî, kitêb u kerestey xwêndin, u dirama u şano. Ew formey Aasen bo zimanekey darriştû le layen zor kesane we ta radeyek be kon dadendira, bellam bekarhêneranî le beş cîyawazekanî wullat da zimanekeyan tîftîfe da u hasantiryan kird be dahênanî şewey xoyan le ser binemay lehce herêmîyekanî zêdî xoyan.

Nynorsk be pêyî birryarêkî parlamani le sallî 1885 da be resmî wek zimanêkî yeksan le gell Danmarkî rageyêndira, u le sallî 1892 da derfetî ewe pêk hat ke wekû zimanî xwêndin le fêrge seretayîyekanda bixwêndirê. Le mawey sî sallî duwatir da zor be xêrayî perey sendî u ta sallanî 1920 , bû be zimanî bandest u zall le beşî here gewrey nawçekanî derewey şaran le Norwêj, be taybetî le Rojaway Norwêj, bellam her lewêş na. Le sallî 1902 da wek zimanî tobzî lêhat bo perwerdey mamosta u fêrkaran u le sallî 1907 tenanet le taqîkirdinewekanî xwêndinî amadeyîşda tobzî bû, be tenîşt zimanekey dîkewe , Danmarkî ( ke be rêgey çaksazî le rênûs da le salanî 1907 u 1917 da Norwêjêndirabû le ser binemay şewe qise kirdinî Başûrî – Rojhellat, u Bokmålî modêrnî lê saz bû). Le sallî 1930 da, birryar dira hukûmet debê be pêy wîst u dawxuwazî şaromendan u ewey ke kamyân helldebjêrin her dûk zimaneke bekar bihêne. (u em birryare le komellêk rêsa u pesindkrawî resmî da şîkirayewe)

Her lew serubende da ruwalletî ziman gorrdira. hukûmet hewlî da dû şewezarekan le yek nizîk katewe u duwacar be rêgey zincîreyek çaksazî le rênûs da be bekarhênanî şewekanî qisekirdinî Rojhe llatî u Bakûrî, le cîyat şewekanî Rojawayî le Nynorsk u şewey Danmarkî le Bokmålî herdûk şewezarekan têkellaw bika u le yekitrîyanda bitwênêtewe. Bellam ew sîyasete le gell xorragirî u dijayetîyekî zor berew rû bûwewe u le sallanî 1960kanî sedey rabirdû da bere bere destî lêhellgîra.

Le gell eweşda, ew sîyasete akamî ewey lê kewtewe , ke standardî nûsînî Nynorsk le ser binemay lehce rojawayîyekan kemtir bêtewe u êsta eme le bekarhênanda bandeste. Bellam normî nûsînî resmî nermunîyane, wate dekrê miro be pêy şêwezarekanî herêmî Nynorsk binûsê, yan berew Bokmål lêy nîzîk bêtewe yan be arastey dîke da, berew formêkî zor nerîtîtir ke le ser binemay darriştinî Ivar Aasen.

Le kirdewe da, peresendinî Nynorsk be hoy lemperêkî gewre bertesik kira, ewîş ewe bû ke Nynorsk qet neytuwanî şaroçke yan şarêk dagîr bika. Le şaroçke u şaranda destelatî Bokmål bê emla u ewla bû, hem tuwanayî u hem lawazîy Nynorsk le ber ew cîyawazîyane u ta radeyekîş ew dijayetî u nakokîyane bû ke le nêwan şarnişînî Norwêj u gundnişînî Norwêj le gorrêda bûn: Nynorsk remzî " gundayetî " bû, u le serdemî romantîsîzmî neteweyîyewe le hêz u tuwanayî nirxekanî gundetî Norwêj kelkî werdegirt.

Legell eweşda, ew barudoxe le duway Şerrî Dûyemî Cîhanî allugorrî beser dahat. Be sin'atî bûnî wullat u berewpêşçûnî geyandin u têknolojî modêrn, şarnişînî u nawendêtî zîyadî kird u perey estand,ke emeş Bokmålî behêz kird u bûwe hoy lawazî Nynorsk.Ca boye, be dem sallanî penca u şêstekanî Sedey Bîsemewe, Nynorsk zorbey hellwêst u piley xoy le fêrge seretayîyekanda le dest da, u tenê le sallanî heftakanda le çeqî nawçey xoy ahêkî be berda hatewe, ke le beşî duwatir da basî lêwe dekeyn. Be pêyî " têkellawêk le bîrhellsengandin u şîkirdinewey dêmogirafî" êsta wa dadendirê ke Nynorsk le layen 10 ta % 15 danîştûwanî Norwêjewe bekar bihêndirê: eme dekate nîw mîlîon nefer. Le astî sertaserî, her lew serubende da Nynorsk rahêzêndirawe , be rêgey derfet pêdanî bo ewey le dezgay weşanî dewlletî da be kar bihêndirê, u be rêgey pêşxistinî daw u deziga u damezrawey kultûrîy be hêzî Nynorsk. Serbaqî eweş, hewcê be xebatêkî berdewam heye bo ewey Nynorsk bituwanê le derewey mellbendî behêzî cugrafîyayî xoy da, xoy biparêzê.

### **Sinûrdananî Cugrafîyayî**

Le rûy cugrafîyayîyewe, mellbendî behêzî Nynorsk be derecey yekem birîtîye le Rojaway Norwêjî gundnişîn u dewerekanî dewruberî ( zorbeyan doll u derey şaxawîn le başûrî Norwêj). Şaroçkekan hêşta milî lê desûn u wexoy naken, bellam le Norwêjî Rojawa da jimareyek şaroçkey "nwê" qut bûnetewe bo pîşesazî êlêktro – şîmî u êlêktro – mêtalîk, yan erk u karî komellayetî wekû perwerdey herêmî yan nêwendgelfî mîdîya,u lêreda, Nynorsk pile u hellkewtî ta radeyek be hêzî bedest hênawe



u wekû zimanî hawbeş le gişt erke komellayetîyekanda bekar dehêndirê u bem pêye zimaneke beşêk le " şarstanî bûnî " be dest hênawe.

### Sinûrdananî Zimanî

Le barî zimanîyewe, zor car bo bêganan asteme le pêwendîyekanî nêwan Nynorsk u Bokmål têbigen. Ewan zor we yekitrî deçin, beşêkî le ber nizîkî u we yekçûnî tewaw le nêw gişt zimane skandînavîyekanda u, beşêkîşî le ber sîyasetî resmî dostane u aştîyaney zimanî, bellam zîyatir le ber ewey ke her dûk zimanekan be berdewamî le 'eynî pêwendî u çuwar çêwe da dekar kirawin , ewe karêkî ewtoy kirdûwe hemû Norwêjîyekan na çalakaneş bê herdûkyan bizanin, ca boye cêkirdinewey her dûkyan le barudoxî pêwendî tebîî u asayî da rêgey kirdûwetewe bo zor şêwey dîkey Nêwerrast u têkellaw " dîyare zor zîyatir be çûnî Nynorsk be arastey Bokmål da, le ber ewey Bokmål layenî behêztire", bellam dîyare hemîşeş awa nîye. Zorbey Norwêjîyekan be lehcan , yan şêwey allugorrkirawî lehcan qîse deken , ke têyanda towî şêwey Bokmål u şêwey Nynorsk hen.

Cîyawazî serekî le nêwan Bokmål u Nynorsk le binaxey wuşe u wuşe ronan daye. Zorbey ew cîyawazîyane le merr formî dîyarin, nek çîn u destey wuşan, bellam hêndêk cîyawazî ewtoş hen u dûk zimaneke " derxer" y nasrawî le merr xoyan heye. Le gerdankirdinî naw da, Nynorsk sîstêmêkî sê zayendî heye ke le Norsey Konewe boy be mîrat mawetewe, le katêkda naw le Bokmål da dû zayendî heye ke emeşî le Danmarkîyewe bo mawetewe, katêk ke, nêr u mê le " zayendêkî hawbeş" da têkell debinewe u lêk debestirên. Le ber ewey teqrîben gişt lehce Norwêjîyekan lew xalle da le gell sîstêmî Nynorsk hawbeşin, tenanet ew lehcanêş ke le Başûrî Rohellat u le çeçî pêgey Bokmâlî modêrn da bekar dehêndirên, em şêwezare zor formî mêyî nawanî wexo kirdûwe ke wêdeçê le qonaxî têperrîn da mabinewe le nêwan dû zayendî u sê zayendî da. Binaxey wuşe u wuşe ronan le Nynorsk da zor le Bokmål pêçellpêçtir, bellam zor be qa'îdetirîşe.

Le barî dengsazîyewe (phonology),be tewawî wek yek wan: wate her dûkyan dekrê be rawêjî cîyawazî herêmî telefuz bikrên u her kamyân zîyatir de naw xoyanda cîyawazî gewreyan heye ta ewey le ast yektirî cîyawazbin. Le rûy nehwişewe, ewan tewaw wek yek wan, egerçî le Nynorsk da guşarêkî behêztirî pêwerî heye berew riste darriştinî sakartir " le ser binemay zimanî zarekî", be birrbirr wêjî u ristey kurttir le çaw Bokmål , ke lewbareyewe cîyawazî gewretirî heye denaw şêwey be karhênanî corbecorda. Bellam lem buwareş da kemptazor pêkhatin u nizîkbûneweyekî lexowe rûdeda, ewîş le ber ew rastîyey ke her dûkyan le 'eynî komellge dan, u gişt Norwêjîyekan kemptazor

norm u qa'idekanî her dûk zimanekanyan de mêşikî daye u katêk ke denûsn le bin karlêkerî her dûkyan dan.

De nêw em dû şêwezare da cîyawazî wuşeş heye ke le seretawe ew cîyawazîyane zor zîyatir bûn: le katêkda Bokmål bo henbaney wuşanîş piştî be Danmarkî debest, u be lêşaw wuşey lê dexwastewe, Nynorsk petîgerî dekird u piştî be wuşey xomallî debest, ke zor car le lehcanî werdegirt yan day detaşîn. Bellam ew cîyawazîyane kemtir bûnetewe: Bokmål zor wuşey le lehcan wergirtûwe, le hemankatda Nynorsk destî le petîgerî hellgirtûwe le pêwendî le gell wuşe nêwnetewîyaney ke rîşey Yonani- Latîniyan heye. Dîyare Nynorsk hêştta meylî petîgerî parastûwe le hember wuşey xuwarzawe le zimanî Danmarkî u le zimanî Allmanî newî (Low German) ra ( ke serçaweyekî zor behêzî wuşe beqerzdan bû be zimane skandînavîyekan le rabirdû da), çunkû ew core wuşane le nûsînî Nynorsk da be wuşey " Bokmål " u duwacar be " xirap" dadendirên, egerçî zor lewan le zimanî qisekirdinda asayî u bawin. Jimareyekî lezêde lew core wuşane le standarî Nynorskîş da wexo kirawin, u zor le bekarhêneran boyan asteme ke wuşey şîyawî pesind kirdin u napesnd lêk bikenewe, ca boye ew petîgerîye zorcar debête hoy narrezayetî.

### **Hellkewt u Piley Qanûnî**

Be pêy qanûn Nynorsk le gell Bokmål yeksane. Ew qanûnî zimanîyey ke êsta le buwarî xizmete giştîyekanda karî pêdekrê degerrêtewe bo sallî 1980, u ew pirênsîpey têda guncêndirawe, ke dîyare zor kontir damezrawe u karî pêkirawe. Ew qanûne be wurdî basî gişt ew erkane deka ke deke wne ser estoy hukûmet bo bekarhênanî ew dû şêwezarene le buwarî giştîda: Ew namaney le layen şaromendan ra bo daw u dezga hukûmetîyekan denêdirên debê bew şêwezare zimanîye wullam bidrênewe ke namekey pê nûsrawe. Form u pirisnamey cor be cor ke derdekrên debê be herdûk şêwezarekan, yan hêndêkyan her be Bokmålî u hêndêkyan her be Nynorskî bin. Her şardarîyek boy heye şêwezarek wekû zimanî resmî xoy hellbijêrê, u hukûmet le pêwendîyekanî xoyda le tek ew şardarîye da debê ew şêwezare bekar bihênê. Ew şêwezarey bo pêwendî le gell dabeşkravî îdarî gewretir le şardarîyekan (wekû estanekan) bekar dehêndirê be pêy komellêk rêsay dîke dîyarî dekirê u eweş bestirawetewe be jimarey ew şardarîyaney ke le çuwarçêwey her kam le estanekanda em yan ew şêwezaryan hellbijardûwe. Nizîkey yek le çuwarî şardarîyekan Nynorskîyan hellbijardûwe, giştîyan le nêw ew nawçe cugrafîyaye da hellketûn ke le serewe bas kira. Ewanî dî, zor le şardarîyekan Bokmålîyan hellbijardûwe, le katêkda, her ewendeş bêlayanin ke emeş be asayî manay waye ke le wanda hem bo raperrandinî karubarekanî xoyan u hem le pêwendîyekanyan le gell hukûmetda

Bokmâl bandest u zalle. Dîyare debê amajey pêbikrê ke ew qanûne zor car pêşêl dekrê u lew cêyey debê Nynorsk bekarbihêndirê Bokmâl dekar dekirdirê: eme gîrugrîftêkî bawe u zor car dûpate debêtewe u hemîşe pêdawîstî ewey hênawete gorrê ke rêkxirawekanî parêzerî Nynorsk hewil biden ta ew cêyîyey dekrê ew naheqîye kem bikenewe.

### **Pile u Hellkewtî Şêwezarekan le Perwerde da**

Nynorsk zimanî yekemî % 15 mindalle medreseyekane le Norwêj, ke zorbeyan le mellbendî cugrafîyay behêzî ew şêwezareda dejîn. Bo her qutabixaneyek, zimanî perwerde yan be rêgey hemûpîrsîyekî giştîy xocêyî , yan ( ber le sallî 1915) be rêgey birryarêk le layen destey berrêweberîy nawçeyî qutabixane dîyarî dekirê, yan eger lew bareyewe pêşûtir qet hîç birryarêk werinegîrabê Bokmâl bekardehêndirê wekû Danmarkî pêşû. Qanûn dellê eger jimareyekî berçaw le danîştûwanî nawçeyek dawxuwarzî gorrînî zimanî perwerde biken, le nawçeke hemûpîrsîyekî giştî dekrê, bellam destey berrêweberî qutabixane birryar deda, bêtû jimareyekî kem le dengderan le hemûpîrsîyeye da beşdarî biken. Eger be lanî kemewe de ser xêzan ( daykubaw) bîyanewê ,mindallekanyan be şêwezarekî dîke bixwênin, ew demî polêkî hawşanî polekanî dîkeyan bew şêwezare bo rêk dexten. Boye zor le qutabxanekan be kirdewe her dûk şêwezarekan bekar dehênin. Ewe manay waye ke Nynorsk le zorêk le qutabxane Bokmâlîyekan bekar dehêndirê, bellam pêçewanekeşî her raste, u le qutabxanekanî hêndêk le şar u şaroçe here gewrekan , le wane Osloş, pol hene ke mindallan têyanda fêrî Nynorsk debin , egerçîş jimarey ew core polane zor kemin.

Qutabîyan le sallî heştemî xwêndinda, bo xoyan birryar deden wekû " şêwezari serekî" Bokmâl yan nî Nynorsk hellbijêrin. Bellam le heman katda debê şêwezarekey dîkeş wekû " şêwezari dûyem" bixwênin, u le taqîkirdinewey kotayîda ke be asayî le temenî hejdesallanda dekrê debê înişayek be her dû şêwezarekan binûsn. Boye Nynorsk le hemû wullat da amadeye, bellam zîyatir wekû "şêwezarekî dûyem".

Be pêy rêsay perwerde gişt kereste u kitêbî xwêndin le qutabxanekanî Norwêj da debê le ser binemay Bokmâl u Nynorsk gellalle kirabin bo ewey molletî bekarhênanyan bidrê. Emeş, duway xebatêkî dûr u dirêj le layen bizûtnewey Nynorsk u êsta be yarmetî darayî berçawî dewlletîyewe cêbecê kirawe bo zorbey kitêbekan sebarete be babete gewrekanî xwêndin, le katêkda bo babete piçûktirekan, her dûk şêwezarekan le beşe cîyawazekanî kitêbêkda cêyan kirawetewe. Le gell

eweşda, barudoxî bekarhênanî her dûk şêwezarekan le mîdîyay êlêktronî modêrn da hîç rêsayekî ewtoy bo danendirawe.

Le zankokan u kolîce herêmîyekan ke êsta le hemû estanekanî wullatda damezrawin, Nynorsk zîyatir bestirawetewe be bekarhêneranî tak. Nynorsk le çeçî mellbendî behêzî xoy , le kolîcekanî Sogn og Fjordane u Telemark u Møre og Romsdal zalle ,dîyare çaweruwan dekirê herwaş bê. Le hêndêk damezrawey dîkey xwêndinî beriz da, wekû Zankoy Bergen, Nynorsk be rêje be berbillawî dekar dekrê, u le zankokanî dîkeşda, ta radeyek derfet dedirê be bekarhênanî. Le hêndêk dewruberî piçûktirî akadêmî da jimareyekî berçaw le bekarhêneranî Nynorsk kobûnetewe, be taybetî le buwarî zanstîye mirovîyekananda. Le babetî " ziman u edebîyatî skandinâvîyay, be taybetî zimanî Norwêjî" da, hellbet Nynorsk wekû towêkî girîng deparêzdirê. Nêwende here behêzekanî Nynorsk le dinyay akadêmî da birîtîn le Enîstîtûy Ivar Aasen le kolêcî Møre og Romsdal ( le Volda, nizîkî şwênî le dayîkbûnî Ivar Aasen) u beşî Nynorsk le dêpartimanî Qamûsnûsî u lehce nasîy Norwêjî Zankoy Oslo.

Pile u Hellkewtî Nynorsk le Komellge da be Giştî le buwarî mîdîya da, Nynorsk hellkewtî behêze be derecey yekem le mellbendî behêzî xoy u le hêndêk le damezrawe neteweyye sertaserîyekananda. Norwêj zor rojnamey herêmî u nawçeyî heye, lewane le nawçey Nynorsk da, egerçî zoryan be tîrajêkî kem billawdebnewe. Rojnameyekî sertaserî rojane be Nynorsk nîye, egerçî le sedey rabirdû da hebû. Bellam hewtûnameyek heye be nêwî Dag og Tid ( roj u kat ), ke billawkiraweyekî bîrîye u basî babetgelî sîyasî, kultûrî u komellayetî deka. Le zorbey ew rojnamaneyda ke be Bokmålî derdekewin, lewaneye Nynorsk le layen nûseranî derewey rojnamekan ra bekarbihêndirê, bellam zor kem le layen endamanî destey nûseranî ew rojnamanewe dekardekrê. Rojname here gewre u pîrr xwênerewe sertaserîyekan laperrekanî xoyan be rûy Nynorsk da daxistûwe, le katêkda ew rojnamaney le rojaway Norwêj billaw debinewe, be taybetî rojnamey here be rimênî Bergens Tidende , be rêje cêyekî baş deden be kerestey Nynorskî , herçendîş be derecey yekem Bokmål bekardehênin.

Le buwarî weşanî radyo u tîlêvîzyonî da, Norwêj le sallanî 1980kanda înhîsarî dewlletî ( degazî weşanî dewlletî Norwêj yan NRK ) hate der u bû bberew sîstêmêkî rikeberî taybetî u azad. Be duway ewe da çendîn kanallî tîlêvîzyonî u zor îstgey radyoyî nawçeyî damezran. Le weşanekanî NRK da Bokmål hemîşe zall u bandest bûwe, bellam Nynorsk u lehce herêmîyekan lew dezgaye da be rêje hemîşe cêyekî selametî kemayetîyan hebûwe. Le sallî 1970 da parlamenî Norwêj raygeyand NRK debê hewil bida be amancî danê ke %25 weşane zarekîyekanî be Nynorsk bê, amancêkî ke heta êsta

qet pêy negeyîştûwe, bellam be asayî rêjey billaw kirdinewe be Nynorsk le nêwan 10 u 20 le sed le rayelle da bûwe. Bekarhênanî lehcekan le sallî 1970we be şêweyekî berçaw zîyadî kirdûwe, u Norwêjî kirdûwe be yekêk le wullatanî here leserezo u hellker lew buware da, egerçî zorkesîş, be taybetî denaw axêweranî şarnişînî Bokmål da, be aşkirayî ew hellkirdin u rêge pêdane şermezar deken. Le ber ewey ke lehce cîyawazekan, u Bokmål u Nynorsk be giştî çak le yektirî têdegen, barudoxêkî ewto rexsawe be bê ewey hîç gîrugiriftêkî gewre bête gorrê. NRK hêştta serekîtirîn u gewretirîn kompanî weşanî radyo u tîlêvîzyonîye le Norwêj, bellam dezgay weşanî here girîngî taybetî , wate TV2, egerçî milî nedawe bewey ke bernameyekî zor be Nynorsk billaw bikatewe, bellam baweşî bo lehcekan kirdûwetewe, u emeş be cuwanî deyslemênê ke zorbey bîsteran eweyan belawe pesinde u qebûllî deken. Helbet le radyo nawçeyekanda, lehcekan zor dekar dekrên.

Wez'î Nynorsk le buwarî şano da behêze emeş le sayey ew rastîyeyda ke yekêk le tîyature here serekîyekan le Oslo (Det Norske Teatret) , le layen bizûtnewey Nynorskewe damezra u karekanî tenê be Nynorsk pêşikêş deka. Damezranî ew tîyature degerrêtewe bo sallî 1913, u yek le şano here çalakekane bo pêşkêş kirdinî nuwandinî muzîkal le Norwêj. Le sallanî 1970 bem layewe, zor tîyaturî herêmî damezrawin (cige lewaney ke pêştir le şare gewrekanda hebûn). Nynorsk be şêweyekî berdewam le tîyaturekanî Norwêjî Rojava, u be radeyekî kemitir, le cêgey dîkeş be kar dehêndrê. Dîyare zorbey şanokan kilasîkîn, u zor car le zimanî makî bêganewe wergêrrdirawin, yan wexo kirdinî edebîyatî kilasîkin. Le zemanî Ibsen, bemlayewe diramay Norwêjî hênde zor çalak nebûwe, bellam yekêk le diramatîste here karame u pirr berhemekan lew sallaney duwayîda ke le astî nêwneteweyîşda benêwbange wate Con Fosse (1959- ), be Nynorsk denûsê.

Be Nynorsk film zor kem saz dekrê, tenê çend filmêk nebê sebarete be edebîyatî kilasîkî Nynorsk. Le nêw kilîsay ( Lutêrî dewlletî) da ( ke %85 danîştuwan be qise ser bew rêrewen), Nynorsk le çeçî nawçey behêzî xoyda hellkewt u piley pitewe. Yarmetîdanî serekî Nynorsk be jîyanî kilîsayî le derewey ew nawçeyê da hebûnî komellêk sirûdî dîniye be Nynorsk , ke benêwbangin u le hemû cêyek dexwêndirênewe. Kitêbî Incîl, hellbet hem be Bokmål u hem be Nynorsk heye ( yan çapî cîyawaz be herdûkyan ke le serdemî cîyawaz da billaw bûnetewe u le zimanî deqekanda hewil dirawe ew allugorraney le her dû şêwezarekanda rûyan dawê reng bidenewe).

Le zorbey rêkxirawekanda ( sêndîka pîşeyîyekan, rêkxirawekanî dîkey berijewendîparêz yan komelle dillxuwanekan), le derewey pêgey nawçey Nynorsk, Bokmål bandeste, cige le rêkxirawe sertaserîyekananda nebê ke le akamî bizûtnewey parastinî Nynorsk da seryan hellhênawe u ser be

kultûrî gundîyane u derewey şaranî Nynorskin. Partîye sîyasîyekan zortir Bokmål bekardehênin, bellam le pêgey Nynorsk u car car le bone u bestênî dîkeş da Nynorsk dekar deken.

Le jîyanî bîznis u tecaret , le rêklamî bazrganî,u buwarî dîkey ewto da, hêzekanî bazarî azad meylyan berew bekar hênanî şêwezarî here gewre wate Bokmål e, tenê le hêndêk bestênî taybetî da ke be "bêlayan" da dendirê rêge deden be kemayetî xoy binwênê. Lew buwaraneda Nynorsk cige le çeqî nawçey xoy, wate rojaway Norwêj nebê dengî nîye.

### Edebîyat

Edebîyat hemîşe u êstaş yek le buware behêzekanî Nynorsk bûwe. Ivar Aasen be tenîşt zimannas bûn u zimandarrêj bûnyewe şa'îrîş bû, u komellêk le şê'rekanî u ew goranîyaney le ser şê'rekanî wî saz kirawin hêstaş zor xoşewîst u gelwîstin. Zor le nûseranî edebîyat rêçkey ewîyan girt, u zimanekeyan dewllemend kird u be bon u beramey cîyawazî beşe cîyawazekanî wullat xemllandîyan u berew pêşîyan bird, u pereyan da be şêwaz u babete cîyawaze edebîyekan. Dû şa'îr u nûserî here girîng u benêwbang ke be dûy Ivar Aasen da hatin Aasmund Olavsson Vince (1818-70) u Arine Garborg (1851-1924) bûn. Ewan zoryan le samanî şê'rî bekarhêneranî duwatirî Nynorsk zîyad kird u şêwazî modêrnî Nynorskyan le bestênî rojnamenûsî u wutarinûsî da berew pêş bird u xemllandîyan. Le seretawe Nynorsk le metirsî ewe da bû le çuwardîwarî " folklor" u kultûrêkî zimanî ke her çawî le rabirdûbê, qetîs bê. Vince u Garborg dewrêkî birryarder u serekîyan hebû bo ewey zimaneke biken be amrazî derbirrînî bîr u ramanî sîyasî u komellayetî hawçerx , u yarmetîyan kird be radîkall bûn u dêmokratîk kirdinî bizûtneweke lew serubendî da. Garborg romannûsîş bû, u serçawey nûsînekanî lew zanyarî u lêzanîyeda bû ke sebarete be kultûrî dînî nawçey gundîy zêdî xoy le Başûrî Rojaway Norwêj u lemerr rewte anarşîst u nîhîlîstekan denêw rûnakkîran u " bohêmîyekan" y pêtext da heybû.

Be duway têwersûrranewey sede da edebîyatêkî dewllemend u berîn peyda bû. Lêre da basî çend nûserî here nasraw u hellkewtû dekeyn. Olav Duun (1876-1939), be romanekanî ke barudoxî zêdî xoy le dewerî qerax derya le Trøndelag, le Bakûr degêrnnewe u lebarî derûnîyewe şwênêkî zor le ser miro deken, le sallanî 1920kanda lewane bû xellatî nobêlî edebîyat bibatewe: Tarcei Vesaas (1897-1970) ke le sallanî pencakan u şêstekanî sedey rabirdû da çendîn romanî billaw kirdewe ke kartêkerîyekî qûllî remzîyan hebû u le wecî serdemî xoyda bû be yek le nûseranî here xoşewîstî Norwêj, u tenanet le astî nêwneteweyîşda be nêwbang bû ; Kcartan Fløgstad (1944- ), ke carêkî dîke

be nûsîne gallte amalekanî xoy edebîyatî Nynorskî nwê kirdewe, le jêr kartêkerîy rêalîzmî cadûyî Emrîkay Latîn da, u zor car be îlham wergirtin le barudoxî şaroçke sin'atîyekanî Başûrî Norwêj yan dewrupîştî komellgekanî nizîkî derya , nûsînekanî bon u beramey sîyasîyan heye, bellam nek bezeqî u şêweyekî bangeşederane; Edvard Hoem (1949- ), zortir romanî sîyasî denûsê u barudoxî derewey şaran yan şare piçûkekanî Rojaway Norwêj degêrrêtewe. Ewe tenê çend nûserêk bûn de naw jimareyekî zor da, bellam le ber ewey ke karekanî zorbey ewan wernegêrdirawin " be taybetî ew komelle şê're berzaney ke be Nynorsk hondirawnetewe" pêwîst naka zîyatîrî le ser birroyn. Cige le amaje be nêwî Olav H. Hawge (1908-94) nebê , şa'îrêk ke karekanî wergêrdirawnete ser zimanî Inglîsî, u yek le şa'îre here benêwbangekanî wecî xoyetî.

Hebûnî komellêkî zorî karî edebî hoyekî girînge ke Nynorsk tuwanîwyetî awa be başî xoy biparêzê u bimênêtewe, çunkû be giştî beşêkî ewende gewreye le edebîyatî Norwêjî ke hemwan debê fêrî ew edebîyate bin u lêy bizanin ca xoyan çi axêwer u bekarhênerî Bokmål ban yan Nynorsk ( le heman katda axêwer u bekarhêneranî Nynorskîş debê le gell edebîyatî dewllemendî Bokmål nasyawî peyda ken u lêy fêrbin).

Berhemekanî ew nûsere Nynorsk nûsane le layen wuşanxaney cor be corewe billawkirawnetewe, bellam hemîşe billawkerewey ewtoş hebûn ke hestêkî taybetî berpîrsîyananeyan le ast Nynorsk le xoyanewe nîşan dawê. Weşanxaney , Det Norske Samlaget ( le Oslo), ke le sallî 1868 damezrawe, le sallanî 1960 kanewe wekû yek le billawkerewe serekîyekanî Nynorsk xoy damezrandûwe.

### **Serçawe Be Zimanî Nynorsk**

Bo ewaney bîyanewê fêrî Nynorsk bibn , serçawe be destewen, egerçî ewendeş nîn ke dill pêy dewê. Lêre da basî serçawe serekîyekan dekeyn

### **Kitêbî Seretayî**

Bo ewaney Norwêjîy Bokmål, Danmarkî, yan Swêdî dezanin, serçawey seretayî bo fêrbûnî Nynorsk zorin, ke zorbeyan bo fêrgey seretayî u nêwendî nûsrawin ( zorbeyan be Nynorsk). Ew kesaney ke yekêk le şêwekanî Skandînavîyayî bizanin detuwanin deqî Nynorsk ta radeyekî zor bixwênnewe u lêy têbigen, egerçî kitêbêkî seretayî pêwîste bo ewey miro fêr bê çalakane le zimanêke rabê u bekarî bihênê).





## THE SYNTAX OF VERBAL INFLECTION IN CENTRAL KURDISH (part 2)

*Rêbîn Kerîm*

### 2.3 Types of Verb in Central Kurdish

There is no agreement in the literature with regard to the syntactic types of verbs in Central Kurdish. While Zangana (1989) claims that there are three types of verbs in Central Kurdish (simple, complex, and compound), Fattah (1997) assumes that there are no simple verbs in the language, and that every verb minimally consists of two morphemes. In other words, Central Kurdish verbs are either complex or compound. Although I agree with Fattah (1989, 1997) that there are no simple verbs, and that verbs in the language can morphologically be divided into complex and compound verbs, it is better to divide them syntactically. Thus, instead of using the terms ‘complex’ and ‘compound’, I believe that the inflectional system for Central Kurdish verbs consists of thematic/lexical verbs, which are used in forming simple predicates, and light verbs, which are used in forming complex predicates.

Unlike light verbs, thematic/lexical verbs in Central Kurdish are not semantically bleached or light. They are made up of a verb stem plus at least one bound morpheme. The bound morphemes are grammatical ones which tend to change the syntactic nature of the verb. The verbal inflections do not change the semantics of the verb stem and they only have grammatical functions. The bound morphemes in Central Kurdish include the prefixed indicative marker *de-*, as in (5a) and (5b), the

verbal agreement suffixes, as in (5a), (5b), and (5c), and the pronominal enclitics, as in (5b) and (5c), among other verbal inflectional morphemes.

(5) a. de-rro-m. IND-go.PRS-1SG ‘I am going.’

b. de=î şkên-im. IND=3SG.CL break.PRS-1SG ‘I (will) break it.’

c. xward=man-in. eat.PST=1PL.CL-3PL ‘We ate them.’

Light verbs are used in complex predicate constructions, which consist of an inflected light verb plus a non-verbal element, consisting of at least one free morpheme. Light verbs such as *kirdin* ‘to do’ and *dan* ‘to give’ are often used with nouns to form such complex verbal structures, as shown in (6). The non-verbal element is shown in boldface.

(6) a. *minat-**eke**-an şerr de-ke-n.* child-DEF-PL fight IND-do.PRS-3PL ‘The children are quarrelling.’

b. *beîn de-de-m.* promise IND-give.PRS-1SG ‘I promise.’

An interesting feature of the verbal system in Central Kurdish is related to the difference in the syntax of past and present tense (cf. Haig 2004). This difference will play a major role in the determination of the overall verbal structure, the theta-marked position of the subject, and agreement patterns in the language (see chapter four). Inflected verbs in the present tense cannot come alone but are always preceded by the indicative marker *de-* and be followed by a subject agreement marker, which is a verbal agreement suffix in the present tense. There is no overt suffix on the verb stem indicating present tense, as can be noticed in (7).

(7) *min pîtza de-xo-m.* I pizza IND-eat.PRS-1SG ‘I eat pizza / I am eating pizza.’

The inflected verb in the past tense seems to have a past tense marker as the past stem is used in their formation. However, as explained in the previous section, like in the present tense, I maintain that there is no overt past tense marker in the language (see also section 2.5.1 for more discussion on tense morphemes in Central Kurdish). Unlike inflected verbs in the present tense, which are always preceded by the indicative marker, this marker is rarely used in conjunction with inflected verbs in past tense. When used, it refers to a past progressive action. Besides, the subject agreement

marker in the past transitive is a pronominal clitic instead of a verbal agreement suffix, as shown in (8).<sup>32</sup>

(8) sêw-êke-an=im xward-∅. apple-DEF-PL=1SG eat.PST-3SG ‘I ate the apples.’

The above examples also show that the surface (unmarked) word order in Central Kurdish is SOV. It is possible to have SVO order, though it is a marked order, as in (9).

(9) min de-xo-m pîtza. I IND-eat.PRS-1SG pizza ‘I am eating pizza. / I eat pizza.’

However, such flexibility with word order is not possible if both arguments (subject and object) are animate. This might be because the inanimate DP is more likely to be the object which gives it more freedom of ordering. If both arguments are animate, as in the examples of (10), only SOV order is possible. The sentence in (10b) does not sound natural or even grammatical since the animate object follows the verb. Thus, the basic (surface) OV order will be retained.

(10) a. Azad Karwan de-kuj-ê(t). Azad Karwan IND-kill.PRS-3SG ‘Azad kills/will kill Karwan.’

b. \*Azad de-kuj-ê(t) Karwan.

It is significant to note that when the object complement is a clause rather than a DP, the order is actually SVO, as demonstrated in (11) below.

